

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê
li Swêdê

Berpirsiyar
Mahmut Lewendî

Redaksiyon/Redaktion
Bavê Nazê, Dara Reşîd,
M. Lewendî, Mueyyed Teyib,
S. Rêving

Sättning och layout:
Bavê Rojbîn, N. Kîrîv

Adress:
Box 45205
S-104 30 Stockholm

Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Aboneti/Prenumeration
Kes/Enskilda: 100 Skr./Sal-år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./Sal-år

İlan/Anons
Rûpelên navîn/İnsidor: 1000 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên
bi înzê an nivîs û gotinên Federasyo-
nê ye. Nivîsarên ku ji *Berbangê* re
tên şandin, heke çap jî nebin, li xwe-
dî nayên vegerandin.

ISSN-0281-5699

Sal: 7, Hejmar: 7/88 (52)

15.09.1988



Li gor biryara 598 a Koma Milletan, 20'ê tebaxê agirê
Lşerê 8 salî vemirî û Iraq û Îranê li Cenevê dest bi giftû-
goyên aşîtiyê kirin. Piştî 8 salan; Milyonek mirov hatin
kuştin, bi sedan gund û bajar wêran bûn. Bi milyar dola-
ran zîyan ghişt ekonomîya her du welatan. Belê gava me-
riv zîyana gelê kurd tîne pêş çavan, dibîne ku meztirîn
zîyan û nexweşî bû para gelê kurd. Bi hezaran xortên me
bûn qurbanên şerî, gundên me kavi bûn. Di nava seetekê
de 5000 kurd li Helebçê bi bombên kîmyayî hatin qirkirin.
Kurdistan di nav toz û xumama balafir û bomban de feti-
sî. Lê ne Îraqê û ne jî Îranê bi peyvekê bi tenê jî be qala
"çareserkirina" doza kurdî nekirin. Cîhan dîsa bê deng
ma. Ser hemûyan re her li wê roja ku giftûgoyan destpêki-
rî, Îraqê, leşkerê xwe kêşa bo Kurdistanê û tevî çekên kî-
myayî dest bi qetliyama gelê me kir. Bi rojan, leşkerê Îraqê
wek kûçikên har ket nav gund bajarên; jin, zarok, kal, çî
ber wan ket, kuştin bi saxî veşartin. Ji hovîtî û dirindetîya
êrişan xuya bû ku Seddam dixwaze kurdekî bi tenê jî sax
nemîne.

Xelk neçar bûn û berew jor, bo Tirkîyê û Îranê bar kirin.
Li gor nivîsîna rojnaman heta niha 140.000 kurda sînor
qetandine û çûne nav «erdê» Tirkîyê, ku piraniya wan jin
û zarok û pîr û birîndarên çekên kîmyayî bûne. Tevî ku
navê Tirkîyayê jî li bin «Belga Helsinki» heye û Tirkîya en-
dama Komîsyona Mafên Mîrovan e, lê dîsa jî kurd wek
milteçî qebûl nekirin û heya niha jî kurdên ku çûne wir,
nehatine bi cî kirin. Li çolê an di çadiran de dijîn.

Her weha Tirkîyê rê nade dezgehên cîhanî an pisporên
ku dixwazin biçin Tirkîyê û li birîndarên bombên kîmyayî
binêrin.

Divê kurd tev de ji bo rûşkirina Îraqê dengê xwe bil-
ind bikin û rûçikê reş ê Tirkîyê eşkere bikin.

Bê guman gelê me yê li Kurdistana Îraqê, îro ji hemû ro-
jan bêtir li benda alîkarî û piştgiriyê ye. Bê vir de wir de
divê tev dezgeh, partî, rêxistin û kurdên welatperwer bi
hemû rîyan, destê alîkarîyê bigihînin wan.

Kurdistan: di navbera berdeyamî yan rawestandina şerê Îraq û Îranê de

Çalak

Dagirkerên Kurdîstanê ji bo serkutkan û qirkirina gelê kurd, berdeyam dixebitin. Ji bo gihîştina vê armancê jî, hemû rîyan bi kar tînin. Ji inkarkirina hebûna kurdan wek neteweyek li ser axa xwe, qedexekirina ziman û kultura kurdî, heta bigihe tovqelandin, şenqkirin û kavilkirina hezaran gundan... Li dijî tund û tûjî û hovîtiya dagirkeran jî, ji bo bi dest anîna azadî û serxwebûna xwe, gelê kurd tim û tim serhildaye, raperîye.

Destpêkirina şerê Îraq û Îranê, kirina Kurdistanê qada germ a vî şerî û tevlihevkirina wî şerî di gel şerê li dijî gelê kurd tê kirin, tesîreke mezin li ser tevgera azadîxwaza gelê me kirîye û bê guman rawestandina şerê Îraq û Îranê dibe sedemê vekirina perdeyeke din ji vê şanogerîya bi xwîna Kurdistanê vedibe û qonaxeke nû li pêş şoreş û xebata tevgera kurdî dest pê dîke.

Biryara rawestandina şerî a Îranê ji bo hemû alîyan, bi taybetî ji bo kurdan biryareke «ji nişkê ve», bê destpêk û bê delîl bû. Bawerî weha bû ku heta Xumeynî sax be û rijîma Seddam li ser hikim be, wê şer ji her dom bike.

Her demê ku Îranê li gor «biryara 598» îlana rawestandina şerî ragihand û bê qeyd û şert şer rawestand, yekser reşeka şkestina 1975'ê û dawîya trajêdiya tev serhildanên dîroka kevin û nû ên Kurdistanê hat pêş çavên hemû kurdan.

Eger şer bi dawî bê, wê di navbera du beraş de çi bê serê doza kurdî? Erê, kurd dikarin çi bikin? Wê vî carê jî dagirker li ser nehêlana şoreşa kurdî li hev bînin? Erê her yek ji wan wê ji bo berjewendiyên xwe ên taybetî, destên xwe ji tevgera kurdî a aliyê din bikêşin ku nêzik e karê wan pê namîne? Piştî ku her du rejîm li hev bikin û agirê şerê neheq vemire, wê rejîma faşîst li Îraqê ji bo tolstandina ji tevgera kurdî çi pîlanan bigerîne? Erê rejîma faşîst a Îraqê wê hemû giraniya xwe bêxe ser Kurdistanê û leşkerê xwe yê ku 8 sal in di şerekî din de ye, wê bi temamî dijî gelê Kurd tirxan bike û ter û hişk pêk ve bişewitîne?

Çi pê nevet, her lihevhatinek di navbera wan de pêk bê, yek ji niqtên serekî wê li ser mesela kurdî be, wekî peyman 1975'a Cezayîrê, bigihin hev ku sînorên xwe bo kurda bigrin û alîkarîya kurdên aliyê din nekin. Bi kêmanî ji bo du mebestan vî dawiyê Seddam

pûteyekî mezin dide (Micahidin Xelq) bi temamî piştgirîya wan dîke, û dijî Îranê wan pal dide:

1- Bikaranîna wan wek kaxezekî li şer masa pêkhatinê, li gel Îran ku eger Îran destê xwe ji nav kurdên Îraqê bikêşe, ew ji wê alîkarîya xwe ji bo Mesûd Recewî û nimûnên wekî wî bibire... Ger Îran vî neke, Seddam jî wê berdeyam be li ser piştgirîya xwe.

2- Eger Îran piştî lihevhatinê, paşerojê, dişan alîkarîya kurdên Îraqê bike û bixwazê kengê wan wek «qoz» dijî Îraqê bi kar bîne, Seddam jî dikare yê di destê xwe de bide pêş.

Belê eger bi hûrî li meselê binêrin, rewşa dîrokî û şertên objektîf û subjektîf û daxwaz û armancên her du şeran ji hev cida bikin, êşkere ye ku mesala kurdî ne paşko an parçeyek e ji şerê Îraq û Îranê û bi vemirina agirê şerê neheq ne şert e pêta şoreşa milletekê ji vemire ku ji bo azadî û serbestiyê bi dehan sal in xwîn dirêje

Şerê wêranker û neheq, berdeyam-bûna wî û kêşana wî bo Kurdistanê û bi hev ve zeliqandina wî di gel tevgera kurdî, bi neheqî ji be, li pêş çavê cihanê, şoreşa gelê me kiribû paşko ye lawaz bo pazdarên Îranê û Kurdistan di berdeyamîya salên dirêj de kirbû meydana şerê di navbera du leşkeran de. Nûtirîn cûrên hemû çekan bi avayekî hovîti di vî şerî de hatin bikaranîn û rejîma faşîst a Îraqê jî li jêr perda şerî û bi bihana berevaniya niştîmanê (ku bi tenê text û kursîya wî, ji bo wî niştîman e) di kavilkirina Kurdistanê û bikaranîna çekên kîmyawî û tevkuştin û şewitandina bi sedan gund û nefikirina bi sed hezaran gundiyên Kurdistanê bo çolên li ser sînorê Siûdî û Urdinê, windakirina hezarên din de hiç dirixî nekîr. Anku berdeyam-bûna şerî, ji bo qirkirina kurdan, tu cara li pêş rijîma Îraqê nebûye asteng, belkî di desten wî de hindek caran bûye «Belge» û bihane ye baş û bi vî awayî karîye dengê giştî ê Iraq û Cihan û heta hinek aliyên ku bi nav mixalefeta in, bixapîne. Ev hemû li aliyekî, li aliyekî din bawerî weha bû ku Îran wê bi şer zora Îraqê bibe. Belê ji mêje bo hemê kesan xuya bû ku ji bilî çewtiya siyaseta serhişk a Îranê a ji der ve û serûberê danûstandina wan bi mixalefeta Îraqê re bûye sedemê bi hezistin, zêdetir xweragirtina Seddam, ne ku vajîya vî.

Di gel ihtîmala nemana Seddam, di vî şerî de, çend ihtîmalên din jî Peyda bûbûn:

1- Bi Ingilabeke leşkerî bi rîya rêxistinê mixalefeta Îraqî a di nav hêzên

eskerî de ku ger kiribin, heta niha çend hewldanên wan serneketîye.

2- Hindek cara jî, ihtîmaleke nû dida ku berdeyamîya şerî bibe asteng li pêş rijîmê, tevlihevîyek di nav girgîrên rejîmê de peyda bibe û rejîm jî hev bikeve û ew xwe bi xwe Seddam la bidin.

3- Welatên rojava, bi piştgirîya Suûdîyê û hinek welatên din ên erebî hewl bidin ku berî ku Îran Îraqê dagîr bike û hikumeteke Îslamî li Îraqê binite ser hikim, berdêlekî bo Seddam peyda bikin

û zelamekî din ê xwe binin cihê wî.

4- Hêzên mixalefeta Îraqî, hêz û karîna xwe di cepheyeke fireh de bigihînin hev û bi hev re heta hilweşandina diktatorîyeta Saddam, bitêkoşin...

Belê, demezrandina cepha berfireh û rêxistina hêz û karîna û firehkirina şoreşa çekdarî li seranserê Îraqê, her hêvî û daxwaza nav dilê hinek alîyan û ji bilî partiyên kurdî, her gotina rût û benîştê devê hindekên din bû. Di van 10 salên bihurî de giftûgoya li ser damezrandina cephê bû wek wê meselê, ka hêk ji mirîşkê ye an mirîşk ji hêkê ye.

5- Ji bilî van niqtên li jor gotî, ihtîmaleke din jî hebû ku wekî raperîna dîrokî a gelên Îranê ku şah derxistin, raperîna camawerî a gelên Îraqê, li seranserê Îraqê dest pê bike... Ji bo vî mebestê jî her Kurdan xwe didan pêş û dibûn qurbanî; raperîn, xwe pêşandan û mangirtin her di nav sînorên bajar û bajarokên Kurdistanê de diman û di baştirîn halet de weke deng û basen xwepêşandana gelê welatekî din digihîşt bajarên erebî û zû bi zû dihat jibîrkirin.

Ku piştî 8 salên sext û bi xwîn ên şerî, yek ji van ihtîmalên jor bi cî nehat û ji bilî şewitandin, werankirin, kuştin û serbirînê tişteki din nebû nesîbê gelê Kurd û Kurdistanê. Berdeyamîya şerî di paşerojê de ne bi tenê encamên jorî bida, belkî ihtîmala çend barebûna, felaketên wek felaketa Helepçê hebû. Hingî şer dirêj bibiwa, zêdetir Kurdistan diket bin piyan û dihat şewitandin, û dibû wêranexak, pitir û pitir jî şoreşa gelê me dibû paşko ya wî şerî û tevgera me jî dibû qurbana berjewendiyên rojane ên dagirkeran...

Êşkere ye ku piştî tamambûna şerê Îran û Îraqê, rejîma faşîst a Seddam wê dijî gelê me şerê tixumperestîya xwe bajo û wê bixwaze bi agir û hesin mesela kurdî çareser bike. Belê, li vir ya giring ew e ku keda xebata kurd, her bo kurda ye û xwîna pêşmerge a tê rîjandin her bo Kurdistanê ye. ●

NABE KU TEVGERA NETEWÎ YA KURDISTANÊ LI ROJHILATA NAVÎN STATUKOYÊ BIPARÊZE!

M. Kîper

Tevgera welatparêz a Kurdistanê, li ser hemû pirs û bûyerên ku têkiliya wan çî dîr-çî nêzik bi Kurdistanê re hebe, divê ku li gor menfe'eta gelê xwe li meselê binêre û analîz bike û jê netîceyan derxe.

Çî dîtin û bîr û bawerî dibe bila bibe, ger vê krîterê negre ber çavan, di her gav avêtinê de wê bigihîje netîceyeke çewt.

Gelê kurd li Rojhilatanavîn ji sedsalan û vir de ye ku dixwaze ji bin zilm û zordestîya kolonyalîzmê xelas be û mafê xwe yê çarenûsi bi dest xe.

Tevgera netewî ya Kurdistanê di bin şertên welê diwar de têkoşînê dide ku di tarîxê de tu misaleke din î weha tune ye û tu tevgera rizgarîya netewî şert û şirûtên ku gelê kurd tê de ye, nejiyaye.

Dewletên ku Kurdistan kirine kolonî, her weha çar aliyê Kurdistanê jî wek çeperekê girtine. Dijmin bi hilma me daxî dihese.

Ji ber vê ye, divê ku -wekî ku dijmin jî dike- em jî bikaribin ji dijayetî û şerên di nav van dewletên ku Kurdistan di nav xwe de parve kirine feyde bigrin. Ev yeka jî bi siyaseteke hostayî û bi hêzbûn û xurtbûnê dibe.

Hemû bûyer û hedîsên ku eleqa wê bi Kurdistanê re heye, divê em di mîhengên têkoşîna demokratîk a netewî ya gelê kurd de bigrin dest û xet û politîka xwe ya navnetewî jî divê em li gor realîta Kurdistanê pêk binin. Dibe ku ev jî bo hin kesan weke "egoîzma netewî" were fêhm kirin, lê di esase xwe de tiştê ku divê were kirin ev e, û ya rastî bi xwe jî ew e.

Ji xwe ew zîhnîyeta fedakirina parçê jî tevayîyê re ku di nav şoresgerên kurdanê de heye, divê jî nû ve were munaqesekirin, tehlîl kirin.

Gelê me gava ku xwedî li menfe'etên xwe derdikeve ne ku ew dunyê dibe ber bi şerê atomî yan jî dahatuya insanîyete dixe nav seruweneke (macera) bê ser û binî. Em jî wekî hemû gelan dixwazin li ser erdê xwe bi azadî bijîn.

Hemû gelan li gor menfe'etên xwe yê "xusûsî" alîkarîya aşîti û îstîkrara dinê kirine. Yan na di bin nîrê kolonyalîzmê de jîyin, di bin zilm û zordestiyê

de jîyin tu feydeyekê nagihîne aşîtiya dunyê û îstîkrara wê. Di bin zilm û zordestiyê de mayîn jîyana bê azadî ancax sûreteki sexte dide aşîti û îstîkrara dunyê.

Li gor van malûmatên jorîn, gava ku em şerê heşt salan ê Îran û Îraqê tehlîl bikin, tabloya ku derdikeve pêş me de ne înteressant be?

Bi a min, rewş înteressant e. Çimkî tawirên rêxistinên kurdan muhtacî îzahê ne. Tevgera netewî ya kurdan jî bo şerê Îran û Îraqê bi tevayî aşîti dixwest. Me digot ev şer bê mana ye, zerera wê jî her du gelan re ye. Me digot ev şer afirandinên her du gelan, zengîniyên wan ên ser erd û bin erdê tahrîb dike. Welhasil me bala herkesî dikişand ser wahşetîya şerî û me digot "divê her du dewlet jî li ber masa aşîtiyê rûnin..." Lê me tiştê jî ber çavan veşart ku herdu dewlet jî dagirkerên Kurdistanê ne û şerê di nav wan de mumkun e ku şertên têkoşîna netewî ya kurdan pêş de bixista.

Çimkî, gava ku ev herdu dewletên dagirker ne di şerî de bûn, me dît ku bi çî hovîti û zordestiyê dixwestin têkoşîna gelê kurd jî ortê rakin.

Di vê aşîtiya îroyîn de em hîn bi hêsanî dibînin ku di dema şerê nava her du dewletên kolonyalîst de bo têkoşîna gelê kurd şert hîn musaîtîr bûn. Çimkî, ew bi hev ketibûn û nikaribûn hemû hêzên xwe bişandana ser gelê kurd, lê niha Îraqê hemû hêzên xwe şandîye ser Kurdistanê Îraqê û dixwaze gelê kurd jî ortê rake. Sibe roj, her eynî kirina dewleta Îranê jî dikare bike. Lê do ev tişt jî bo wan her du dewletan hîn zehmetir bû.

Erê, ji bo ku li cepheyan însan nemirîn, ji bo ku menfe'etên herdu milletan (Ereb û Faris) zerarê nebînin, em li gel aşîtiyê bûn. Lê ew aşîtiya ku têkoşîna gelê kurd înkâr bike, ew aşîtiya ku bixwaze gelê kurd jî ortê rake û qira wî bîne, ne aşîtiyeke adil e.

Divê em ji bîr ve nekin ku berdewamiya aşîtiyê di nava her du dewletan de wê şerê li Kurdistanê xerabtir bike û her du dewlet jî wê bersîva daxwaziyan netewî yê gelê me bi xwîn, zilm û kuştinê bidin.

Ji ber van sedeman, ew aşîtiya ku menfe'eta gelê kurd têde tune be û bil'eks zerarê bigihîne gelê kurd, divê

hêzên netewî yê demokratîk ên Kurdistanê di rewşek weha de xwe nexin şûna kevokên aşîtiyê. Divê hêzên kurdan rastîya Kurdistanê bigrin ber çavan û li gor wê daxwaza aşîtiyekê bikin û biparêzin. Çimkî, ew aşîtiya ku berxwedana netewîya li Kurdistanê negre ber çavan, wê zilm û zordestîya kolonyalîstan li Kurdistanê zêdetir bike. Trajediya ku van rojên dawîn li Kurdistanê Îraqê pêk tê jî, vê yekê dide îspat kirin.

Do hêzên kurdan gava ku aşîti dixwestin, divê hesabê rewşa ku îro gelê kurd tê de ye bikirana. Çimkî do hemûyan aşîtiyek weha dixwest.

Ma gelo nedihat zanîn gava ku di nabêna Îran û Îraqê de aşîtiyek weha pêk were wê çî were serê gelê kurd? Erê, tê gotin "Ji gundê xuyayî re rêber ne lazîm e". Lê ev yeka timî ne were ye!

Gelo ma tu dewlet û hêzên din jî tunebûn ku ji bo domkirin û nedomkirina şerê Îran û Îraqê li dij an ligel tawir distendin? An jî tawirê wan çawa bû? Mesela, em dikarin tawirê Tirkîyê jî ber çavan veşêrin. Pir eşkere ye ku şerê Îran û Îraqê bi qasî ku tevgera netewî ya Kurdistanê eleqeder dike, hewqasî jî Tirkîyê eleqeder dike.

Netîca şerî, çî li Îranê, çî li Îraqê dikare şertên hîn musaîtîr ên jî bo têkoşîna gelê kurd pêk bîne. Tirkîyê ev rastîya tu carî jî ber çavên xwe veneşart. Ji ber wê jî Tirkîyê her dixwest di nabêna her du dewletan de aşîtiyek çêbibe. Çimkî Tirkîye tu carî naxwaze statuya Rojhilatanavîn xera bibe û rewşeke bê îstîkrar peyde bibe. Lê gava ku ev îstîkrar xera bibe feyda wê dikare bigihîje têkoşîna gelê kurd. Ev jî tê wê m'ênê ku di vê derê de dijîtiya menfe'etên gelê kurd û dewleta Tirkîyê heye.

Ji ber wê jî gava ku em li bûyer an li meseleyekê -ku têkiliya wê bi Kurdistanê re heye- temaşê dikin, wê tehlîl dikin, divê em politîka wan dewletan jî jî nêzik ve taqîb bikin û di ber çavan re derbas bikin. Gava ku mirov dikeve rewşeke dijî wan an paralela dîtinên wan divê mirov bikaribe îzaha wê yekê jî bike.

Welatekî din ku li hember tevliheviya li Rojhilatanavîn û şer û aşîtiya Îran û Îraqê tawirekî cihê distîne; Îsrail e.

Îsraîl dostê herî nêzik ê Emperîalizma Amerîkayê ye, heta wekî ku perçeyek ji wê be. Lê gava ku menfe'etên netewî yên îsraîlê têkevin talukeyekê, mirov dibîne ku Îsraîl wekî ku Amerîka dixwaze nake, siyaseta xwe dimeşîne. Di şerê Îran û Iraqê de jî tawrê wî ew bû.

Amerîka ji ber ku naxwaze îstîkrara li rojhilata navîn xera bibe her li gel aşîtiyê bû. Heta gelek caran alîkariya Seddam jî kir. Ma qey Amerîka ev bîlleheq dikirin? Ger di şerî de Iraq bi bin keta û vê binketinê feydeyek bigihanda Amerîkayê bê guman Amerîkayê welê nekira. Yan jî hefsarê meleyen Îranê ger di destên Amerîkayê de ba, mumkun e ku wê ji bo ketina Seddam bixebitîya. Gelek faktorên tesîr li ser tawirên Amerîkayê kir. Ji vana yên serreke: Tawirê Tirkiyê, tevgera netewî ya li Kurdistanê, hêzên muxalefetên din ên Iraqî, anti-amerîkanî ya Îranê, li Rojhilatanavîn tesîr û îtbara Sovyetê û hwd.

Îsraîl wekî ku Amerîka dike, nake. Bil'eks ew li gel berdeambûna şer e, li dij aşîtiyê derdikeve. Heta bi dizî silêh jî firot Îranê.

Hemû dunya kêfxweş bû ku Îran û Iraq wê ji bo aşîtiyê li ber masekê rûnin. Lê ev yeka qet jî ne bi dilê Îsraîl bû û kêfa Îsraîl jî wê aşîtiyê re nehat. Çimkî, daxwaza Îsraîl ew e ku hemû dewletên ereb bi şerê Îran û Iraqê re meşgûl bin û her weha bi vî şerî re Îran demek be jî wê nikaribe dijminatîya Îsraîlê bike.

Gotina kurt her dewletekê bi çavekî din, bi awakî din li şer an aşîtiya nava Îran û Iraqê dinihêrt û tehlîl dikir. Lê, me banga aşîtiya ku tu menfe'eta wê ji gelê me re tune bû, derxist pêş û bîyî ku em lê varqîlin me jî li gel wê bir û bawerîya ku naxwaze statû û îstîkrara li Rojhilatanavîn xera bibe, cihê xwe girt. Em lê varqîlîbin an nevarqîlîbin di vê paralelê de polîtîka tesbîtîkirin berdeambûnê polîtîkayekê ye ku ji perspektîf û menfe'etên netewî dîrketin e.

Ev dîtin mumkun e ku li gor hinekan bangewazî û daxwazîya şer xwestinê be. Bê guman ew bîlleheq dikevin vê şîkê. Çimkî sebebê şerî ne em in û yê ku şer gur dike jî ne em in. Şer li derveyî îrada gelê me dest pê kiriye û heye.

Wezîfa me ew e ku em bikaribin ji bo menfe'etên gelê xwe ji vî şerî feydeyê bigrin. Ancax bi vê jî gelê me dê bikaribe gawekî nêztirî mafên xwe yên netewî yên demokratîk be û ancax bi vî awayî li Rojhilata navîn dê bikaribe aşîtiyê çêbibe. Heta statuya ku îro welatê me û gelê me tê de ye dewam bike aşîtiyê îstîkrara li Rojhilata navîn jî dê her sexte û durû be. ●

Piştî şerê Iraq û Îranê, di tevgera rizgarîxwazîya Kurdistanê de qonexeke nû?

Selîm Keya

Eve heyameke li nav rewşenbîr û rêxistinên kurdan de, di derheqê guhurîn û bûyerên li başûr û rojhilata Kurdistanê de, pirsîyar pîr dibûn. Her weha pîrbûna pîrsan, derbarê tevgerê de helsegandî (degerlendirme) û tehlîlên nû jî bi xwe re anî.

Guhurînen li van çend mehên dawîyê, welê kir ku pîraniya mirovan êdî li ser meselê kûrtîr bifikirin: Di tîrmeh û tebaxê de Iraqê êrîşên mezin bir ser aliyê din û destketîyên biha bi dest xist, Îran bîyî berxwedaneke ber bi çav jî Iraqê û jî Kurdistanê Başûr derket. Vê jî guman û endîşeyên kurdan pitir kir. Rewşa tevgera kurdî, di mejîyê pîraniya kurdan de bû pîrsîyarek; çî li hundirê welêt, çî li derve, çî siyasî, çî ne siyasî her kurdekî jî xwe jî hawîrdora xwe pîrs: "Erê, Iraq û Îran bi dizî li hev tînen?", "Eger li hev bînen, wê çî bê serê tevgera kurdî?", "Peymaneke nû a Cezayîrê?" Dema xelk li dûv bersîvên van pîrsan ketî, jî nişkê ve Îranê da zanîn ku li gor biryara 598 a Koma Mîllatan, daxwaza lihevhatinê dike.

Bi vî awayî, ihtîmala bidawîhatina vî şerê dirêj û wêrankerê gelan, bilind bû. Bo roja 20.08.1988 biryara agirbirinê hat wergirtin ku li gor wê biryarê jî wezîrên karên ji derve ên herdu welatan li Cenevê dest bi guftûgoyên aşîtiyê kirin.

Belê, qet qala tevgera kurdî nehat kirin, ji bo çareserkirina doza kurdî, peyvek nehat kirin lewra, endîşe û gumanên kurda di cîyê xwe de bûn. Û helbet li hember rewşa nû pîrsa "Divê meriv çî bike?" bû wazîfeyê rojane jî bo tev dezgeh û rêxistinên welatperwer ên kurdan.

Ji bo tehlîla rewşa îro û dîtina bersîva pîrsîyara li jor, ne pîr dîr, lê meriv dikare li 1975'an vegere û li wan rojan binêre. Ji ber ku 1975 û piştê wê li seranserê Kurdistanê, di derheqê tevgerê de tehlîlên pişkdar peyda bûn û her dîsan piştê hingê, tevgera millî a li her çar perçên Kurdistanê, tesîreke mestir li hev du kirin.

Ji bo gelê kurd me'na 1975'ê çî ye?

Di vê salê de, tevgera kurdî a li Kurdistanê li jêr destê Iraqê, şkest. Şkestîne, tesîreke pîr mezin û negatîv li ser

hemû kurdan kir... Di gel vê yekê jî, tehlîlên li ser Kurdistanê başûr, li her çar qulaçên welatên me bûn meseleyeke esasî. Divîyabû, em ders û tecruban jê bigrin. Dihat zanîn ku eger ders û tecrube jê neyên girtin, wê tevgera kurdî tûşî şkestînen nû bibe.

Eger meriv pîr bi kurtî bibêje: Tevgera netewî a li Kurdistanê Iraqê nebû xwedîya qerekerê netewî-demokratîk a hevçerx. Pûte bi pêşketînen demokratîk ên li welêt an li nav partîyê nehat dan. Tedbîrên pêwîst ên demokratîk û ekonomîk nehatin wergirtin. Rê li ber çîn û grûbên rênber venebû ku wekû pêwîst beşdarî di rêveberîyê de bikin. Dijî emperyalîzmê, kolonyalîzmê û nûkerên wan ên li dever û welêt, polîtîkayê netewî-şoresger nehat ajotin. Eve jî bû sebeb ku li dijî dewletên Kurdistan dagîrkirî, polîtîkayê netewî peyda nebe û her weha nakokîya di navbera Iraq û Îranê de mezin bê xuyakirin û tevger piştî xwe bide wê nakokîyê. Weke ku pêwîst, pûte bi piştgirî û hevkarîya hêzên şoresger û demokratîk nehat dan. Polîtîkayê serbixwe û bi şexsîyet nehat ajotin. Tevî ku divî warî de rolekî negatîv ê hêz û dewletên sosyalîst jî hebû, lê serokatîya tevgerê nekarî awa û riyên rast ên têkoşînê bibîne ku li gel şertên welatên me biguncin.

Hingê, hêzên netewî ên li Kurdistanê Iraqê jî li ser tesbîtên li jor, hemfikir bûn. Lewra wezîfa 'avahîyê nû' hat pêş ku bikare li dijî kêmasîyên li jor bi awayekî şoresgerî bi têkoşe.

Piştî 1975'an çî guhurîn peyda bûn?

Gelo hêzên piştî 1975'an peyda bûne, karîn van kêmasîyan ji holê rakin. Tevgera kurdî li Iraqê bû xwedîya qerekerê netewî-demokratîk?

Piştî 1975'an li Kurdistanê Iraqê tevgera kurdî bi serokatîya du rêxistinên siyasî dest bi pêşveçûnê kir. Belê berî ku wextekî dirêj derbas bibe, di navbera wan de şer û ne xweş peyda bûn, tehemilî hebûna hevdu nekirin. Vê jî nişan da ku hîn jî demokrasiyê û pîvanên demokrasiyê li ba wan zelal nebûbû, pêşneketîbû. Bi dewletên dagîrker re danûstendînen wan berdeambû. Şahê Îranê yê ku di şkestîne de rolekî

mezin heyf, car din xwest, xwe nêzik tevgerê bike. 1979'ê Şah çû, Xumeynî hat. Belê ne di politîka Iranê de, ne jî di politîka Kurdistanê de guhurînek çênebû.

Hukûmata Îslamî, bi piraniya rêxistinên Kurdistanê re pêwendî girêdan. Li vê dawiyê jî, di itîfaqa rêxistinên Kurdistanê de rolekî mezin list. Ew Kurdên ku eve çend sal bûn xwe bi xwe nedikarîn bîn ba hev. Mixabin ku rêxistinên siyasî ên kurda xeta sînorên pêwendiyên bi Îranê re, baş nekêşan. Pûteyêke mezin dan nakokîya di navbera Iraq û Îranê de û bi awayî jî bûn sedem ku şer bê ser erdê Kurdistanê. Hêzên çekdar ên Îranê bi dilê xwe li dest û çiyayên Kurdistanê gerîyan, lewra jî şovenîzma erebî bi hêz ket û Seddam jî karî xelkê bo aliyê xwe bikêşe.

Her weha hêzên siyasî nekarîn baş tehlîl bikin ku Emerîka jî ber berjewendiyên xwe, xwe nêzi mesela Kurdî dîke.

Wek tê dîtin politîkayeke netewî - anti-empyralîst nehat ajotin. Di warê danûstendinên bi dewletên cîran re siyaseta netewî zelal nebû.

Bi kurtî hat dîtin ku ji bo rakirina kêmasiyan, guhurînen bingehîn nehatine kirin û tevger negihîştîye qereqereke netewî-demokratîk a nû. Lewra tevî ku fêd û kompoyên hêzên kolonyalîst pir in, lê "em" bi xwe jî encam û rewşa îro berpirsiyar in.

Li Kurdistana rojhilat

Bê guman di hilweşandina selteneta Şahê Iranê de gelê Kurd rolekî girîng hebû. Piştî 1979'ê li vir jî dû hêzên siyasî di qada xebatê de xuyabûn. Her weha bi serokatîya Şêx Êzedîn Huseynî hêzeke din jî çiyê xwe girt. Rêveberîya îslamî, mafên netewî û demokratîk

ên kurda nas nekir, bi hêzên çekdar êriş birin ser kurda, ji bo vê yekê jî rêxistinên welatperwer ên Kurdî, riya têkoşîna çekdarî hilbijartin.

Lê, van rêxistinên nekarîn politîkayên demokratîk bafirin. Ji ber mentiqê çewt ê anti-demokratîk her tim li dijî hevdû rawestan. Şerê di navbera wan de bû sedemê kuştina bi sedan welatperweran. Dîsan ne bûn xwediyên politîkayeke tekûz a anti-empyralîst û soresger. Ji destpêkê xwestin ku bi otorîta merkezi a Iraqê re pêwendiyên girêbidin.

Bi hêzên din ên Kurdistanê re danûstendinên bi rêkûpêk nehat danîn. Bo seranserî Kurdistanê politîkayeke rast nehat afirandin.

Divê meriv çi bike?

Ji bo malîştina kêmasiyan û bi cihatina guhurînen pêwîst, divê bi temami tevgera Kurdistanê jî nû ve bê tehlîl kirin. Piştî îlan kirina agirbirîna di navbera Iraq û Îranê de, li ser mesela Kurdî bédengîya her du dewletan, durûtiyan wan eşkere kir. Divê hêzên Kurdî jî vê rewşê ders û tecrûban werbigre. Di warê pêwendiyên li gel dewletên dagirker de şiyartir bin. Çerçewa pêwendiyên welê bê sînorkirin ku pêşeroja tevgerê nexwe talûkê, şeysiyeta netewî a wê birîndar neke. Divê, di tektîkên têkoşînê de guhurînen pêwîst bi cî bîn. Dibe ku ev guhurînen bibin sedem ku gawîna paş ve bîn avêtin an hêz bê sînorkirin, lê divê meriv jî vê netirse.

Di berdewamiya civînen lihevhatina Iraq û Îranê de, bo bilindkirina dengê doza Kurdî, ji bo ferzkirina çareyên meselê, divê xebat bê kirin.

Serketina peyman û tifaqa di navbera her du dewletan de wê bibe sebeb ku her du dewlet alîkarîya xwe bo kur-

da bibirin û dest bi şerê qirkirina Kurdistanê bikin. Eşkere û rûşekirina wî şerê dijî gelê me û ji bo berlêgirtina çetlîyaman, di qada navnetewî de divê kar û xebatên politîk ên aktif bi cî bîn. Ji ber vê yekê jî erk û wezîfên girin dikevin ser milên kes, dezgeh û rêxistinên welatperwer ên kurda.

Hêzên netewî-demokratîk, geli me îro ji hemû deman bêtir muhtacî alîkarîyê ne. Divê, piştgirî û alîkarîya wan bê kirin, divê hêzên Kurd bikaribin biryarên pişkdar werbigirin.

Hêzên aşîyê, wê li ser sînorên Iraq û Îranê bi cî bibin. Divê hêzên netewî li hember wan politîkayeke tekûz bajon. Eger vajîya vê bibe, wê tevger zereke mezin bibîne.

Ji ber êrîşên kolonyalîstên Iraqê, gelek Kurd direvin, diçin "nav erdê" Tirkîyê. Tirkîyayê himze avêtîye binê Beyannama Mafên Însanî, Belge Helsinki yê, lê dîsan jî wan wek multecî qebûl nake. Divê ev karê wan bê rûşekirin ku eve ne demokratbûn û parastina mafên mirovan e. Her bi vê kirina Tirkîyê, derewa wan car din eşkere dibe ku dibêjin "Kurd, Tirkên çiyayî ne". Tev cihan dizane ku Tirkîyê dixwaze li Tirkên li cihanê xwedî derkeve. Dagîrkirina Qibrîsê encama vî mentiqî ye. Alîyek jî nakokîya wê li gel Bulgarîstan û Yewnanîstanê jî ev e.

Ez dixwazim vê jî bêjim: Qonaxa ku tevgera Kurdî îro gihîştîye, xweştirbûna pêwendiyên hêzên li cihanê xwedî tesîr, bilindbûna dengê mafên mirovan û guherînen di politîka dewletên ku li ser mintîqa me xwedî giraniyê ne, wê pêşî li 1975'êke din bigrin û gelê me 1975'êke din najî. Li deverê, Kurd xwedî giraniyê in û wê di nav hesaban de hebin.

●

Li Tirkîyê:

Berpirsiyarê Medya Güneşî hat girtin

Hejmara 3. a kovara "Medya Güneşî" jî ber wergera tirkî ya E. Peşew a bi navê "Serdekewîn" hate berhev kirin. Di 18'ê Tebaxa 1988 an de li Îstebolê di sa ji ber vê helbestê sê sal û niv ceza hebsê dan berpirsiyarê kovarê Cemal Özçelik.

Li jêrê em Kurdî û wergera wê ya tirkî pêşkêş dikin.

Serdekwîn

Zafer

Serdekwîn
Çunke dwênê
Tope qurrêkî dest kirdim
Daye dest mindalêkî Kurd
Ew lebatî bûkêşûşe
Tifingêkî biçkolaney
Lê durust kird!

Kazanacağz
Çünkü dün
Çamurdan bir topak verdim de
Bir Kürt çocuğunun eline
Küçük bir tüfek yaptı ondan çocuk
Bebek yerine!

Wergêr: Malmîsanîj

E. Peşew

Cemal Özçelik



Jinên kurd li Osloyê:


“Li dijî rejîma barbar a Îraqê bêdengîyê bişkênin,,

- Ji 30.7.1988'an heya 7.8.1988'an li paytextê Norweçê, Osloyê bi navê «Nordiska Forum» konferan-seke jinan civîya.

Ev konferans berdewama qevdeke konferansên jinan bû ku bi biryara «Koma Milletan» berî niha jî li Meksîka City, Kopenhag û Naîrobyê jî li dar ketibû.

Konferans, li Unîversîta Osloyê, bi beşdariya nêzikî 7000 nûnerên jinan bi cî hat û bi giranî li ser gelş û problemên jinên Îskandinavi û jinên penaber ên li Îskandinavyayê rawesta. Her weha li ser jiyana kar a jinan, astengên li pêş jiyana civakî û tehsîla wan û cihê jinan di jiyana polîtîkî de jî hat peyivîn.

Ji Komela Jinên Demokratîk ên Kurdistanê li Swêdê du nûner beşdarî konferansê bûn. Sekretera komelê di vê konferansê de û li panêla Federasyona Jinên Penaber li Swêdê, li ser



Sekretera KJDK'ê Hulya di konferansê de

rewşa jinên li her çar parçên Kurdistanê û trajediya Helebçê melumat dan beşdarî, li ser rewşa jinên kurd li Swêdê peyivî û axaftina xwe bi gotinên jêrî bi dawî anî.

«Li Kurdîstana dagirkirî de, jinên me di bin zordariyê tebeqî û cinsî de ne. Ji bilî vê li jêr zilma kolonyalîzmê de dinalin.

Li Kurdistanê Tirkî bihêlin tehsîla bi zimanê xwe, axaftina zimanê kurdî qedexeyê.

Li Kurdistanê Îran û Îraqê jinên kurd di nav hele germa şerî de dijîn, her roj gund û avahiyên wan tînen bom-

bebaran kirin û weke li Helebçê bûyî bi hijmarên mezin tînen qetilkirin.

Ez, bi navê jinên Kurdistanê gazî konferansê û xuşk û birayên xwe yên li Swêdê dikim:

Li dijî rejîma barbar a Îraqê, bêdengîyê bişkênin!

Alîkarîya zarokên me bikin ku ji bo xwendina bi zimanê xwe îmkânên baştir bi dest xînin!

Pîştgirîya mafê çarenivîsa milletê kurd û xebata ji bo wekhevîyê a jinên kurd bikin!»

Civîna Meclîsa Bîyanîyan li dar ket.

Meclîsa Bîyanîyan (Invandrarrådet) ku ji nûnerên tev rêxistinên bîyanîyan, Wezîrê Bîyanîyan George Andersson, bîpîrsiyarên Daîra Bîyanîyan pêk tî, civîna xwe ya payîzê di 16-17'yê meha tebaxê de li dar xist.

Problemên ku Meclîs li ser sekinîn, ev bûn:

- 1-Penaberên ku dixwazin vegeerî welatên xwe
- 2-Rewşa kar ya penaberên ku dîplo-ma xwendina berz hene.
- 3-Di Lîse û xwendîgehê bilind de rewşa ciwanên bîyanîyan.
- 4-Li ba SIV (Daîra Mihaciran a Dewletê) guhertînin nû, di warê rêxistinî de.
- 5-Rewşa nû ya penaberan.

Civîn, bi axaftina wezîrê bîyanîyan G. Andersson vebû. Paşê nûnerên din ên civîne peyivîn. Nûnerê Federasyona Kurdan, Keya Îzol, li ser rewşa kurdan û spekulasyonên dawî ku li ser kurdan çê bû, ji wezîrê bîyanîyan pîrsê kir. Û

bi tûjî rexne li awira giştî, hikumetê û daîra bîyanîyan girt. Li ser vê rexne, Wezîrê Bîyanîyan car din peyivî û heq da nûnerê Federasyona kurdan.


Di beşê 'rewşa kar ya penaberan' de Keya Îzol raporek bi navê «Kurdiska Akedemiker och Arbetsmarknaden»

(Akademîkên Kurd û Bazara Kar) pêş kêşî beşdarî kir. Her weha tv. Swêdê, beşê Redaksiyona Bîyanîyan, li ser rewşa dawî a kurdên li Swêdê, hevpeyvînek bi serokê Federasyonê re kir.

Civîne, du rojan ajot.

Serokê Federasyona Asûrîyan
Yusuf Barkarmo
Roja 15.07.1988'ê di qezayêke trafikê de çû rehmetê.
Bila xelkê Asûrî û malbata wî sax bin.

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê



Yusuf Barkarmo (1954...)

BERXWEDAN JÎYAN E!

“Û çavên xwe li dîroka gelan bigerîne, çi dîroka tu nabî-nî, weke dîroka gelê te ji rengê xwînê.” (M. Nûrî Dersîmî)


Rastîyek e. Dijî Kurda stûnên avahiya polîtîka Tirkî li ser zilim û îşkence û kuştinê bilind bûne. Û rastîyêke din: Ev polîtîka ha di tengavîyan de, li hember tekoşin û berxwedana kurdan de, weke gurgên sibatê, radipelikîne tev bihayên insanî, giş maf û hebûnên Kurda.

Ji 1980'an û vir de li Kurdistana Tirkî, li gundan, li bajaran, li çiya û deştan, li kuçe û kolan, bi kurtî li ser her bihosteke axa welatê me ev polîtîka barbar hikmê xwe bi awayekî hartir digerin. Bi taybetî, girtîxane û zindanan li Kurdistana bûne qada ajotina vî polîtîka hov û dirinde.

Piştî 12'ê Îlonê, polîtîka bêseksiyetkirinê, a kuştina bihayên insanî û bi darê zorê, bi vir û derewan şuştina mejiyên mirovan li zindana bûne hîmên vî polîtîkayê. Lê rastîyek hat jibîrkirin: Zilim û kotek çiqas giran bin, şertên jiyane çiqas nexweş bin, serçemandin û çûşkandin çiqas “xweş” bin: Vîyana parastina rastîyan, xwedîderketina bihayên insanî û berxwedan, hebûna xwe bi rik û kîneke mestir dajon. Zindananên Dîyarbekrê, Rihayê, Agrîyê, Erzincanê baştirin nimûnên vî ne.

Bisporên siyaseta dewleta Tirkî wilo fikirin ku bi dagirtina zindanan, bi zilim û zorê wê bikaribin dengê welatperwerên kurda di nav çar dîwaran de bixeniqînin. Belê zindananên Dîyarbekrê ne bi tenê vajîya vî careke din îspat kirin, lê hember rewşa partî û rêxistinên siyasî ên kurda, bêdengîya giştî a dememî a li welêt û polîtîka tirsandinê, welê kirin ku heya demekê dengê berxwedanên li zindanan, bû xwediyê doza welêt û girîngtirin sedemê hişyarbûna netewî ya li Kurdistana Tirkî. Girtiyên Kurd, dijî zordestiyê bi serbilindî serê xwe hildan û zindanan ji bo parastina doza kurdî û insanîyetê bûn xwendingeh û kelehên asê. Ewan car din û car din îspat kirin ku kes nikare, bi lêdanê, bi tirsandinê çirayê jînê a di sînga merovan de vemirîne an wan ji tekoşina rewşa bidin paş.

Heta neha bi hezaran kurdan, ode û salonên îşkencan bi xwîna xwe xemi-



Girtîxana Dîyarbekrê

landin, bê hejmar welatperwerên Kurd ji bo jiyaneke azad ji canê xwe bûn, bi hezaran kes bi tenha ji bo axaftina zimanê kurdî, bi rojan birçî, tî man.

Heger em li Dîyarbekra salên bûrî binêrin, emê pêrgî rastîyêke pir eşkere bîn: Dengê ji zindananên Dîyarbekrê têt, dengê şerê û namûsê ye, dengê serbilindî û pêxwirina kurda ye, dengê serketinê ye.

Li destpêkê, ji ber kêmasiyên rêxistina berxwedanê û belavbûnê, serhildan di zindananên Dîyarbekrê de “karê” kit-kite mirovan e, dengê zeyif û lawaz heye. Hin piraniya girtiyên bi awayekî aktîf cihê xwe li rêzê negirtine. Sala 1981'ê eger dengê pir bilind nebin jî grewên birçibûnê dest pê dikin: “Nemana îşkencê, dirêjkirina demê serredana, rakirina sîstema kincên yek reng û tîp, xweşkirina rewşa sihî a zindanan, geşla xwarinê” dibin daxwazên girtiyên. Ew bêdengîya berê bere-bere tê şkandin û çend lawên kurdan canên xwe pêşkêşî vî xebata pîroz dikin.

Salên 1981-82-83 nexwestirîn sal in. Îşkence di van salan de pir giran e, daxwazek an nerazibûneke pir biçûk ji sedemê mirinê ye. Êdî dewlet dixwaze serê tev girtiyên biçemîne. Lê her di van salan de tovê berxwedana 88'ê tê avêtin. Mirov di nav agirê berxwedanê de dipijin, hevîya yekgirtinê baştir tê pêş û her dîsan di van salan de dîwaran zindanan dibin şahidên şehîdbûna çend egîdên kurd: Girtî ji ber protestoya dijî îşkencê û neheqîyan tîn kuştin an ji bo bilindkirina dengê nerazibûnê, xwe dişewitînin.

Di 2'yê Îlona 1983'an de girtiyên Dîyarbekrê ji bo destxistina hinek mafan dest bi grewa birçibûnê dikin: Li

gor ku xuya bûyî eve daxwazên wan bûn:

- 1- Li dijî îşkencê,
- 2- Li dijî cezayê tedricê, yê bêsinor,
- 3- Ji bo bi destxistina derman û alîkariya doxtor,
- 4- Ji bo dirêjkirina demê serredanan,
- 5- Ji bo ku wekî girtiyên siyasî bîn qebûlkin û li gor vî statuyê muamela bibînin.

Her di Newroza 83'an de çend mîrxasên kurd, jîyana xwe pêşkêşî kurd û Kurdistana dikin:

- 1- Mazlum Doğan,
- 2- Kemal Pir
- 3- Hayri Durmuş,

Piştî grewa 83, hinek daxwazên girtiyên bi cî hatibûn. Lê dewletê di wextekî nêzîk de car din ew “maf” ji wan stendin. Li ser vî yekê di destpêka 1984'an de girtî dîsa dest bi grewê dikin. Belê gulebarankirin û kuştin dibe bersiv. Her weha dewlet agir berdide aliyekî girtîxanê. Çar şoresgerên kurda şehîd dibin:

- 1- Necmetin Büyükkaya,
- 2- Halil Çatak,
- 3- Yılmaz Demir,
- 4- İsmet Karak.

Li derveyî wan 17 kes birîndar dibin. Li aliyekî îşkence, kuştin û daxwaza nehêlana dozêkê, li aliyê din berxwedan, nerazibûn, hevî û dîsa berxwedan. Her du mil jî ji bo zorbirina aliyê din di nav xebat û keftelefteke pir mezin de ne. Bi vî awayî sal digihê 88'ê. Destpêka vî salê dibe destpêka şkandina zindanan û yek li dû yek grewên birçibûnê

û mirinê li zindanên Dîyarbekrê dipeqin. Vê carê xurtir in, bi zanîn û bi program hatine rêxistin. Agirê berxwedanê piraniya girtixanên li Kurdistanê daye ber xwe. Û her vê salê daxwazên girtîyan çarçewa kevin û teng dişkêne, êdî daxwaz û dirîsmên bilintir ji dikevin nav sedemên berxwedanan. Û 9'ê sibata 1988'ê keç û kurên kurda, bêdengiyê ji binî diçirînin û vê rojê, eger berdêl mirin ji be, "kerwanê grewan" dest bi meşa xwe ya tarîxî dike. Em ji devê girtîyên Kurd bixwe guh bidin vê tekoşînê:

"Em, girtîyên siyâsî ên li zîndana Dîyarbekrê, eve 8 sal in trajediyekê dijîn. Û dawîya wê hîn nehatîye. Her tişt li alîkî em mirov in û dixwzin wek mirova bijîn. Guh bidin dengê me."

"Em ji zîndana Dîyarbekrê gazî we dikin. Ew zîndana ku rewîştên heyvanî ketine şûna insanîyetê, şexsiyeta insanîyetê xistine bin piyan û di şexsê girtîyên siyâsî de namûsa insanîyetê hatîye kirêtkirin."

"Me hata niha 50 qurban dan, hinek ji wan bi îşkencê hatin kuştin, hinekan ji ji bo protestokirina îşkencê û mirovkujan, dawîya jîna xwe anîn. Em bawer dikin ku hejmara qurbanên me barbarîya li vir eşkere dike."

"Îro li vir çî diqewime, çî rû dide, kuştina girtîyan bi dawî hat? Nexêr. Hîn berî şeş (6) mehan girtîyekî din dibin darê îşkencê de can da."

"Ji ber vê yekê, ji îro û pê ve dijî rêveberîya ku mafê jiyana insanî nas nake û dixwaze dawîya hebûna me ya siyâsî



bîne, me dest bi grewa birçûbûnê a bê dawî kir. Guh bidin dengê me."

"Daxwazên me eve ne:

1- Nizam daxilî û qanûnên rêveberîya nû a girtixanê bila bê guhertin.

2- Li seranser Tirkîyê bila sistema kincên yekreng û tîp bê rakirin.

3- Bila rêveberîya girtixanê mafê nûnerîya siyâsî ê girtîyan nas bike.

4- Bila destên girtîya ne ji piştê, lê ji pêşiyê bê girêdan.

5- Hemû ifade û delîlên niviskî ên di dosyan de bila bidin girtîyan.

6- Bila daktîloyan bidin me.

7- Bila radyo, teyp û amûrên mûsîqî bidin girtîya.

8- Bila mafê bikaranîn û kontrola salona sporê û kitêbxanê di destê girtîyan de be.

9- Bila em bikarin bi ebûqatên xwe re rû bi rû bipeyivin û di demê peyvê de tu "memûr" li wir ne bin.

10- Bila azadîya ragihandinê bêt nasîn. Em bikarin li gel rojnaman bidin û bistînin. Bila namên me neyên xwendin û reşkirin.

11- Bila demê seredanan bêt dirêjkin.

12- Di demê derketina "Hewastandinê" de deriyên oda vekirî bimînin. Tecrîda li ser odên "qaçaxçîyan" û jinan bêt rakirin. Divê em bikarin bi wan re bidin û bistînin.

13- Divê ew xwarina mirovên me ji me re tînin, bigehe destên me, li kantînê cûrên xwarinê û tiştên bêzêdekirin. Xwarina me paqij be.

14- Bila qedexebûna li ser axaftina zimanê kurdî rabibe.

15- Tev kovar û rojnamen li bazaran tîn firotin, bila bi serbestî bê vir ji.

**Ji beyana girtîyan a bi navê "Bo dengê giştî ê şoreşger, demokrat û welatperwer." Govara Medya Güneşi, hejmar 1, Rûpel 11.*

Bi Kurtî Rojana Rojîya Mirinê ya Sibata 1988'an

9'ê sibatê –Sêşemb

Li girtixana eskerî ya Dîyarbekirê – ji bo daxwazên li jor me gotî– rojîya mirinê dest pê kir. Her vê rojê mirovên girtîyan hatibûn seredanê. Belê çend girtî bi tenê hatin dîtina wan û bi zîmanê kurdî ji wan re gotin ku "rojîya mirinê dest pê kirîye" û vegeyîyan. Vê xeberê kes û mirovên girtîya pal da tekoşînê. Çinkû kesê, grewên berê û qurbanên wan ji bir nekiribû. Mirovên girtîyan civîyan ser hev. Li bajêr meşek rêxistin û ji rêveberîya girtixanê bigre heta bo serokwezîrê tirkî erzûhal hatin nivîsin. Dê û babên girtîyan çûn ber deriyê Qumandariya Qolordîya Dîyarbekirê û erzûhalên xwe dan wan.

Her wê rojê polîsên sifil û rîsmî ketin dûv xêzanên girtîyan, fotografên wan girtin, filmên vîdeoyê kêşan.

10'ê sibatê –Çarşemb

Ji bo serokatîya giştî a eskerî û wezaretê berevanî, û serokwezîr û serokcumhûrî telgraf hatin hinartin. Gûrûbek ji ailên girtîyan çûn ba walîyê bajêr. Belê polîsî ew ji avahiyê derêxistin. Paşê çûn bo "Yekîtiya Ebûqatan", lê serokê Yekîtiyê li ser soza xwe ranewesta û nehat ba wan.

11'ê sibatê –pêncşemb

Ji danê sibê û pê de kesên girtîyan li ber deriyê girtixanê civîyan. Xwestin ji pencezan bikarin bi girtîyan re bipeyivin. Paşê bi hev re heta avahîya merkezi ya partîya Sosyal Demokrat (SHP) meşîyan, ji wir çûn, mişawirîya edlî.

12'ê Sibatê –În

Heta îro, ji çu meqamen resmî bersivek nehatibû dan. Xelkê êdî gihişt qeçetê ku bi riyên weha nikarin tiştina bi dest xwe ve bînin. Çar roja li ser hev çûn ber deriyê tev miqamên resmî, lê

bê fêde bû. Li ser vê çendê biryareke nû hat wergirtin ku ew bi xwe ji bo piştgirîya girtîyan dest bi rojîya mirinê bikin. Tev ailên girtîyan li ser roja (sêşema bê) biryara xwe dan û dest bi kar û barên rojîyê kirin. Di vê navê re çend parlementerên (SHP) hatin Dîyarbekirê, lê bêyî ku tiştêkî bikin car din vegeyîyan.

15'ê sibatê –Duşemb

Tev xêzanên girtîyan li gel beşekî mezin ji xelkê Dîyarbekirê û xwendkaran çûn ber deriyê girtixanê, ji wir ber bi avahîya (SHP) ve meşîyan. Li gor ixbaran çend girtîyên di rojîya mirinê de xwîn vereşîyabûn. Ji vê jî xuya bû ku eger rojî dirêj bikêşe, wê qurban pir bin.

Her wê rojê 3 parlementerên (SHP) hatin Dîyarbekirê (Adnan Ekmen, Mahmut Alinak, H.Fehmi Güneş). Xwestin bi îdara girtixanê û bi meqamên din re bipeyivin, lê nekarîn. "Ye-

kîtiya Tebîban” a li Dîyarbekirê piştewaniya xwe bo girtîyan û berxwedana wan îlan kir.

16'ê sibatê –Sêşemb

Ji bo gelê Kurdistanê rojêke dirokî: Bo cara yekem dayîk û qîzên kurd, mirovên girtîyan ji bo protestokirina siyaseta dewletê û piştgirîya kurên xwe, bab û birayên xwe, mêrên xwe dest bi rojîya mirinê kirin.

Kes û mirovên girtîyan bi rojhilatê re car din li ber deriyên girtîxanê civîyan. Daxwaza wan dîsan bi cî nehat û nekarrin girtîyan bibînin an tişteki ji rewşa wan bizanin. Nêzîkî nivro çûn avahîya (SHP) û seet 2 yê bi press konferansê xelkê bajêr û rojname ji destpêkirina rojîya mirinê hatin aghdarkirin. Xelkê Dîyarbekirê ji bo xuyakirina piştgirîyê qefle bi qefle hatin bo cihê rojîyê. Xwendkarên “Uniwersita Dicle” û sendikayên karkeran ji destpêkê alîkarên rojîyê bûn. Bi memûr, karker, gundî, xwendkar û gencên xwe ve tev xelkê Dîyarbekirê rêza xwe li ba mirovên xweragir û rojîya mirinê girt. Her vê rojê du parlamentêrên (SHP) Adnan Ekmen û Mahmut Alinak ji dest bi rojîyê kirin. Bi vî awayî hijmara rojîgira gihişt 28 kesan. Ev hijmar piştî roja siyem gihiş 50 yan.

17'ê Sibatê Çarşemb.

Ji destpêka rojê xelk hatin seredana rojîgiran. Seet 10'ê 400 xwendarên Uniwersîtê hatin avahîyê. Li wir dan xuyakirin ku ew ji li pišta rojîgiran in û eger pêwîst be wê ew bixwe ji dest bi rojîyê bikin. Welê bû ku êdî avahîyê têra mirovan nekir, xwendkar û karker li meydana li ber avahîyê civîyan, govend gerandin, stran gotin. Jinên di rojîyê de bi belavkirina gul û çiçekan keyfa xwe eşkere kirin. Her di vî demê de eberek hat ku serokê (SHP) Erdal Înönü ji xelkê û rojîgira daxwaz dike ku ji avahîya partiyê derkevin, belê bersiva hemûyan bû ev: “Em dimirin, lê ji cihê xwe ranabin, eger Înönü pir dixwaze, em dikarin tabela partiyê jê re bişînin”. Dîsan vê rojê, mirovê girtîyekî ji Stenbolê hat û dest bi rojîyê kir. Dîsan ji Stenbolê endamên (TAYAD) (Komela piştgirîya mirovên girtîyan) ê hatin û beşdarî rojîyê bûn. Edî dengê rojîyê bilind bû û grewê pitir bala dengê giştî yê Tirkîya û çihanê kêşa. Heta seet 1'ê şevê xelk hatin seredana wan. Paşê deriyê avahîyê hat girtin. Polîsan ji aliyê paşî kevir avêtin û camên penceran şkandin. Lê daxwaza şkandina grewê bi cî nehat. (Di van rojan de Salîha Şener û Rahîme Şahîn îlan dikin

ku eger daxwazên girtîyan bi cî neyê wê xwe li meydana bajêr bişewitînin.

18'ê Sibatê –Pencşemb

Bi beşdarên nû, hejmara rojîgiran ji 50 yê derbas bû. Ji her aliyên Kurdistana Tirkîyê mesaj û daxwazên serketinê hatin. Rojnamên Tirkîyayê mecbûr bûn, li ser grewê binivîsin. Xelk ji bajarên nêzik hatin Dîyarbekirê... Edî dengê grewê û tesîra wê wilo mezin bibû ku ji qebûlkirina daxwazan pê ve tişteki di destê dewletê de nema bû. Çinkû dirêjbûna grewê xetereke hîn mestir bû. Seet 1'ê, di îxbarên radyonê de, ji devê Turgut Özal bixwe erêkirina daxwazan hat îlankirin. Bi bîhistinê keyfî û şahîyek pir mezin rû da. Ev îxbar, mizginîya serketinê bû. Mirovên me li ber xwe dabûn û bi ser keti bûn. Vê rojê 3 parlamenterên din ên (SHP) (Fuat Atalay, Mehmet Kahraman, Salih Sümer) tî Dîyarbekirê ji bo ku bikarin avahîya partiyê vala bikin. Ji van Mehmet Kahraman û Salih Sümer çiqas bixwazin ji nikarin xelkê ji avahîyê derbêxin. Xelkê ji wan re digot “Erê, bi dev gotin em daxwazên girtîyan qebûl dikin, lê heta bi kirin ji vî îsbat nekin, em ji avahîyê dernakevin”. Parlementer Fuat Atalay beşdarî berxwedana dibe.

19'ê Sibatê –În

Her sibê zû gûrûbek çû ku bi rêveberîya girtîxanê re bipeyive, lê nêzîkî nivro reşe mizginîyek hat. M.Emin Yavuz, dînemêrê kurd di hundir de şehîd bibû. Gernasêkî din bibû rêwîyê karwanê şehîdan, ji bo serbilindîyê xwe gorî kiribû.

Roja 4'ê ye ji rojîya mirinê a li bajêr. Belê hîn ji bajarên din, ji gundan sef bi sef mirov tînin û destê alîkarîyê dirêj dikin. Dikandar dibêjin “eger daxwazên wan bi cî neyê, emê dikana bigrin”. Xwendkar gûrûb bi gûrûb hazîrîya beşdarîya grewê dikin.

Ber bi nivro lehîya mirovan dîsan ser bi girtîxanê de digre. Peyv û gift û go heta êvara dereng dikêşe û seet 6.15'ê parlamentêr di gel 4 mirovên girtîyan diçin ba rêveberîya girtîxanê û paşê diçin seredana girtîyan. Girtî ji wan re dîyar dikin ku tev daxwazên wan hatîne qebûlkirin û rojîya mirinê a li hundir bi dawî hatîye. Seet 18,45'ê ev mizginî gihişt rojîgiranê ji derve û bi vî awayî yekemîn rojîya mirinê a li Dîyarbekirê serket. Berxwedan di wext û cihê kî rast de bi cî hat û mirovên me, eger bi qurbandanê ji be gihiştin armanca xwe ku hêjayê gotinê ye: Yek ji daxwazên girtîyan, bi serbestî axaftina zimanê kurdî bû.

Durûtiya Hukumeta Tirk

Lê hikûmet car din li ser soza xwe namîne. Daxwazên girtîyan bi temam bi cî nayên. Piştî berxwedanê 40 girtî bo girtîxanên din tînin nefîkirin. Ji ber ku hinek girtî simbêla berdîdin, mehekê namên girtîyan nayên hinartin. Pîsatiya mişkan tevli xwarina girtîyan dikin. Dest deynin ser pere û kinc û tiştên girtîyan... Agirê berxwedanê ve carê li girtîxana sifil a Dîyarbekirê geş dibe. 50 girtî ji bo rakirina sistema kincê yek reng, xweşkirina rewşa sihi a girtîxanê, erzankirina tiştên li kantînê û daxwazên din 3 yê nîsana 1988'ê dest bi grewa birçibûnê dikin. 6'ê nîsanê hijmara wan digihe 127 kesan. 8'ê nîsanê girtî neçûn mehkîma, vî ji xuya kir ku di grewê de ne. Ji ebûqatên girtîyan Mustafa Özer û Hikmet Bozçalî piştî ku bi girtîyan re peyîvin, eşkere kirin ku girtîyan daxwazên xwe bi 13 bendan pêşkêşî rêveberîya girtîxanê kirine û ji bo bi cih hatina wana ji 3 yê nîsanê rojîya mirinê dest pê kirîye. 10'ê nîsanê hijmara rojîgiran digihê 350 kesan. Ji Yekîtiya Ebûqatan gûrûbek diçe serredana girtîyan. Girtî ji wan re ji xuya dikin ku heta bi cih hatina daxwazan, wê grewê baje.

Roja 13'ê nîsanê mirovên girtîyan diçin ba walîyê Dîyarbekirê, Hamdî Ardal. Belê Walî dibêje “Ez ne ew meqam im, yê meselê çareser bikim” (!) Her wekî cara berê çu meqaman xwe nêzî çareser kirina meselê nekirin. Li ser vî yekê 16'ê nîsanê dayîkên girtîyan çûn avahîya (SHP) ê, dest danîn ser sindoqên hilbijartina delegan û dest bi grewa birçibûnê kirin. Tişteki xerîb e (!) rojnamên Tirkî –tevî ku mirovên girtîyan hema bêje her roj ew aghdar dikirin– bê deng bûn û kesê tişteki nedinivîst. Lê rojnamevanekî ku newxest navê wî bê gotin– got “buoyên me ji aliyê hinekan ve tînin kontrolkirin û ji me re dibêjin, di derbarê grewê de tişteki nenivîsin”. Roja 18'yê nîsanê kes û mirovên girtîyan li ber girtîxana sifil dicivin, hinekên wan avahîya edlîyê didin berkeviran. 25'ên wan jin, 27 kes tînin girtin. Lê berxwedan ranaweste. Girtîyên li girtîxana eskerî, bo 2 rojan dest bi grewa piştgirîyê dikin. 19'ê nîsanê rêveberên (SHP) ên Dîyarbekirê, endamên Meclîsa Beledîyê û Komîsyona Disiplînê a (SHP) biryara beşdarîya grewê werdigrin. Grew ji sendîka Petrol-Îş'ê ji alîkarî digre û bi vî awayî hijmara beşdarên grewa ji der ve digihe (90) kesan. Her wiha mixabîrek ji rojname ingilîzî The Independent” ê diçe seredana mirovên girtîyan ên di grêwê de. 20'ê nîsanê 27 kesên berê hatin girtin, tînin berdan. Dîsan midurê girtîxanê û sawcî bi girtîyan re dikevin gift û goyê. Piştî

tî minaqeşên dirêj, rêveberîya girtîxanê mecbûr dibe û tev daxwazên girtîyan qebûl dike. Bi vî awayî grew tê sekinandin.

Hêjayî gotinê ye ku ji bo piştgirîya grewa li girtîxana sifîl a Dîyarbekirê, girtîyên girtîxana Riha yê ji ji 12 nîsanê û pê de heta bicîhatina daxwazan, dikevin grewa birçîbûnê.

9.5.1988 an de bi qanûneke nû statuya eskerî a girtîxana Dîyarbekirê guhertin û kirin girtîxana sifîl. Rêveberîya nû bo siftehê 4 girtîyên jin (Sakine Polat - Emine Turgut, Cavide Şener, Mevlude Can) nefî dike. Lê tev girtî dijî vî biryarê rawestan. Girtîyên jin, bi textên razanê derîyên oda girtin, pembûyên doşekan ji li hawirdora xwe belav kirin. Wan da dîyarkirin ku eger nefîkirin neyê rawestandî, wê xwe bişewitînin. 10.5.1988an tev girtîyên li girtîxanê bo piştgirîya berxwedana jinan, bo 2 rojan biryara grewa birçîbûnê wergirtin. Di vî navê re mirovên girtîyan bi bûyerên li hundir hesîyan, bi telgrafan wezaretê Edalet û serokwezîr ji rewşê agahdar kirin. Her vî rojê grewa 2 rojî, bi biryara grewa bêdawî hat guhertin. 12.5.88'ê rêveberîya girtîxanê bi nûnerên girtîyan re peyivî û ji wan re "qayîdên nû" ên girtîxanê xwend:

1- Mirovên girtîyan wê di 15 rojan de bir tenê niv seetê bikarin bîn seredanê.

2- Çûnûhatina di navbera qowûşan de wê bê rakirin.

3- Bihayê tiştên li kantînê wê giran tir bin.

4- Faalîyetên kulturî û sporî wê bîn tiwîbkirin.

5- Rêveberî wê bikare girtîyan nefî bike.

6- Dekfîlo, radyo û teybên li hundir wê bîn civandin. 7- Xwarina ku dê û babên girtîyan tînin, her dem nagihe destê girtîyan

8- Wê girtî bi xwe amîr (alet) û melzemên paqijiyê bikirin.

9- Girtî ji serûberîya qowûşa berpîrsîyar in.

10- Eger rêveberîya girtîxanê bixwaze wê bikare namên girtîyan reş bike.

11- Bi tenê mirovên pir nêzîk wê bikarin bîn seredanê.

Bi kurtî durûtîya politîka rêveberîyê, bi vî kirinê dubare dibe û gelê Dîyarbekirê û cîhan dîsan dibin şahîd ku tişteke ji soza hikumeta tirkî bê rûmetir tune ye.

Lê, li dijî sozên hukumetê, têkoşerên kurda hebûn. Tevî ku gerew (berdêl) a her qazancekê canek bû. Belê tev girtî û xezanên wan bi berxwedanan gihiştîbûn encameke rast û bê şik: Ji bo parastina qazancan bi tenê riyek hebû; mirin. Û hemû ji dil rêwîyên vî riyê bûn.



Jinên kurd, ên di grewa birçîbûnê de...

Foto: Amanc/Diyarbakir

13.5.1988'ê mirovên girtîyan zanîn ku heta niha kontrola sihî a girtîyên di grewê de çenebûye. Rêveberîyê, bi eşkere kuştina girtîyan dixwest. Qelebaxa li ber girtîxanê civîyabû, berê xwe da avahiya (SHP) û dîyar kir ku ew mafên di 18'ê sibatê de ji devê serokwezîr Turgut Özal bi xwe hatin qebûlkirin, car din ji wan hatibûn standin.

Roja 14.5.1988'ê ji mirovên girtîyan 25 kes di avahiya (SHP)'ê de ketin grewa birçîbûnê. Her vî rojê tê zanîn ku hinek girtîyên di grewê de nexweş bûne, lê dîsan ji nabin ba diktoran. 15.5.1988'ê mirovên girtîyan li gel serokên rêxistina bajêr a (SHP)'ê, serokên sendîkayên (YOL-İŞ) beşê yekem û (PETROL-İŞ), serokê Komela Mafên Însanî a Dîyarbekirê, serokê Komela Tebîban a Dîyarbekirê (li ser navê xwe), sekreterê Yekîtiya Ebûkatên Dîyarbekirê (li ser navê xwe) û serokê rêxistina (SHP)'ê a Batmanê civînek amade kirin. Tevan piştgirîya xwe bo grewê nîşan dan. Seet 12'ê sevê xeberê hat ku ji girtîyan, Sîracetîn Kirici li ber mirinê ye û hatîye rakirin bo nexweşxanê. Roja din parlementerê (SHP)'ê Fuat Atalay hat Dîyarbekirê û mirovên girtîyan re peyivî. Xelk pir aciz bibû. Çinkû erefeta Cejna Remezanê bû û hîn ji tişteke ji girtîyan û grewê nezanîbûn. Di vî navê re ji dayikên girtîyan, Rahîme Şahîn û Salîha Şener ji avahiya (SHP)'ê derdikevin û berê xwe didin sûkê. Piştî demekê ixbarek gihişt cihê grewê ku her du jinên kurd, SALIHA ŞENER û RAHİME ŞAHİN li ber beledîya Dîyarbekirê benzîn bi xwe de kirin û xwe şewitandin. Ji ber cejinê bazar pîrî mirov bû. Xelk digihin wan û êgir vedimirînin. Paşê polîs tê, dibe xirecira jinên birîndar û polîsan û her du dayikên kurd didin ber qîran. "Bimre koletî, bimre îşken-

ce, bijî azadî" û bi kurtî ber bi qereqola nav sukê ve tîn xişxişandin. Dayikên din ên li cihê grewê ji ger daxwazên girtîyan bi cî neyê bi "xwe şewitandinê" gef li rêveberîyê kirin. Êvarê kesên ji ber derîyê girtîxanê hatin, ragihandin ku girtî û rêveberîya girtîxanê li hev hatine. Tev daxwazên girtîyan hatîye qebûlkirin. Lê dayikên girtîyan heta soza berdana her du dayikên xwe şewitandî stendin, grew ajotin.

Di dawîya berxwedana gulana 1988'an de "maf"ên ku girtîyan bi dest xistin, eve ne:

1-Dî 7 roja de (1)seetekê tev mirov û kesên girtîyan wê bikarin bîn seredanê.

2-Mirovên girtîyan hemû caran dikarin xwarinê bibin hundir.

3-Wê rêzên naman neyên reşkirin, eger rêveberî nexwaze name derkeve, wê car din li girtîyan vegeirîne.

4-Çûnûhatina di navbera qowûşan de wê berdewam be.

5-Wê çay li gor bihayê ku girtî dixwazin bê kirin û girtî kengî bixwazin wê çay bê çekirin.

6-Faalîyetên kulturî û sporî wê her wek berê berdewam bin.

7-Wê rêveberîya girtîxanê amîr û melzemên paqijiyê bikire. 8-Girtî û rêveberîya girtîxanê wê bi hev re ji serûberê girtîxanê berpîrsîyar bin.

9-Girtî wê bikarin dekfîlo, teyb û radyonan bi kar binin.

10-Wê nefî bêt rakirin. Bi tenê îdara girtîxanê wê bikare girtîyên hikmê wan sabît bûyî û yên tu mehkemên din nebin, biguheze girtîxanên din.

11-Tev mirov û kesên dûr û nêzîk yên girtîyan wê bikarin bîn seredanê.

12-Ji ber grewa birçîbûnê, di derheqê kesî de mehkeme nayê vekirin an ceza disîplînê nayê dan.

“Me dixwest ku ji derve dengê rêxistî, welatperwer bigihê me,,

behsa jîyana Mehdi Zana a li hundir û berxwedana wî bikî.

Xwendevanên delal!

Berbang, li ser Mehdi Zana û berxwedanên li girtîxana Diyarbêkrê bi Kak Ferhad Ehmed re peyîvî. Em li jêr sihbeta xwe pêşkêşî xwendevanên dikin.

Berbang: Te, cara pêşt kengî û çawa Mehdi Zana dît? Hûn çi qasî bi hev re man?

Ferhad Ehmed: Sala 1981'ê berî hatina mirovkuj Esat Oktay, min ew di hucrê de dît. Wê demê hazirîyek hebû ku girtîyan û kesên ku tesîr li ser wan dikin, ji hev biqetînin. Lewra kesên xuya berhev kirin û birin hucran. Me hev li wir dît. Li ser hev, em ji du salan bêtir bi hev re man.

B: Em, ji gotinên kesên ku bi pê re mane, ji belavokên Amnesty û bi riyên din, pê dihesin ku îşkenceyeke giran li Mehdi Zana dikin. Li dijî Mehdi Zana siyaseteke taybetî a îdara girtîxanê hebû? Çi ji ber navê wî, wek serokê Belêdîya Diyarbêkrê, çî ji ber berxwedana wî?

F.E: Muamela hikmetê, li hember girtîya bi tevayî weke hev bû, yek bû. Çi bi pirtûkên li ser Kemalîzmê, çî bi îşkencê, pelaxtina şoresgerên kurd, bê şexsiyetkirina girtîyan û şuştina mejiyê wan. Polîtîka wan bi kurtî ev bû. Lê, li ser mirovên ku xuya ne, di şexsê xwe de hin tiştên din temsîl dikin, pir disekin: Wan bê hêvî bikin, li pêş çavên girtîyan biçûk xin, bê şexsiyet bikin. Çinkû gava îdara hebsê bigiha vê armancê, tenê zerar ewê bo nimûne li Mehdi Zana nebûya; Di şexsê Mehdi Zana de wê potansiyela welatperwer ji zerar bidîta... Helbet, gelek caran ji qerdîyan ji bo kêfa xwe, an ji bo pesnê xwe pê bidin, dihatin «Extra» lê dixistin.

B: Piraniya me dizanin ku girtîxane an zindan dinyayeke din e. Tengavî ye, îşkence ye. Bi gotineke din, mirov tîn «imîthankirin». Ji wî alî ve tu dikarî

F.E: Ez nizanim yekî din, ê ku pê re mabe, dikare di derheqê Mehdi de çî bibêje. Belê qasî ku min Mehdi nas kir, min kêmasiyek pê re nedît... Milîtan bû. Wek xortekî 18 salî bû... Tevî ku porê wî ji spî bûye, lê Mehdi tim û tim li rêzên pêşiyê ye... Tewrê wî, ê li hember dijmin, tewirkî nimûne bû. Bi rastî ji nimûne bû. Sal 43, belê dil xort û tekane. Pir bi ezîm bû. Pir bi biryar bû... Paşê ne mirovkî burokrat e. Mîna zarokê bi te re he nek dikir û mîna merivê serwest bi te re minaqeşe dikir, dipeyîvî. Bi tolerans e, dil pak e. Însan, ji kîjan rêxistinê bibin bila bibin, nanê xwe, ava xwe, qehra xwe, kêfa xwe bi wan re parve dikir. Tiştêkî din ê girîng ku yê pê re mabin, baş dizanin: morala wî, qidûma wî qet û qet neşkest. Meselen di 1982'an de welê bûbû ku edî meriv ne dikarî nefes bikşîne, hewqas îşkenceyeke giran heye. Heta «kuxik» ji bi îzin bû. Digotin «kî bikuxe, wê ewqas çî bixwe» Kontroleke weha giran hebû ku 5 merivên ku di hîcrekê de ne, nikarin bi hev re qise bikin. Tu ji dinê bê xeber î, ne tv.e, ne radyo ye, ne rojname ne, ne ziyaretçî dikarin tişkî bêjin. Di van şertan de kesê nedît ku Mehdi qidûma xwe şand. Her tim bi kêf bû, te digo qey di mala xwe de, di nav zarokên xwe de rûniştîye.

B: Bê guman vêya tesîr li girtîyên din jî dikir?

F.E: Hem bi vî awayî dikir, hem jî bi kirinên xwe yê dijî îdara hebsê, dijî qardîyana, dijî mehkemê... Bala xwe bidê, ji 1981'ê ta destpêka 1983'ê berxwedaneke mezin heye, lê îlan nebûye. Mîrov, bi hukmê xwe, bi taqeta xwe didin ajotin.

B: Çawa?

F.E: Li hember şert û qaîdên dijmin derdikevin, wan bi çî naynin, gava di çin nexweşxanê, ziyaretê, di hundirê qawûşan de. Bi vî awayî, wî rihê berxwedanê, ê di sînga girtîyan de li ser piya didin sekinandin. Helbet bi xwîna xwe. Çinkû her carê ku ew wiha dikin 50 çî, 60 çî dixwin, tîn zincîrkirin, nan û ava wan tî birin. Wana ev tişt dizanin, lê dîsan jî qaîde bi çî neta-nin... Eger dijmin tîkilîyên rêxistî nehêlabe jî, ne karîye îrade û ezîma hi-

nek merivan bişkêne. Wan merivan îrade xwe, xwîna xwe kirin çeper ku girtîyên din bê hêvî nebin. Dijî tev qanûn û nîzamên îdara hebsê, Mehdi û kesên wek Mehdi li ber xwe dan. Û di navbe-

Straneka Zelal ji Zîndaneka Şêlî

Hayê dayika minêl hayê
Xemêt me hindî dinyayê
Qamçîya reş...

leşê min xwar

Xerîbiya...

cergê te xwar

Ev dinyaya ho berdirayî
Ma bihostek û çar dîwar...
Roj kevr in bi rêve naçin
Sal dewr in xilas nabin
Lê dayikê!

Her ho nabît

Zindan her mala min nabît

Şînî her karê te nabît

Buhara me

her di zîkê hûtî da nabît

Sibe... dîwarê xilole...

dê herifin

Qeyd û zincîr...

dê herişin

Qamçiyê reş...

dê bin bizot...

Leşê xudanê xo sojin

Dê hême ve û

Dê rizgar bin

Ez jî dîwara û tu ji xerîbiya

Hîngê lîvê te yê tîhnî

Dê tîr vexon

Jî kanî û rûbarê demê min...

Lê dayikê!

Ez dibînim...

Tîrok û balavê xelkî

Destê te yê şeqşeq kirin

Ez jî dayê qeyd û zincîr

û qamçîya

Hîzar kend û korê di leşê

min vekirin

Lê ji peqêt destê te dayê!

Kanî dê zên

Jî kend û korê leşê min jî

Roj dê helên

Hîngê jîyan dê ya xoş bit...

Hîngê dayê!

Mueyyed Teyib

1978- Dihok

ra dijmin û girtîyan de ji goştê xwe, ji hestiyên xwe dîwarek ava kirin.

B: Kak Ferhad her bi pirstiyara din ve girêdayî; Piştî ku te Mehdî nas kir, rewşa wî zanî, tu dikarî bi kurtî jî be ji me re fikra xwe a li ser Mehdî bibêji? Bi te Mehdî Zana kesekî çawa ye?

F.E: Ger bi kurtî ez qeneeta xwe a di derheqê wî merivî de bêjim: Mehdî Zana bi jiyana xwe ya hebsê, bi jiyana xwe ye şoresgerî li ser tevgerê bi tevayî tesîreke çawa kir. Bila tevgera şoresger û welatperwerên kurd ne bi tenê mênên nîya wî, xurtîya wî nas bikin. Çinkî

“ Mehdî, li hember dijmin, şoresgerî, demokratî, welatperwerî çî ye, vêya nişan da, ”

Mehdî Zana di hereketa piranî de mîsalekî pir cihê ye. Ji ber vê yekê, divê neslê do û ê îro jî her alî ve Mehdî Zana nas bikin. Eger em bikarin wî nas bikin, emê hinek problemên ku di hereketê de hebûn, fam bikin. Bu nimûne, Mehdî Zana sala 1977'an beşdarî hîlbijartina serokatîya Beledîya Dîyarbêkrê bû. Di hîlbijartinê de -ji bilî rêxistinekê- giş li dijî wî bûn. Bi tenê dijî wî nebûn, diçûn, li hember wî hinek kesên din didan pêş ku meriv dikarîbû rawîştê (nitelîk) wan û yê Mehdî bide ber hev, li ser mînaqesê bike. Ew rêxistina di hîlbijartinê de alîkarî kirî jî piştî hingî li dijî Mehdî xebitî. Elbet ev tewrê wan heya girtina Mehdî û heta îro jî hat. Belê Mehdî bi xebata xwe, bi bîr û bawerîya xwe bersîvek da gişan. Divê em bikaribin vê bersîvê fam bikin. Ev bersîv eve ye: Mehdî bi jiyana xwe ya hebsê welê kir ku ew hêzên ku dixwestin wî babetekî din rûyê mîlet bidin, ser nekevin Mehdî tam vajîya vê xuya kir ku mirovê şoresger û demokrat çawa ye. Û divê çawa be. Ev yek. A din, Mehdî li hember dijmin, şoresgerî, demokratî, welatperwerî çî ye, vêya nişan da. A sisîyan divê li hember welatperwerekî tewrê meriv çawa be, Mehdî ev eşkere kir û a çaran bi merivên siyasî û ne siyasî re divê têkiliyên me çawa bin, Mehdî eve jî nişan da. Divê her kes li ser van niqtan ji xwe bipirse. Çima me nekarî berî 7-8 salan an berî hebsê merivî weha nas bikira? Mehdî Zana di 1971'an de heye. 71 derbas dibe, derbeyeke din tê, dîv derbê 7 sal şûnde ji nû em dibêjin Mehdî Zanakî me heye. Anku divê meriv li ser van tiştan mînaqesê bike. Mehdî û rewşa wî tesîreke çawa li ser însan û rêxistina kir, li ser têkiliya rêxistinên kîjan pirs anîn ortê.

B: Piştî 1980'yê gelek kurd hatin girtin an ji welêt derketin. Piranîya qazancên berê ji dest çûn. Bi te berxwedana Mehdî

û tev girtiyên din çî feyde gîhand tevgera kurdî a li welêt? Bêdengî, bi berxwedana wan hat şkandin?

F.E: Piştî 12 Îlonê beşekî mezin ji berhingariya (mixalefet) şoresger tê pelaxtin. Wek serkanîya mixalefetê, tu, tişkî nabînî. Li parça herî mezin ku 15 mîlyon meriv li dijî û erdekî fireh heye, lê qet serkanîyeke mixalefetê tune. Belê deng ji derekê tê...Ji hebsa Dîyarbêkrê tê. Ev deng ji girtîyan tê, jî dê û bavên girtîyan tê. Paş 12 Îlonê û heta îro jî li Kurdistanê Tirkîyê, girtî, tevgerê li ser piştî xwe dibin. Ew wek «girtî» bi wezîfa xwe radibin û karê ku divê rêxistin bikin, ew wê jî dikin.

Piştî 80'yê tu çiyek ku bikare mixalefeta mayî rêkbixe, bîne ser hev, tunebû. Hebsa Dîyarbêkrê ev wazîfe girt ser xwe. Wek çirakî biçûçik, ro bi ro geş kir, geş kir, îro anî cîkî weha ku 2000 merivên girtîyan êrîşî hebsê dikin.

B: Kak Ferhad her bi vê meselê ve girêdayî tu dikarî hinekî li ser lîxwedîderketina berxwedanan bi peyîvî. Bi te partî û rêxistin û dezgehên kurdan, çî weke kes li Mehdî Zana û girtiyên din û çî bi giştî li berxwedanan xwedî derketin an na? Eger lê xwedî derketibin, kêmasiyên lîxwedîderketinê çî bûn?

F.E: Em dibêjin, divê tevgera şoresger gelê xwe biparêze. Çi li girtîxanan, çî ji derve li berxwedanan xwedî derkeve...Gava tevgera şoresger derbe dix-

“ Belê, deng ji derekê tê... Ji hebsa Dîyarbêkrê tê, ”

we, bin dikeve, bi piranî «rojhilata navîn» têt qisekirin û xurtbûna dijmin: Çar dewletê hawîrdor û 15 dewletên ereban ku hemû jî li dijî Kurdistanê serbixwe ne. Sedemêkî binketîne vêya tê nişandan. Rast e, vêya her tim heye. Lê derî vê, sebebê binketîne piçek jî girêdayî pêşengîya rêxistinên me ye. Yanî rolê pêşengîyê jî di vê binketîne de heye. Îcar heya îro jî ev rol bi giranî mînaqesê nebûye, weke zerûrî mînaqesê nebûye. Gava mînaqesê bibe, rolê wan çî ye wê derkeve ortê û meriv wê bikare tedbîra bigre.

B: Anku, tevgera kurdî nekarîye li berxwedanan û li girtîyan xwedî derkeve?

F.E: Li mehkemeyekê, şoresgerekî tirk weha dibêje: «Hûn ceza didin me, ji ber ku em li dijî faşîzmê têkoşîne. Lê wê gel me gunehbar bike ji ber ku me li dijî faşîzmê xwe tenzîm nekir, bi rêk nexist». Ev gotin di cîkî de rewşame jî xuya dike. Dewleta tirk dibê ku kurda jî bo rûxandina Cûmhûriyeta Tirkîyê û

avakirina Kurdistanê serbixwe, partî û rêxistin damezirandine. Lê ev gotin di cîkî de ne rast e: Erê kurda rêxistinên xwe ava kirin. Belê bi rastî jî bona ku bikaribin şerê azadîyê bidin, Kurdistanê serbixwe ava bikin, rêxistineke weha çênekirin. Gava rêxistineke weha nebe, xelkparastin jî,

“ Rolê pêşengîyê jî di vê binketîne de heye. Îcar heya îro jî ev rol bi giranî mînaqesê nebûye. ”

girtîparastin jî zehmet e. Û wer jî bû. Gava derbe hat zêde tişkî çênebû: Deng tev hatin birîn û ew însanê di hev-sê de jî, gundî jî, karker jî, gişt bê xwedî man. Bi tenê girtî hebûn û merivê wan hebûn.

B: Baş e, wek girtî, hûn mihtacî çî bûn? We çî alîkarî dixwest?

F.E: Bi kêmanî me dixwest ku ji derve dengê bê me, bes dengê bigihe me. Dengêkî bi rêxistî, welatperwer bigihe me...Vêya têra me dikir.

B: Wek pere an tiştên din?

F.E: Ne..Ne ku rêxistin bila ji me re pera bişînin, an bîne me ji hebsê birevînin. Ihtîyaca girtîyan hebû ku bi dengêkî bihesin, pê bihesin ku li hember dewletê hîn dengê heye. Yan jî dengê sîlehêkî dixwest pê bihesê. Gava xeberê dihat, digotin: «filankek û bêvankes bûne yek» yan «merivên te û yê filankekê yekî çêkirine». Pir kêfa me dihat. Welê ku me henek dikir, me digot: «Êdî, mehekê em dikarin xwe li ber çû bigrin». Tevî ku me henek dikir, lê rast jî bû. Li ser însanan pir tesîr dike. Îcar, demeke dirêj ev dengên wilo ne giştin me. Di şûna wê de, li vê dawîyêde nûnerên Amnesty, Komîsyona Mafê Mirovan an rêxistinên din yê humanîter dihatin. Lê meriv dixwaze ên meriv jî hebin, hin tiştan bikin.

B: Heval Ferhad eger em car din vegerin ser Mehdî. Em dixwazin, tu li ser hinek tiştên Mehdî bi xwe bipeyîvî...Bîrhatinên te bi wî re an tiştên te bihîstibin an te bi xwe dîtibin.

F.E: Carekê emê derketibin ziyaretê. Merivên wî jî hatibûn...Îcar li pêş hucra jî saloneke mezin hebû: Merivên kê hatibin, navên wan dixwînin û wan li salonê rêz dikin, paşê dibin. Helbet di wê navê re qerdîyan her tim li girtîyan dixin, heqeret dikin. Hingî qerdîyan hebû, me navê wî kiribû «çingene». Wî qerdîyanî copek (darekî qut û stûr e) da destê yekî û jî Mehdî re got: «rûne ser» hevalê ku qerdîyan cop jê re dirêj



kirî got: «ez nagirim». Lê qerdîyan pir lê xist, dikir bikušta. Paşê hevalên di hucrêde bi dengê nizim jê re got: «Lawo bigre, tişkî nabe. Tu bigre, her Xalê Mehdî rûnane ser»... Û Xalê Mehdî jî her digot: «Ez rûnanim». Çiqas pê ve ma Mehdî rûnenişt, tim digot: «Tu min bikujî jî, ez rûnanim». Qerdîyan fam kir ku Mehdî rûnane û eger lêxe, Mehdî yek car rûnane û wê

“Çima em dibêjin: «Divê, em li bihayên pozîtîf ên tarîxa xwe xwedî derkevin?» Bihayê pozîtîf çi ye? Însanekî wek Mehdî ye, serhildanek e, straneke bi muhtewa ye, tabloyek e, helbestek e. »

prestîja wî bişkê, ew tirsana wan a li ser girtîyan wê bişkê. Rabû û jî Mehdî re got: «Kuro Mehdî, eger tu rûniştiba, min ê te bikušta». Dîsan carekê em li «havalandirma» (hewastendin) bûn. Pir li me xistin. Em mecbûr kirin ku em li piştê hev siwar bibin. Yek li piştê Mehdî siwar bû, qey piştê wî êşîya. Jixwe her tim êşa piştê hebû. Yuzbaşî Esat Oktay hat, mîna ku bibêje 'Ez yuzbaşî me, ez ê weha li te bikim' û jî Mehdî re got: «Ha Mehdî, te hawayek baş stend» Xalê Mehdî li zîvirî û got: «Eve ne hawastendin e, îşkence ye. Hûn îşkencê li me dikin». Îcar Esat Oktay û yek jê re bibêje 'tu îşkencê dikî'. Yuzbaşî rabû, çû jî qerdîyan re got: «Lêxin»... Eger mirov mîsalan bîne, jîyana wî a hebsê tev mîsal e. Carekê bi tenê jî jî cendirmekî re, jî qardîyankî re, jî zabitekî re negot 'belê ezbenî, tu cawa dibêji bila wilo be'. Wana çî digot, Mehdî vajîya wê dikir. Xeber didan, Mehdî digot 'çima xebe-

ran didî? Lê dixistin, Mehdî digot 'çima lê dixî'. Vana pir muhîm bûn, wê çaxê. Yanî gava yekî digot: «çima lê dixî», qerdîyan tev şaş diman, diçûn ba hev û digotin: 'Erê, ev çawa diwêre û weha dibêje'. Yanî tişkî ecêb bû. Çinkû hîni dîtina tiştên weha nebibûn.

B: Gelek caran em dibihîsin ku Mehdî nexweş e û nabin ba tixtor. Gelo dema te ew dîtî, seheta wî çawa bû?

F.E: Nexweş bû. 'Astim' û 'Bronşît' hebû. Piştê wî tim dêşîya.

B: Qet nedibirin ba tixtora an dermanek?

F.E: Na. Qet. Carekê em birin, ris-mên me kişandin. Carekê jî em birin ba grûbeke tixtoran, hema wilo li ser piyan li me nêrin û gotin: «Herin, tişkî we tune ye». Rewîrek hebû, tixtorê li wir jî jî xwe îşkencecî bû. Bi nav tixtor bû. Hinek dermanên wî yê standard hebûn, bi kêrî hemû nexweşîyan dihatin (!)

B: Kak Ferhad, wek gotina dawî, di derheqê Mehdî û girtîyan de tu dixwazî çî bibêjî?

F.E: Em, di xwedîlêderketina Mehdî û girtîyan de piçek dereng man. Çaxê em çavên xwe li dinê digerin, insanekî qasî Mehdî nekirî jî, em dibînin xwedîyên wan çito lê xwedî derdikevin. Bi her awayî, bi hemû rîyan alîkarî dikin, kampanya vedikin. Girtîyên xwe yê siyasî dikin al. Ez nikarim îzah bikim, çima em nikarin li Mehdî û bi sedan wek Mehdî xwedî derkevin? Bihêle em Mehdî û yê wek wî bikin al, hîn jî em pê re dost nînin. Çima em dibêjin: «Divê em li bihayên pozîtîf ên tarîxa

xwe xwedî derkevin»? Bihayê pozîtîf çî ye. Însanekî wek Mehdî ye, serhildanek e, straneke bi muhtewa ye, tabloyek e, helbestek e. Dibe ku yê ew tablo çêkirî an helbest nivîsî, fikra min û wî ne wek hev bin. Lê ew, bi wê xebata xwe, jî tarîxa me re bûye mal. Xalê Mehdî jî û kesên din jî weha ne. Ez nabêjim em Mehdî bikin tabû, jê re biçin secdê. Lê heqî wî jî nexwin. Bi salan ketîye hebsê, îşkencên giran dîtine, li ber xwe daye. Hîn jî di hebsê de ye û hîn jî qismek naxwazin, bibêjin 'Mehdî Zanakî me heye'. Û li gel Mehdî merivên me yê din jî hene. Çî di nav rêxistinanan de, çî li derveyî rêxistinanan. Ji bo ku em li wan xwedî derbikevin, pîvan, krîter divê ne ew be ku ew kes 'bila ji partîya me be', 'bila ji rêxistina me be', yan 'bila wek me bifikire'. Ev ne şert e.

B: Bibûre, niha hat bîra min: Berî ku em dest bi peyvê bikin, te qala sihbeteke girtîyan kiribû. Di derheqê yekgirtîyê de...

F.E: Erê. Gelek caran em rûdiniştin û em jî xwe re dipeyivîn. Carekê, em dîsa di qawûşê de rûniştine... Hevalekî got: «Yaho, weha çiqas xweş e. Do me li hev dixist, me bera hev dida, me jî hevdu insan dikuştin. Lê îro, di hebsê de em gîş bi hev re ne. Em xweşiyê jî, nexweşiyê jî par ve dikin, em di hembêza hev de radikevin. Tew, do me nikarîbû, em silava li hev bikin». Xalê Mehdî jî rabû, wilo bi niv henekî, niv ciddî, got: «Xalo, vêya ne tişteke e. Eger em jî vê derê filitîn û me car din karî em weha bikin, wê çaxê em ê bêjin 'el-heq' vêya temam e.»

B: Pir sipas

F.E: Sipas.

MEHDÎ ZANA

Mehdî Zana 1941'ê li paytextê kurdên Merwanî, li Farqînê tê dinê. Hingê bavê wî di Belediyê de memûr bû. Mehdî li Farqînê dest bi xwendina seretayî dîke, heta sefa duwem a xwendîngeha navincî dixwîne û paşê xwendina xwe dihêle. Piştî wextekî kin li ber destê «Niyazî Ûsta» dest bi terzîtiyê dîke. Li gor diya wî, hîn di zaroktiya xwe de, nerazîbûna li dijî neheqîyan rawêsteke xuya a Mehdî bûye. Lewra bi piranî bi kesên pêşverû re dide û distîne. Derçûna kovara «Dicle û Firat» ji Mehdî re bûye mizgîniyeke mezin û hîn wê demê li ser zimanê kurdî xebitîye.

Mehdî Zana di sala 1962'an de, li Farqînê beşdarî avakirina rêxistina TIP (Partiya Karkerên Tirkîyê) dibe. Di xortaniya wî de, rawêstê rawestana li dijî neheqî û zilma li ser rênçber û gundiyan, zelaltir dibe. Her ji 1965'an heta 1970'an Mehdî li Farqînê dibe xebatkarekî nimûne, dijî cendîrme û zabitana, dijî memûrên bertilxur û sextekar, ji bo gundiyan dibe cihê gazînd ragihandinê.



Mehdî Zana, têkoşerê nimûne

Sala 1966'an bi zanîn paşnavê xwe «Bilici» diguhere û dîke ZANA.

1968'an ji (TIP) ê dibe berendamê parlementeriyê ji Dîyarbekrê û li piraniya bajarên Kurdistanê Tirkîyê digere, beşdarî «Doğu Mitingleri»

Xwepêşandanên Rojhilatê dibe. Berî cûnta leşkerî a 1971'ê bi du mehan ji ber ku di mitinga bajarê Hilwanê de ji xelkê re gotibû «Ev war, warê we ye.» hat girtin û 3 sal û 2 mehan di zindanê de ma.

1974'ê, Mehdî Zana dibe endamê komîta merkezi ê (TIP) ê û serokê rêxistina (TIP)ê li Dîyarbekrê. Paşê li gel hinek kurdên din, li ser mesela kurdî ji (TIP)ê qetiya û beşdarî avakirina grûba siyasetî (Riya Azadî) bû.

1977'ê li Dîyarbekrê ji bo serokatîya Belediyê hat hilbijartin, heta ku roja 21.09.1980'ê li Stenbolê careke din hatî girtin, her serokê Beledîya Dîyarbekrê bû. Heta vê salê jî Mehdî carên bê hejmar û hemû caran jî, ji ber kurdîtiyê û karê siyasetî ketibû zindanan.

Di girtîxana leşkerî a Dîyarbekrê de, dijî îşkencê û siyaseta mejîşûştinê a dewleta tirkî, Mehdî bi mêranî dest hilaniye û di zindanê de bûye nimûnê têkoşina li dijî polîtîka hov a tirkan.

Berî neha bi du mehan, Mehdî di mehkemê de da xuyakirin ku ewê xwe bi zimanê kurdî biparêze û lewra jî daxwaza 'tercimanekî' dîke.

Mehdî Zana sala 1975'ê zewicîye û keç û kurek heye.

Ji General Kenan Evren re,
Serokê Konseya Ewlekarî a Millî
Ankara/Turkey

Paris, 29.10.1980

Berêz serok

Ez dixwazim, bala we bikşînim ser serokê beledîya Dîyarbekirê, Mehdî Zana. Agahdariyên di derheqê vê meselê de bi şik in. Tê gotin ku Mehdî Zana berî sê heftîyan li Stenbolê hatiye girtin û muameleyek xirab li wî tê kirin.

Berêz Serok,
Rica min ji we ew e ku hûn siyaneta mafên insanî bigrin û Mehdî Zana bidin berdan.

Li gel rêz û hurmet.
François Mitterand

PARTEI SOZIALISTE
Le Premier Secrétaire

PRÉSIDENT DU CONSEIL NATIONAL DE SÉCURITÉ
TIRKI
Ankara
TURQUIE

Paris le 29 octobre 1980

Honorable le Président,

Je me permets de m'adresser à vous pour attirer votre attention sur Monsieur MEHDİ ZANA, Maire de DİYARBAKİR.

Des informations très importantes au sujet de son arrestation et de son traitement ont été reçues depuis de quinze derniers jours.

Je vous demande, Monsieur le Président, de vouloir bien faire des efforts considérables de l'homme et de faire libérer MEHDİ ZANA.

Je vous prie de croire, Monsieur le Président, en l'assurance de ma haute considération.

François MITTERRAND

Hevalê Berêz K.Nezan

Mr. Willy Brandt, ji bo agahdariyên di derheqê serokê beledîya Dîyarbek-irê, Mehdî Zana de pir spasî we dîke.

Mr. Willy Brandt wê di çarçewa îmkanên xwe de bi gelşa Mehdî Zana eleqadar bibe.

Li gel silavên jî dil û can.
Hans Eberhard Dingel.

Sozialdemokratische
Partei
Deutschlands



Monsieur
Kendal Nezan
Institut Kurde de Paris
104, rue Lafayette
F-75010 PARIS

Der Parteivorstand (Ein- und Zweitsprache)
Sekretariat International
Obernussstraße 1 Telefon 0228: 5321
Postfach 2280 Durchwahl 532 211
5300 Bonn 1 Telegramm-Adresse
Sozialde Bonn
Telefon 0228: 3006

Cher Monsieur Nezan,

Monsieur Willy Brandt m'a prié de vous remercier beaucoup de votre information concernant le sort de Monsieur Mehdî Zana, maire de Diyarbakir.

Monsieur Brandt s'engage aussi à l'avenir et dans le cadre de ses possibilités pour Monsieur Zana.

Veuillez agréer, cher Monsieur Nezan, l'assurance de mes salutations les meilleures.

H.E. Dingel

Hans-Eberhard Dingel
Bundesrat Bonn
Telefon 0228: 1011
Telefax 0228: 1011-1012
Telegraphen-Adresse
Telefon 0228: 3006

Xwişka Mehdi Zana:

“Ez bi birayê xwe îftixar dikim!,,

Xwendevanên delal, li ser Mehdi Zana me bi xuşka wî Nedretê re sohbetek kir. Li jêrê em vê sohbetê pêşkêşî we dikin.



Nedret Bilici

Berbang: Gelo piştî 1980'yî ku Mehdi Zana hat girtin şûn de têkiliyên we pêre heye?

Nedret: Çi a me çi a jina wî be, têkiliyên me hertim pêre heye.

B: Hukumatê ji bo seredanê, ji malbata wî re tu manî derdixist?

N: Tim manî derdixistin, lê dîsa jî em diçûn seredana wî. Mesela gava ku em diçûn wê derê ji bo ku em wî nebînin çî ji destê wan bihata dikirin. Rojekê ez û diya xwe û birayê xwe em çûn ber hebsê, polisêka jin li wêderê bû ku wê jinikê du meh berê li gel hin polisên avêtibûn ser mala me. Îcar wê jinika polis nexwest em têkevin hundir. Derman jî bi min re hebû, çimkî birê min nexweş bû. Lê jinikê nedixwest em têkevin hundir û vegeyîya ser diya min û got: «Tu diya Mehdi Zana yî?» diya min got: «Erê», jinikê got: «Ma' dê te ji lawê te nagere, tu ji ber van kirinên wî fedî nakî?» Diya min got: «Na, ez bi lawê xwe îftixar dikim». Jinika polis fetilî ser birayê min û got: «Tu jî birayê wî yê mezin î ha, baş e tu çî difikirî?». Min jî birê xwe re got: deng nekin, vana wisa dikin ku manayekê derxin da ku em nikarin Mehdi bibînin.

Pirê caran jî ki ji me biçûya jê re digotin, bisekinin em bankinê, bîstek şûn de dihatin û digotin: «Mehdi Zana naxwaze we bibîne!». Bi vî awayî dixwestin ku em wisa bawer bikin daku birayê me naxwaze me bibîne û bi vî yekê jî dixwestin morala me xera bikin.

B: Baş e, ji bo diya wî û jina wî ji nuha hîna tu manî derdixin?

N: Belê pir. Mesela pirê caran şêş mehan carê yan dikaribûn bidîtana ya na. Mesela gelek caran bi êskereyî digotin di îşkencê de ye, di tecrîtê de ye.

Mesela gelek caran min jê re cil dibir, lê ne digirtin hundir. Ji bo ku diya min aciz nebe û li ber nekeve, min digot: «Min cil dane wî». Wexta min cilên wî dibir, polis û eskeran henekê xwe bi min dikirin û digotin: «Hela li xanim efendî binêrin, ji birê xwe re cil

anîye!» Carna jî Mehdi ji min re digot bila jina min û diya min neyên seredana min. Ji ber ku li ber çavê wî jî jina wî û diya wî re çêran didan, gotinê nebaş digotin. Ji ber wê jî ji min re digot tenê tu were seredana min.

B: Piştî ku hat girtin we qet poşmanîyek an bêhêviyek di gotinên wî de, di ruyê wî de dît?

N: Na, tu carî me ew tişt ferq nekir.

B: Mesela çî digot?

N: Digot: «merak nekin, tiştên wisa her tim dibê, hun li xwe binêrin» Nesîhetên welê li me dikir da ku morala me bilind be.

Mesela carê ez çûm ziyaretîya wî birîndar bû. Şêş meh bû ku min ew nedîtibû, çimkî nişanî me nedidan. Li ber hebsê em şêş kes ketin hundir. Tegmenek (zabit) hat, got: «Berî serîdanê ezê bi were biaxifim» û şêş hebsiyên ku birîndar û îşkence ditîne nişanî me da û dîsa got: «Yek, ên ku bi kurdi xeber bidin, emê wan jî têxin vî halî, ya du-duya yeko yeko ewê ji we bipirsin: Hûn dixwazin kê bibînin? hûnê jî navê kes ku hûn dixwazin bibînin bibêjin, li gor wê hunê wan bibînin.»

Em ketin kabînan, ez ketim kabîneke ronî ji bo ku bikaribim birayê xwe baştir bibînim. Gazî kirin, min jî bi tirki got «Dixwazim Mehdi Zana bibînim». Ji esker re gotin «wê bigrin vî alî». Min girtin û xistin kabîneyeke tarî, paşê navê min û navê hin kesên din û navê malbata Abdurrahman ÇEÇEN xwendin û gotin «vana bigrin oda xususî». Min fam kir ku tişteke heye. Ji xwe Abdurrahman Çeçen jî wê rojê kuştibûn û ew kuştî anîn nişanî dê û bavê wî dan. Hê jî li ber çavê min e, serî, poz, çav û dev nemabû. Qîrînî bi dê û bavê wî ket, ew qêrîn û hawara wan hîn jî di guhê min de ye.

Min dît yekî din jî anîn, yekî zeif, ser çavê wî bi xwîn, guhê wî xwîn, guhekî wî pembo tede bû. Min ew nas nekir. Min jî esker re got «We xeletî kirîye ez dixwazim Mehdi Zana bibînim.» Min

dît birê min fetilî got «Biqîre ez nabihîzim» wê wextê min fam kir ku ew e. Birê min mêze kir ku ez pir bi heyecan im, got «Xwe aciz meke, ewê derbas be, di nîzik de ezê bikaribim bimeşim, lê here abûqatan bibîne», wê çaxê eskeran bi tîfingan li newqa wî xistin.

Min jî birê xwe got: «Em hertim tîn, lê esker ji me re dibêjin, Mehdi Zana naxwaze we bibîne». Wî got «Aciz mebe, tişt nabe. Tu here ameliyat be, yanî gesta wî digot derkeve derveyî wêlê. Ji ber ku ketibû şubhê ku ezê werim girtin.

Piştî seredanê min xwest herim îdarê li gel berpirsiyarê hebsê biaxifim û rewşa birê xwe ji wan re bibêjim. Li wêderê eskerekî Yozgatî ji min re got «qet neçe bilaheqê, birayê te ev 15 roj e ku di nava qanala gû û mîzê de bû, hîn nu derxistin û tu feyda wê tuneye ku tu biçî îdarê. Êdî min mêze kir nabe, ez yek ser çûm ba abûqat. Min her tişt jî abûqat re got. Heta min hinekî jî heqaret lê kir ji ber ku bi awayekî baş xwedî li hebsiyên dervediketin.

B: Siheta wî di hebsê de çawa bû. An jî tu nexweşî lê peyde bûn?

N: Piyekî wî seqet bû, piştî wî seqet bû, jî xwe guhê wî yê rastê teqandibûn. Çonga wî şikandibûn, mudetekê çavê wî jî nedidit, ji ber ku di îşkencê de li çavê wî jî xistibûn, lê çavê wî nuha baş bû.

B: Berî ku Mehdi Zana bibe serokê Beledîya Diyarbekrê û piştî ku bû, guhertinek yan jî mezinantîyek pêre çêbû?

N: Na, bileks bêtir mutewazî bû. Mesela mala wî her wekî berê bû, perdeyên wî tunebûn, qoltixê wî kevn bûn, sê kes li ser rûniştana binî diket, wî jî êvaran tamîr dikir. Şeva ku avêtin ser mala wî, Bînbaşî heyret mabû, digot «Ma mala wî ev e?»

Carna diya min jê re digot, «Ji xwe re mala xwe raxe, li hember xelkê şerme» wî jî digot, «Ma mala min e, ez li mala xwe çawa û li ser çî rûdinim bila mêhvan jî welê rûnin».

Ji xwe hurmeta me ya mezin a jî wî re di vî derê de bû ku ew her welat û miletê xwe difikirî û ji bo şexsê xwe tu tişteke ne dikir. Mesela jî jina xwe re digot, çî daxwaziyên te hebin heta ku ji destê min were ezê bi çih binim, lê divê tu vîya jî zanibî ku ez dikarim werim girtin, birevim, têkevim hebsê û divê tu xwe tu carî aciz nekî û tu negrî.

B: Danûstendina wî bi heval û hogirên der dora wî re çawa bû?

N: Vê yekê ya pêşî divê meriv ji hevalên wî û kesên pê re mayî bipirşê. Lê bi qasî ku dizanim gelek baş bû. Însanekî henekçî, dilbiçûk bû. Her tim dixwest promleman bi awayekî nermî û bi henek hal bike.

B: Xuşka Mehdi Zana bûyîn çî hîsî dide te?

N: Gurûr dide min, pê îftixar dikim.

B: Ji ber çî?

N: Çimkî însanekî ku her tiştê xwe jî bo welat û milletê xwe dike û tu carî jî tawîz nade.

B: Heşt sal derbas bû, çî jî bo Mehdi Zana, çî jî ji bo hebsiyên din, ew kesên ku li derveyî hebsê anjî li derveyê welêt in; -çî rêxistin, partî û kes bin- li xwedî derketina hebsiyên de kêmasiyên wan hebûn?

N: Belê, carê têkilîya rêxistinên me û hebsiyên tunebû û li gor min wezîfa xwe jî bi başî nekirin, alikariya ekonomîk nekirin. Ji alî propagandayê de jî kêmasiyê wan pirin. Tabî ne tenê jî bo Mehdi Zana ez dibêjim, jî bo hemû hebsiyên.

B: Bi a te, jî bo Mehdi Zana û hebsiyên din divê mirov çî bike?

N: Ji bo min, Mehdi Zana jî ber ku birayê min e ez naxwazim tiştêkî bibêjim, lê bi tevayî jî bo hemû hebsiyên divê alikariya ekonomîk were kirin.

Mesela di Newroza 88'an a Federasyonê de jî bo hebsiyên alikarî hat be-revkirin û hebsiyên bi xwe jî ev bihîstibûn. Çimkî Mehdi Zana jî jina xwe re gotibû «Me bihîstîye ku ewê alikariya me bikin, xeberekê bişîne wan bila zû alikariya me bikin, çimkî hebsî nû jî grewê derketine, tu tiştêkî kesî tune ye û jî alî moralê de jî bo me baş e. Bila wê alikariyê zû bişinin». Min telefonî Federasyonê kir, min mesele jî wan re got, lê pişt re tu bersîvek derneket. Nizanîm êdî alikarî sandin an na!

Tiştêkî din, propaganda pir muhîm e. Divê ku meriv jî hemû organizasyonên insani re rewşa hebsiyên bibêje.

B: Mehdi Zana wek şexs jî alî kurdî-tî û pêşverûtîyê de tesîr li ser we kir?

N: Bê guman tesîra wî gelek li ser me çê bû.

B: Gelo heta nuha tu ceza dane wî?

N: Belê 24 sal danê û gelek mehke-mên wî jî hîn berde-wam in.

B: Em gelek spas dikin jî bo vê sohbetê

N: Spas

“Em dixwazin, di mehkeman de xwe bi zimanê kurdî biparêzin,,

Berxwedana li girtîxana Dîyarbekirê û serhildana têkoşerên kurd, qonaxê-ke sext û dijwar birî; Abdullah Uzun û çend hevalên wî, Mehdi Zana, Şexmûs Cibran jî heyetên mehkemê re dîyar kirin ku êdî di mehkeman de wê xwe bi kurdî biparêzin.

Di 2'yê meha pûşberê de, li salona mehkemê Mehdi Zana rabû ser xwe û bi zimanê kurdî dest bi parastina xwe kir. Muhafizên mehkemê nehiştin Mehdi peyva xwe bi dawî bîne û bi xurtî ew jî salona mehkemî derxistin. Mehkemê jî biryar da ku bêyî hazîrbûna Mehdi Zana mehkema wî bajon. Ebûqatên Mehdi Zana ev biryar protesto kirin û jî salona mehkemê derketin.

Abdullah Uzun:

“Em ji Kurdistanê ne. Emê nikaribin bi organên Komara Tirkîyê re li hev bikin. Hûn, ên ku di organên dadgerîyê de cî digrin, di bin emir de ne. Bi tenê bi nav dadgehên serbixwe ne. Dadgehên ku rêbaz û dadmendîya burjuwa bi kar tînin.,,

Foto û nivîs: Kurdistan Press



Şexmûs Cibran:

“Armanca têkoşîna me ne cudakirin, perçekirin yan jî ji ortê rakirina Tirkîyê ye, armanca me rizgarkirina welatê me, Kurdistanana mustemleke û bi serxistina şerê netewî û civakî ye.,,

Foto û nivîs: Armanca



Rojîyên Mirinê

S. Rêving

Eve heşt sal in, li girtîxanên Dîyarbekirê û yên bajarên din ên li Kurdistanê, grewên birçibûnê û rojîyên mirinê bê bir rû didin. Ji 1980'ê û vir de pitir jî 50 girtîyan di berxwedanan de canê xwe dan, bi sedan jî birîndar bûn. Ji sîyaseta rêveberîya girtîxanan û meqamên resmî û jî hijmara şehidan jî xuya dike ku berxwedana gulana 1988'ê ne a dawî ye. We dîyar e ku têkoşîna jî bo standin û parastina mafan, wê hîn bikêşe û belkî wê bibe sedemê çend qurbanên din.

Lê dema mirov li berxwedanên jî 1980'ê vir de dinêre, dibîne ku; li hember rewşa ne xweş a partî û rêxistinên siyasî yên kurd û bêdengîya demdemî a li welêt, berxwedana girtîyên kurd ne bi tenê bûye armanca standina hinek mafan, belkî rolekî pir meztir listîye û heya derecekê bûye merkezê dengê nerazîbûna gelê kurd û serekaniya hişyarbûna netewî li Kurdistanê Tirkîyê. Bi gotîneke din, girtîyên kurd di nav çar dîwaran de ne bi tenê wazîfa girtîyên welatperwer bi cî anîne, lê heta cîyekî bi karê partî û rêxistên siyasî ên kurd jî rabûne.

Ya din, di berxwedanên sibat-nîsan-gulana 88'an de daxwazên girtîyan çarçewa kevin û teng dişkêne, êdî di dema seredanan de mafê axaftina zimanê kurdî û di mehkeman de xwe bi kurdî parastin jî di kevin nav listên daxwaza. Ev gaveke pir mezin e, nîşana pêşketin û serketina têkoşinê ye.

Herweha berxwedan jî bo hemû partî û rêxistinên kurd, tev welatperweran xwendengeheke pîrî zanîn û tecrûbe ye. Endam û tagirên piraniya partî û rêxistinên kurdan, di girtîxanan de bêyî ku cidahiya bîr û bawerîya an dîtinên teng bikin asteng, jî bo armancên pişkdar gihîştin hev, dengê xwe bi hev re bilind kirin. Ev yekîtiya jî dil û samimî di praktîkê de ber girtî û fêkî da. Dîsan yekîtiya wan bû sedemê wê yekê ku kes û mirovên girtîyan jî bigihên hev, problem bibe problemeke giştî, ya tev kurdan.

Tevî ku mirov nikare bizane ka partî û rêxistinên kurdan wekî ku pêwîst, karin destê alikariyê dirêjî girtîyan bikin an na, belê geşxa xwedî lê derketinê zelaltir bû. U diyar bû ku bêyî vir de wir de divê tev partî û rêxistin, giş welatperwer çawa be bila bibe, bi çî rê be bila bibe, destê alikariyê bi awayekî aktîftir bigihînin girtîxanan.

Li Ser TEVGER'ê Dîtinên Hin Kurdan

Wekî tê zanîn 8 rêxistinên Kurd hatine ba hev û bi navê TEVGER'ê yekîtiyek çêkirine. Daxwaza me hemûyan ew e ku ev yekîtiya heta dawiyê bimeşe û her ku diçe berfirehtir bibe. Li ser vê yekê me ji hin Kurdên ku li Swêdê dimînin dîtinên wan ên -çi pozîtîf çi negatîf- li ser TEVGER'ê pirsî, li jêrê em dîtinên wan pêşkêşî xwendevanan dikin.



YAQÛB (Karkir, 27 salî, serbixwe):

-Yekîti tişteki baş e, bi taybetî iro ku bi her awayî ihtiyaciya me kurdan pê heye.

Çêkirina yekîtiyekê gava pêşî ye, lê pêşdebirin û serkevtina wê bi xebatê ye. 8 hêzên kurd hatine ba hev, bo me kurdan muhîm e.

Her weha ji bo kesên serbixwe jî fersendek e, divê em jî li gel rêxistinên xwe dest bidin hev. Divê em nebêjin "çi ji me re, hela em binêrin wê çawa be". Na divê meriv têkeve navê û bixebite û çi ji destê meriva bê divê meriv bike. Gava ku meriv çi ji dest were bike, Tevger jî wê xurtir bibe û ew alternatîfa ku di serê me hemûyan de heye jî wê çê bibe.

KEMAL (Xwendevan, 26 salî):

-Rêxistinên ku hatine ba hevdu, ji ber tepkîya milletê hatine ba hev, yanê tişteki ku bi zora milletê çêbûye. Bi a min du an sê hereketên ku hevûdu baştir nasdikin bihatana ba hev baştir bû. Ji bo di pratîkê de kar dê baştir bimeşîya û wê 'emirzêdetir ba. Wê hîn baştir realistir ba û bêtir wê bawerî pê bihata.

Ev rêxistinên ku hatine ba hev hevûdu baş nasnakî û wek ruhîyet jî ji hev dûr in, bi amin wê jiyana wê pir najo û ger sibe ro ev yekîti jî belav bibe bawerîya milletê wê zêf bikeve.

Berî vê, sê rêxistinên ku ew jî nuha di nav vê Tevger'ê de ne, hatin ba hev xwestin yekîtiyekê çêkin lê nebû, nuha jî bi nişka ve 8 rêxistinên me hatine ba hev, çawa dibe?

ZINAR (Karkir, 38 salî, dilsozekî PPKK):

-Bê guman yekîtiya kurdan baş û pêwîst e. Em dizanin milletê bê rêxistin kole ye. Ji bo ku Kurd jî zincîra koletiyê bişkinin divê li dijî dijmin qaweta xwe bikin yek. Loma jî ez vê hevkarîyê (Tevger'ê) pir muhîm dibînim. Digel ku çêbûna Tevger'ê gaveke muhîm e, lê ji wê jî muhîmtir xebat e. Divê, hêzên ku di nav Tevger'ê de ne, bi hemû qaweta xwe û bi dilpakî heta wekî ku ji rêxistina xwe re dixebite û jê jî bêtir bixebite. Em dizanin, ancax bi fedakarîyên mezin meriv digihîje armanca mezin. Divê hêzên me di pratîka xwe de vê yekê nişan bidin. Bira ne rêxistinek biçûk be a min be, bira mezin û firehtir be lê a me hemû kurdan be.

A.KARAMUS:

-Bê guman ev cara pêşîn e ku li Kurdistanê Tirkîyê cephayak wisa hate îlankirin..... Xebata jî bo vê yekîtiyê ji demeke dûr û dirêj de ye ku dihat kirin....

Tevger, tevî ku hemû rêxistinên kurdî tê de cih negirtine jî, lê ji alî programa xwe ve bawerîyekê dide mirova ku rêxistinên din jî wê bikaribin tê de cih bigrin..... Pêwîst e ku em xwedî li Tevgerê derkevin da ku xurtir û bi hêztir bibe, û bikaribe pêşengîya têkoşîna ji bo serxwebûna Kurdistanê bike.

DELAL (xwendevan, 27 salî):

-Yekîtiya kurda her tim baş e. Lê ne li derveyî welat. Ma çima naçin li hundurê welêt yekîtiyekê çênakin....Gelek rêxistin

hene ku li derveyî vê Tevger'ê mane û hin rêxistin jî hene ku cara pêşîn e ez navê wan dibihîzim ew jî di nav Tevger'ê de ne... Her çiqasî bawer nakim lê disa jî dixwazim bi serkevin.

HESEN (karkir, 32 salî):

-Ê min, ez di vî warî de gelek negatîf im, ji ber tecrubên ku me hemûyan dîtîye. Carê li welêt yekîtiyek (UDG) çêkirin bi ser neket, li Ewrûpayê 5 rêxistin hatin ba hev xwestin bi navê Hevkarîyê yekîtiyekê çêkin bi ser neketin, hin rêxistinên ku nêzî hev bûn wan jî xwestin rêxistinên xwe bikin yek - ku hinekan kirin jî- lê ew jî bi ser neketin. Kesên serbixwe xwestin xwe nêzî hev bikin da ku ew jî di nav xwe de yekîtiyekê çêkin, ew jî bi ser neketin. Bi a min ev Tevger a ku nuha pêk hatiye qedera wê jî ewê her wekî yên berê be.

Neku hêviya min şikestîye, lê ji tecrubên têkoşîna me ev yeka xuyaye, eynî tiştî jî bo Kurdistanê Iraqê jî ez dikarim bibêjim.

R.POLAT:

-Ne hewce ye ku ez behsa giringî û başbûna yekîtiyan bikim, yekîti an cephe her tim jî bo serketinê, di têkoşîna milletekî de aleteke esasî ye. Ji bo ku ev alet rola xwe bilize, bi cih bîne, ew tiştên ku daye ber xwe, ew û realîta problemên civakê divê li hev bînin, esas sirra serketinê di wê de ye. Wek dixwazekî PPKK'yê min riya serketina vî milletî her tim di yekîtiyêke fireh de

dîtîye. Bi min me'na firehtîyê ev e: divê menfe'eta sinif û tebeqeyên ku li dijî dagirkerî û mêtîngêhkarîyê sekinîne jî di programa siyasî, ekonomîk û ya sosyal a Yekîti an Cephê de bi awayekî vekirî û eşkere cih bigre.

Bê yekîtiyê em nikarin meselên xwe çareser bikin, mesele pir in. Rewşa ku tirkan li welatê me çêkiriye, li aliyekî problema perçebûyîna Kurdistanê gelek bar xistiye ser milê me kurdan. Û rêxistonek tenê bi serê xwe nikare ji bin vî barî rabe. Lê yekîtiyêke wekî Tevger'ê ger bi rastî bixebite dikare xwe bide ber vî barî.

Tevger dikare potansiyela ku îro li welêt heye li dora xwe bicivîne û dengê xwe bigihîne hereketa demokrasî ya Tirkîyê ç ya dunyê. Li aliyekî din jî dikare bibe pirek ji bo piştgirî û lihevneziqbûna tevgera li hemû perçên Kurdistanê.

Divê em nebêjin Tevger çi dike, ka çi kir? Pêşî divê em ji xwe bipirsîn ka em jî bo Tevger'ê çi dikin. Piştî wê mirov dê di jîyanê de bibîne da programa ku Tevger'ê daye ber xwe çiqas bi ser ketîye. Lê ji bo herkesî nuha hêvî û fersendek baş çêbûye ku bikaribin zanîn û mehetên xwe bi riya vê Tevger'ê ji bo azadiya milletê xwe bi kar bînin. Divê ji bo rizgarîya Kurdistanê em mil bidin milê hev.

★

DÎYARÎ JI BO BERBANG'Ê

Şox û şepal û şeng e, ter û ciwan e Berbang
Namûs û nav û deng e, nam û nişan e Berbang
Gula nû xunçe taze pişkiftî ku l' şikêra
Serbest û serfiraz e, rewşa kurdan e Berbang
Istêrk û roj û hiv e, ronahiya welat e
Bi Kurmançî dipeyive, Soranî zane Berbang
Dev bi ken û şîrîn e, heftsaliya delalî
Qeşeng û nazenîn e, benga dilan e Berbang
Çavê belek ku kil da li zozanê Swêdê
Baqê gulî li mil da, geşt û seyran e Berbang
Dengê welat e xweş tê ku j' welatê Awrûpa
Çik û şewate geşt tê ah û fixan e Berbang
Dengê Memo û Zînê, Siyamed û Xecê ye
Ê Hawar û Ê Jîn'ê, Ê Kurdistan e Berbang
Dengê kewa Berbanga ku tê ji der zînara
Dengê zengil û zanga, banga sibana e Berbang

Dengê Merwan û Bazî ku j' Amîd û Farqînê
Dengê Mihemmed Qazî ku j' Çarçîran e Berbang
Dengê serdarê Mukrî, Seyid Rîza û Şêx Se'îd
Dengê Dêrsim û Agrî, Gelyê Zilan e Berbang
Dengê xortê şorişvan tê, zengilê azadî
Dengê Berzenc û Berzan, Hacî 'Imran e Berbang
Dengê "Bijî her bijî Kurdistanê min"
Dengê te û Ê me jî, Ê we hemyan e Berbang
Dengê Kardox û Madî, şêr û pilingê aza
Dengê kurê Şeddadî, kurê Merwan e Berbang

Seydayê Kurdistanî

(*Seydayê Kurdistanî ev hebasta ji bo heft salîya Berbangê nivîsiye, em gelek sipasî wî dikin.* - Berbang)

Nivîskar: Anton Çêxov
Werger : N. Kiriv

DÊLIKA BUHA

Ji emekdarên kevin yê leşkerî, mulazim Dûbov û Knaps rûniştibûn, vedixwarin.

Dûbov, dêlika xwe Mîlka nîşanî Knaps dida û digot:

- Ev kûçikekî şit, kûçikekî delal e! Bala xwe bide rûçikê wî! Rûçikê wî tenê bi dinê ye! Ku ew rastî merivê xwe were, ew ê tenê ji bo vî rûçikî du sed rûbleyan bide. Ma tu bawer nakî? Wê çaxê tu qet ji tişteki fahm nakî!

Ez tê digihêm, lê..

- Lê ew zagar e, xalis û muxlis zagarekî îngiliz e! Wusa ştiyeke wî heye ku... lê tew bêhngirtin û dîtina wî... Ho Xwedêyo, wusa bêhngirtineke wî heye ku... Ma tu dizanî, dema Mîlka hûn cewrik bû, min çiqas pere ji bo wî da? Tam sed rûble! Kûçikekî şit e! Mîlkayê keleş! Mîlkayê bêsinç! Ca were vir! Kûçikê min î delal!

Dûbov, Mîlka ban cem xwe kir, navbera her du guhên wê ramîsa. Hêsir bi çavên wî ket:

- Ez ê te nedim kesî; kûçikê min î delal... Keleş gidî keleş! Mîlka, tu ji min hez dikî, ne wusa? Ma tu hez dikî? Dûbov ji nişka ve qîrîya. De rabe ser xwe, derkeve der! Bi lingên xwe yê qirêj te pêl pîrîrkên min kir. Belê Knaps, ew hûn cewrik bû, min ji bo wî sed û pence rûble dabûn. Qey hêjayîyeke wî hebû. Mixabin, ji bo nêçirê wextê min tune ye! Kûçikê min î reben ji betalî perîşan dibe, şarezayîya wî winda dibe, diçe... Ji xwe ez jî ji ber vê yekê difiroşim... Ca were tu viya bikire, Knaps! Hûn ê li darê dinê jê razî bimînin! Ku perê te hindik e, ez ê ji we re nîvî daxînim! Bi penceyan bibin û min talan bikin!

Knaps keserek veda û got:

- Na, birako! Ku Mîlkaya we nêr bûya, a wê çaxê dibû ku min bikirîya, lê...

Mulazim bi ecêbmayî got:

- Ma Mîlka ne nêr e? Knaps, berxo çî bi te hat? Mîlka ne nêr e... Hah, hah hah! Ca bêje, li gor te Mîlka çî ye? Ango dêlik e? Hah, ha, hah! Bi rastî mala te ava! Hîn nizane kûçikan û dêlikan ji hev derxe!

Knaps xeyidî:

- Hûn min wekî kor an zarokekî dihesibînin. Lê qey Mîlka dêlik e!

Wusa dixuye ku, hindik maye hûn ji min re jî bibêjin, jin e. Ax Knaps, Knaps! Oqaso te dibistana fenî jî qedandîye! Na ezbenî. Ev xurû kûçikekî nêr e... Ji kûçikekî nêr î ku te divê, deh ta jê çêtir e...lê mixabin... hûn dibêjin ev ne nêr e. Hah, hah, hah!

-Bibûre, Mîxaîl İvanoviç, lê hûn, min dikin dewsa ehmeqa. Bi rastî ez pê êşiyam!

- Ne hewce ye ezbenî, ne hûn û ne kirîna we be! Nekirin... Hûn ji qisan fahm nakin... Pir ne maye hûn ê naha bibêjin ev ne boç e, ling e. Ne hewce ye ezbenî... Mîn xwest, ku ez ji we re çêyiyekî bikim... Hêy! Vexremeyev, konyakê bîne!

Vexremeyevê emirber hinek din jî konyak anî. Her du hevala car din kasikên xwe tijî konyak kirin û noqî ramanên

kûr bûn. Bi qasî niv saetekê bêdeng man. Mulazim bi xemgînî li şûşê nêhirî û bêdengî birî:

- Ma ev dêlik be, wê çî bibe?... Tişteki seyr e! Tew ev ji bo we baştir e.! Wê bizê! Cewrikek jî ne kêmi bîst rûbleyan e. Kî be jî, wê bi dilxwazî wan cewrikana bikire. Ez ténagihêm ku hûn çima ewqas ji kuçikên nêr hez dikin! Dêlik hezar cara çêtir in. Ew him sadiktir in, him jî pirtir tén ecibandin. Lê ji ber ku hûn ewqas ji dêlika ditirsin, wê çaxê bi bîst û pence rûbleyan bistînin!

- Na heyran... Ez kapîkekî jî nadim. Ya yekem kûçik ji min re ne pêwîst e, ya duwem perê min tune.

- We çima berê negot? We berê bigota! Mîlka, de rabe ser xwe jî vir bicahnime!

Emirber hêkên qelandî anî, her du hevala dest bi xwarinê kirin, bêdeng miqîlk paqij kirin. Mulazim lèvên xwe paqij kirin û got:

- Cenabê we zilamekî qenc û binamûs e, Knaps! Malavayo, welle dilê min razî nabe, ku ez we wusa destvala bi rê kim. Hûn dizanin çî? Werin, hûn kûçikê bêpere bibin!

Knaps keserek veda:

- Destbirako, got. Ez ê wê bi kuderê de bibim? Kî dê li cem min guh bidîyê?

Ne hewce ye, ne hewce ye. Şeytan bi were be! Ku hûn naxwazin ne hewce ye. Lê hûn bi kû de? Danişin!

Knaps rabû ser piya, kepê xwe girt. Bi bawîşk got:

- Êdî wexta çuyinê hat, bi xatirê we.

- Hinekî xwe ragirin, ez ê we bi rê kim!

Dûbov û Knaps xwe tev kirin û derketin kuçê. Nezî sed gavî bêyî ku bipeyivin, meşîyan. Mulazim:

- Ka tu çî dibêjî, gelo ez vê kuçikê bidim kê? Got û domand. Ma qet nasekî we nîne? We dît ku dêlikeke baş e, sow e, lê ji min re ne pêwîst e.

-Bi xwedê dosto, nizanîm ku... li vê derê wê çawa nasên min hebin?

Her du heval, heta ku hatin mala Knaps, qet peyvek jî ne kirin. Lê, dema Knaps destê mulazim givaşt û deriyê hewşê vekir, Dûbov kuxuya û bi dudilî jê pirsî:

-Hûn çî dibên, gelo postfiroşên li van deran kûçikan nagirin?

-Dibe ku bigirin, lê ez nikarim tişteki bibêjim!

- Sibê ez ê wê bi Vexremeyev re bişînim... Qeda Xwedê lê keve, bila wê bigurin! Dêlika kesî! Afrîda xirab! Bi qirêj-kirina odeyan têr nabe, tew do jî çûye hemû goştê di kîlerê de xwarîye û qedandîye. Di axa reş ketê! Qet nebe dêlikeke sow bûya, lê ka... Mîna xilteke kûçikên tol û berazan e! Şeva we xweş!

Knaps:

- Bi xatirê we, got.

Deriyê hewşê hate girtin û mulazim bi tenê ma.

AGIRÊ EVÎNA DILÊ MIN

1
Evîna min
delala min,
agirê dilê min
Kurdîstana min,
di dilê min de gul î
gula sor
gula sor
nişana evînê,
gula sor
agirê dilan e.

Wek;
ya li ser gora Sîyamed
û Xecê,
ya li ser gora

Mem û Zînê
daxwaz dikim
ji evindaran
ji teyran,
teyrê sîmir û baz bim,
per û baskên xwe vekim
bifirim,
li Cizîra Botan,
li ser gora Mem û Zînê
daynim,

Tasek av ji kaniya dîlan,
ya evîn û evindariyê vexwim
eger têr nebim,
careke din bifirim,
li çiyayê Sîpan
li ser gora Xecê
û Sîyamed
daynim.

Tasek ava evindariyê ji
ji kaniya dilê wan vexwim,
pê serxoş bim,
bi evîna dilê xwe
kêfxweş bim.

2
Careke din bifirim
li deşta kela Milazgîrê
li ser gora dê û bavê xwe
daynim.

Sipasî ji bo ked û êşa wan
bikim,
û bêjm;
we ez mêjandim
di hêlekanê de
bi lorî û sitran
hejandim

şîrê xwe li min helal kin
duh lawê we bûm
îro yê welat im,
hesreta dilê xwe û we
rakim,
ez bi evîna xwe re ha kîm,
xatir ji we dixwazim
xatirê dawiyê,
çûyin heye
dibe ku hatin tunebe!
Careke din bifirim
li çiyayê Agrî daynim,
silav li şehîdên Agrî bikim,
Ala rengin
ji nû ve
li Agrî biçikînim
bi ezamet,
xof û sawa Agrî
ji nû ve
xwe ser dijmin da bihejînim,
di zozanê Agrî da
konê Birê Hêsikê
û Îhsan Nûrî Paşa
ji nû ve
li ser bîst û çar sitûna vekim
pêşmergan tê de bi cih kim
û neferek ji wan bim

ji nû ve
xwe di şaxên geliyê Zîlan de
berdim.

3
Piştî çil hezar şehîdên xwe,
ji nû ve
çemê geliyê Zîlan
bi xûna xwe şêlû bikim
ji nû ve
gul û sosinên Araratê
bi xûna xwe avdim
ji nû ve

ala azadiyê bilind kim,
pêl bi pêl
bi ser dijmin de
bihejînim.
Careke din serî hildim,
bi mêrxasî;
li Diyarbekir wek Şêx Seîd,
li Silêmanî, Şêx Mehmûd û
Berzanî,

li Agrî Îhsan Nûrî
Li Dêrsim Seyid Rîza
li Mehabad Qazî Mihemed
ji nû ve
pêtên agirê
rizgarî û azadiyê,

li Silêmanî
li Mehabad
li Agrî
û li Dêrsimê geş kim
û belakim
agirê evîna dilê xwe
bi dost û hevrêyan re
parve kîm.

'Elî Zerdeşt

Min Tu Xeyal Kir

-Ji bo hevalên di heps û zîndanên da-

Min tu xeyal kir
Di her hilma cixare da
Di dengê bayê da
Di meşê da...

Min tu xeyal kir
Di tariya şevê da
Di dema şefeqê da
Di weşîna pelê da.

Min tu xeyal kir
Çavên te yên bi dizî dinêrin
Kennê te yî delal
Û çiyân...

Min tu xeyal kir
Demek bi hisreta te dişewitîm
gava ku diçûm îdamê
Ji bo te...
Ey sorgula min
Temara min a dilî.

Mustafa Îbrahîm

1987 -Diyarbekir.

Xwendevanên delal;

Ji Rojen Barnas du name gihiştin destê redaksiyonê.

Em her du naman jî li jêr pêşkêşî we dikin.

Birêz Keya Îzol

Serekê Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

Di jimara 6/88 ê Berbangê di rûpela 24'an de bi îmza Bavê NAZÊ bi sernivîsa «HEGER SERÊ WAN TÊ BIÇÛYA» nivîsarek derket. Hêvîdar im, we ew xwendiyê.

Ku jî kerema xwe re careke dinê jî hun bala xwe bidin vê nivîsarê û lê hûr bibin, dê bibînin ku di bendên sê û çaran de jî heqaretkirin û birîndarkirina şexsiyeta huqûqî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û hin şexsiyetên arizî (Reşo Zîlan, Memo Yetkîn, RojenBarnas, Mehmed Uzun) pê ve, tiştêk di nivîsarê de tu nîne.

Dîsa di jimara 4/88'ê Berbangê di rûpela 9'a de, jî bilî hin şexsiyetên dîtir, dîsa Enstîtuya Kurdî wek hedefa pê tinazkirinê hatibû hilbijartinê.

Xwediyên îmzayên herdû nivîsaran jî gava jî dervayê redaksiyon û komîteyên karbidestên Federasyonê bûna, dê meriv bi awakî dîtir li bûyerê binihêrta, an jî di weşandina wan de sersariya endamên redaksiyonê bidîta û ewqas. Lê gava ku xwediyên herdû îmzayan jî endam û berpirsiyarên redaksiyona Berbangê bin (Mahmûd Lewendî û Bavê Nazê), bivê-nevê meriv dikeve hin gumanan: «Gelo ev siyaseta Federasyonê ye?»

Çi endamên komîteyên karbidest, çi endamên redaksiyona Berbangê û çi mirovên dîtir gava ku rexneyên wan ên di maneya rexneya berayî de li ser Enstîtuya Kurdî û li ser kirinên şexsan hebin, ewê helbet rexneyên xwe binivîsin û biweşînin. Ev mafê herkesî yê tebiî ye. Yên di ko-

varên henek û qeşmerî de bixwazin qeşmeriya xwe bi hin kes û dezgehnan bikin, kes nîne ku destê wan bigire. Lewra kesê ku wan ciddî bibînin dê tune bin. Lê gava ku ev di organa Federasyonêke ciddî û di çerçewa têkiliyên dezgeh û damezranên kurdî de bêteref bê kirinê û berpirsiyarên wê bergeh lê negirin, dibe ku hin nexweşî û tamsarî jê çêbin, ew bêterefî û ciddiyeta wê bikevin talûkê.

Armanca hebûna Federasyonê jî alîkî ve gihandin û nêzî hev kirina kurdan e, di navbera wan de têkiliyên xweş danîn e. Ne ku jî bo tatmînkirina xwezîyên demdemî yê hin kesan xwe û organa xwe bike wasitayê jî xwe çixandina hin kesan. Di herdû hejmarên li jorê binavkirî de, şexsên ku navên wan di nivîsarên herdû endamên redaksiyonê de derbas dibin, bi hindikî bi qasî Bavê Nazê û Mahmûd Lewendî jî çanda gelê kurd re xizmet kirine û li gora xwe hê jî dikin.

Ji kerema xwe re li serê baş bifikirin û rê medîna ku di Berbangê de bi şexsiyetên kesan û damezranan bê leyistîtin, an ew bêne reşkirin û brîndarkirin. Ev bi kêrî tu kesî nayê. Lê rexneyên kî hebin bila biferrin.

Hêvîdar im ku hûn li ser vê nameya min bi ciddiyet rawestin, bigihînin komîta karger û redaksiyona Berbangê.

Bi vê nameyê ve jî bona bersîvdana Bavê Nazê nameyêke eşkere dişînim ku hêvîdar im di jimara pêşî ya Berbangê de bê weşandin.

Digel selavên dostaniyê
Rojen Barnas

Bavê Nazê,

Li ser nivîsara te ya di rûpela 24'a jimara 6/88 a Berbangê, vê nameya eşkere ji cenabê te re dinivîsim.

Ji te rica min ew e ku nivîsara li jorê binavkirî bîni, deynî ber xwe û baş bixwîni. Li bendên "Paşgotin" û "Gotina Dawîn" têr hûr bibî: Da bizanî ez behsa çi dikim.

Tu dibêjî ku "Dibêjin Enstîtuya Kurdî li Parîsê îsal hozanên xwe yê zimanê kurdî li Belçîkayê civand".

Yek jê "hozanên" Enstîtuyê tune ne. "Hozan" ku li gor Sadiq Behaeddîn Şîr e û "hozanvan" şair e; li gora cenabê te zana ye û li gora hinekên dinê jî tembûrvan e. Bi eslê xwe "ozan" e û jî turkiya dema şamanîzmê tê, ji ber ku di kurdî de gotin bi "o" dest pê nakin "h" hatîye serî û biye "hozan". Ji ber vê "hozan"ên Enstîtuyê tune ne. Yê duduyan: Yê ku beşdarî civînê bûne, hin jê ne endamê Enstîtuyê ne. Enstîtu, herkesê ku di warê kurmançî (kurmançiya jorîn) de bi zman, nivîsandinê û rojnamevanîyê bilî ne, vedixwîne van civînan xwe.

NAMEYA EŞKERE

Ji van kesan yê bixwazin -çi endam bin çi ne endam bin- beşdar dibin û bûne jî.

Tu dibêjî: "Înstîtut navekî mezin li gundekî xerab e".

Bavê Nazê ! Gelo tu zanî çi dibêjî an na? Ku bi zanî vê gotinê dibêjî, li rûpela nîvekê ya Berbangê binihêre û jî xwe şerm bike.

Tu dibêjî: "Înstîtuya Kurd li Parîsê xwe têxista şûna çarê rûsan û bigota ya damezrandina zmanekî yan jî serê we... Vêga berî ku Kurd bipeyivin, diviyabû devê xwe xwar bikirana". Qet ber mekeve, Enstîtu ewê devê te xwar neke. Yê bi têvelîya "tîrêj" û "tîr"ê, "qazî" û "qedî"yê, "cediyet" û "ciddiyet"ê, "bendî" û "li benda", "peyv damezrandin" û "peyv çêkirin/afirandin"ê, "redaksiyon" û "redaksiyon"ê, "mejî" û "mêjî", mêbûna "organê" nizanibe û nexwaze bizanibe jî, devê wî yê xwar êdî hew xwar dibe. Bala xwe baş bidê gotinên ku te bi kar anîne;

yên pêşî, yê di nav neynokê de ne.

Bavê Nazê, li ser pîrsa te di 8.5.1988 roja mihricana helbestan min behsa civîna Brukselê kiribû. Min behsa xebata xwe û yê hevalan yek bi yek kir. Te gelek kêfa xwe anî, di xweyanî de gelek dilgeş bûy. Te xebata yek bi yekê beşdarên civînê û ya Enstîtuyê gelek hêja dît û 'eciband. Di pey wê de, piştî pêncî û sê rojan di weşandina vê nivîsara te de tu manekê nabînim.

Tu dibêjî:

"Dibêjin çima Rojen Barnas lêkolîna xwe li ser zimanê Cezîrî çê kirîye?"

"Me got: her kes kurê dema xwe ye û li ser heyamê xwe bi zimanê xwe dipeyive".

Min li ser zimanê Cezîrî lêkolîn çênekirîye. Her wekî min ji te re gotibû, min ji Diwana Cezîrî ji gotinên hilbijartî ferhengokek bi qasî 19 rûpelên dakîloyê derxist. Di vê de jî tiştêkî tinaz an qeşmerî pêkirinê nabînim.

Ji gotina te ya "herkes kurê dema xwe ye bi zimanê xwe dipeyive" jî

tênagihîjim ku mebesta te çi ye? Ez kurê tu demî nînim, kurê dêûbavê xwe me. Lê bi kurmancîya berî zemanê xwe jî bi ya zemanê xwe jî xweş û baş dikarim bipeyivim.

Bavê Nazê, ku te Cizîrî û klasîkên kurmancî yê wekî dinê bixwenda, bi hindikî teyê maneyên "ûrêj" û "ûr"ê tevlîhev nekira.

Memo Yetkîn ne li ser mêjî, lê li ser anatomiya serê mirovan listeya termînolojiyê bi fransî, îngilîzî, latînî, swêdî û turkî tevî wêneyan derxistibû ku xebata wî ji aliyê her kesî ve hate teqdîr kirin. Karên beşdarên civinê jî ew bû ku li hember navên bi zimanên dinê navê wan î bi kurmancî -ne ku çêkin- lê bibînin. Belê her çend cenabê te ne li wê derê bû jî, lê dîsa jî ji Agirî, Behdînan, Bidlîsê,

Dêrsimê, Diyarbekrê, Efrînê, Hekarê, Mêrdînê, Mûşê, Ruhayê, Semsûrê û Şikakan kurmancîzan hebûn. Û heryek ji wan jî bi salan li ser warê ziman û edebîyata kurdî xebitîne.

Wekî dinê, her çend neqedandibe jî Memo Yetkîn çend sal tib xwendîye û ji bo derxistina listeya termînolojiya anatomiyê ne hewce ye mîna te doktora kiribe. Ku gazinên te ji mêjîyê wî hene, tu dikarî wî bibî ser operatorên mêjî bi riya transplantasyonê mêjîkî mîna yê xwe bikî serê wî. Baş nivîsara xwe bixwîne, ji gotina te mebesta te ew e.

Vê jî bi bîra te binim, Piyostrê 1. an Peter (Petro) yê mezin çarê pêşîn nîne, çarê çarem ê ji azbata Romanovan e. Berî wî jî ji sala 1462 vê de yanzde çar hatine ser

text. Baş hîn bibe da ku nebêjin ewçend sal li Sovyetê ma, hê jî hîni tarîxa wî welatî nebû.

Bavê Nazê, ji kerema xwe re vîya baş bike hişê xwe: Doza gelê Kurd dozeke neteweyî ye. Di nav neteweyê me de bi milyonan mirov hene. Yê ku ji bo serketina vê dozê dixebitin, ne bi milyonan e lê belkî bi çend hezaran e. Divê ku em sîyaneta herkesê dilxwaz, dilsoz û xebatkarên vê dozê bigirin. Ku rexneyên me yê ciddî hebin, divê em ji bo serfirazî û serketina doza gelê xwe bi awakî çêkirin û avakirinê bêjin û binivîsin. Lê di dema rexneyê de jî divê em rêz û sîyanetgirtinê ji bîr ranekin. Divê em ji zanebûna xwe rexne bigirin, ne ku ji acizbûna xwe bi şexsiyetan bileyizin, wan reş bikin û biêşînin.

Rojen Barnas

PÊWÎSTÎYA ME BI GELEK 'BAVÊ NAZÊ' YAN HEYE

Bavê Nazê di kovara Berbangê de artikilek li ser Newroza 88'an û çend dengbêjên me -bi taybetî li ser Şivan-nivîsîbû. Piştî nivîsa Bavê Nazê, du nivîs li dijî nivîsa Bavê Nazê hatin belavkirin. Yek bi tirkî di rojnama Kurdistan Press de, yek jî di kovara Berbangê de hate belavkirin ku nêzîkî zaravê soranî bû. Pêşî ez gelekî sipasî Bavê Nazê dikim ku nuqteki wilo gelekî girîng anî munaqesê. Lê ez sipasî wan her du nivîskarên jî dikim ku li ser vê meselê baweriyên xwe gotin. Lê ez welê bawerîm ku informasyon û zanebûna her du hevalên nivîskar li ser mesela "kultûr" û "rola şexsa di jiyana kultûrî û siyasî de" hebekî kême.

Min hîç Bavê Nazê nedîye û ez wî nas jî nakim. Lê min çend artikilên wî di rojnama Armanç û di Berbangê de xwendine. Bavê Nazê rexnegîreki me yî zana û hêja ye. Ew; nuqten-ku di civaka me de sebaba paşketina me ye tîne ziman û kesên ku terefderê wan nuqta bin, dibin hedefa pênûsa Bavê Nazê. Çend mînak: "...kesê ku derengê şevê hê jî lempê wan pêketî bin li Stockholmê kurd in. Ew rûdînin û ji cixare vexwarin û qisekirinê pêde çî dikin...(ji rojnama Armanç)". "Kurdên Eropa ku qirêj û xerakirina li dûv xwe hiştin, cezayê nizanîm çend hezar kron...(ji kovara Berbang)". Ev tişt û gotin hem tûj in, lê rast in. Bavê Nazê

vî tiştî rast û rê dibêje, ne bi qurban û heyran. Dirûtî û qelpezenî di nivîsên Bavê Nazê de tune ne. Ew zane çî dibêje, yê ku wî fêhmî dikin bawerîm ne hindik in.

Civaka me bi sed salan di bin nîre kolonyalizmê de maye. Helbet vê wexta dirêj û pis gelek berhemên pis jî di civaka me de xistiye jiyana me. Hemî şiklên paşverûtîyê (kariyerîzm, egoîzm, zihniyeta feodalî, xwe mezin/bilind dîtin ûhw..) di nav me de cih girtiye. Eger ev tişt neyên munaqesekirin, ew di jiyana de her

berdewam dibin, hingî jî navê wî tiştî "konservatîzm" e. Yanî mirov her dixwaze weke berê berdewam ke. Lê eger mirov liberalîtiyê qebûl ke divê jî hemû munaqeseyan re vekirî be û alîkarîya nûjenîya vê jiyana bike. Bila "tabû" nemînin, di civakê de pêwîstiya me bi gelek Bavê Nazêyan heye, jî ber ku artikilên wî "refleks"ê bi kesna re, grûban re çêdike û hereketê tê holê û ev tişt dibê sebaba zanebûn û pêşveçûna insanên me.

Ez baş tê digihê, wexta ku Bavê Nazê behsa Şivan Perwer dike, ne jî bo dijminatîya wî ye. Ji bo ku Şivan hîn kêmasiyên xwe bizanibe û fêr bibe û helbet vê jî tenê dost dikin. Ez jî wekî Bavê Nazê, Şivan Perwer di çend nuqtan de kême dibînim, helbet kêmasî

û ze'îfiya me gişan heye, lê yê ku xwe xwedî mesûl dîzanîna divê guh bidin der û dora xwe jî. Der û dora Şivan jî digel guhdarên wî helbet senetkarên kurd in jî, mesela; hunermend, nivîskar, dengbêj, siyasetvan ûhw. Sen'etkarî di vê sedsala bîstan de weha rehet nîne. Em dibînin ku hunermend û nivîskarên xelkê di unîversîteyan de lîteratur, tarîx, muzîk dixwinin, pedagojî, sosyolojî û sosyo-ekonomî fêr dibînin. Ew dibînin abonê gelek rojname û kovarên kultûrî û siyasî. Ew semîner, konferans, mitîng û şevên gelêrî taqîb dikin. Ji ber ku eger mirov weha neke, wê wextê mirov li paş civakê dimîne û nema dikare bi "demê" re bi wan teorî û metodên berê têkoşin bide.

Şivan li ser qaseta xwe nivîsiye "heçî kopî neke mala wî ne ava", gelo me'na vê gotinê çî ye?

Ya duduya, di gelek şevan de -ku ez bi xwe jî bûme şahid- Şivan bi îngilîzî an almanî dipeyive û ez welê bawerîm ku di şevên me kurdan de Alman û Îngilîz jî nînin û zimanê ku herî baş em jê fêhmî dikin jî kurdî ye, gelo çima Şivan wilo dike?

Fîkret Kasrî

ÇEND GOTINÊN PÊWÎST

Weke xwendevanên me jî xwendin, heval Rojen Barnas li ser hin nivîsarên ku di Berbangê de çap bûne, du name -Yek ji bo serokê Federasyonê û yek ji bo Bavê Nazê- hinartine. Em pir sipasîya wî dikin. Belê, em dixwazin bi kurtî jî be çend gotinan li ser dîtinên wî bibêjin.

Berbang organa rêxistineke demokratîk e. Çi endamên redaksiyona Berbangê, çi ji derveyî redaksiyonê bin, mafê giş kurdan heye ku dîtinên xwe, baweriyên xwe di Berbangê de belav bikin. Bawerîya me ev e û di vî warî de em rê li ber kesî nagrin.

Heval Rojen Barnas li ser nivîsên Bavê Nazê û Mehmûd Lewendî dibêje: *"Xwediyên îmzeyên her du nivîsaran jî dervayê redaksiyon an komîtên karbidest ên Federasyonê bûna, meriv wê di weşandina wan de sersarîya endamên redaksiyonê bidîta û ew qas."* Heta niha di çapkirina nivîsaran de xemariya redaksiyonê nebûye. Li gor karîna û îmkaniyetan me rê daye û em dixwazin rê bidin baweriyên cûr bi cûr. Tu ne endamê redaksiyona Berbangê yî û me her du namên te jî çap kirin. Ma eve sersarî ye?

Redaksiyona Berbangê, di karê xwe de serbixwe ye û bi awayekî demokratîk kar dike. Endamên redaksiyonê biryara çapkirin an çapnekirina nivîsaran didin. Ne ku Komîta Karger wek komîsyoneke sansûrê li ser serê me rawestîyaye an jî xwestîye "bergeh" li me bigre. Belê, pir normal e jî, wekî tev kurdan, endamên Komîta Karger jî li ser nivîsaran dîtin û pêşniyarên xwe bibêjin û eger nêrinên wan di cîyê xwe de bin, meriv bi a wan bike.

Em nizanin mebesta te ji *"kovarên henek û qeşmerî"* yê çî ye. Eger tu ji bo "Mîrkut", "Îsot" an rûpelê "Sîrkut"ê dibêjî, em wek te nafikirin. "Îsot" jî "Mîrkut" jî kovarên ciddî ên mîzahê bûn û daxwaza me her ew e ku her du kovar jî car din mecala weşanê bibînin. Her weha me nedîtiye kes kovaran wek "kovarên henekan", "kovarên qeşmerîyan", "kovarên ne qeşmerîyan" bi nav bike. Kovarên edebî, kulturî, sîyasî, lêkolînî... ûhd hene.

Em dibêjin ne pêwîst e mirov li ser nêrîna Federasyonê an redaksiyona Berbangê a di derheqê Enstîtuya Kurdî an her dezgeyeye kurdî de bi dirêjî bipeyive. Ji destpêkê heta îro pêwendiyên Federasyonê û Enstîtuyê pir baş in û weke ku meriv pê dihese, her kes jî dixwaze tev dezgeyên kurdî piştgirîya hev bikin. Bê guman, hemû endamên redaksiyonê jî di wê baweriyê de ne ku Enstîtuya Kurdî li gor şiyana xwe xizmetê ji welat û gelê me re dike. Weke tu jî dizanî gelek çarvan Federasyon û Enstîtuyê alîkarîya hev kirine. Berbangê gelek cara cî daye çalakîyên Enstîtuyê. Belê eve nayê wê me'ne ku çî bi riya mîzahê û çî bi riya çapemeniyên din mafê meriv tune ye ku meriv li ser kêmkasî û şaşîtiyên dezgehan, rêxistin, mirovan bipeyive.

Tevî ku em ne di wê baweriyê de ne ku devê Bavê Nazê "xwar" e. Lê kesên ku bibêjin em kurmancîya berî zemanê xwe û ya zemanê xwe jî baş dizanin, divê bizanibin ku ji Behdînan ta Colemêrg û Botanê kurd ji "mêjî" re dibêjin "mejî". Xuya ye devê Melayê Cizîrî jî %25 xwar bû!? Her weha divê bizanibin ku "ol", "ordek" peyvên kurdî ne û di kurmancîya jêrî de jî gelek peyv bi "o"yê dest pê dikin.

Kesê kurmancî bizanibe, wê bizane ku cumla Rojen Barnas bi kar anîye ne bi kurmancî ye. Rojen Barnas dibêje: *"Di nav neteweyê me de bi milyonan mirov hene."* Em dizanin ku li welatan bi milyonan mirov hene, ne ku di nav neteweyan de. Dîsan Rojen Barnas dibêje: *"Lê rexneyên kî hebin bila bifermin."* "Kî" û "kê" pronavên pirsîyarê ne. "Kî" jî pronavên bingehîn tê hesibandin û ji bo pronavên lêkerên întansîtîv bi kar tê: "Kî çû?", "Kî mir?" "Kê" jî pronavên tewandî tê hesibandin û di demên buhurî yê lêkerên transîtîv bi kar tê: "Kê xwar?", "Kê bir?" Di vî warî de lêkera "hebûn" îstîsnayek e. Ji bo hemû wextên vê lêkerê pronavên tewandî bi kar tên: "Min heye, min dê hebe, min hebû". Lewra divê meriv ji bo hemû demên "hebûn"ê pronava pirsê "kê" bi kar bîne. Anku cumla Rojen Barnas diviyabû bi awayê jêrîn ba: *"Lê rexneyên kê hebin, bila kerem bikin."*

Redaksiyon

HELBESTEK JI 'EVDIRREHÎM REHMÎYÊ HEKKARÎ

Mahmûd Lewendî

Ev helbesta jêrîn a 'Evdirrehîm Rehmî (Abdurrahim Zapsu) ji rojnama Jîn, hejmar 36 (21.6.1920) hatiye girtin ku wî ev helbesta xwe li ser berpîrsiyarê pêşî yê kovar û rojnama Jîn'ê; **Hemzeyê Muksî** (Mukuslu Hamza) nivîsiye. Li gor rojnama Jîn'ê (no: 36) Hemzeyê Muksî wê demê li Kurdistanê li bajarê Mêrdînê tê girtin û wî diavêjin zîndanê. Pişt re xeberek belav dibe ku Hemzeyê Muksî di zîndanê de hatiye kuştin. Li ser vê yekê Evdirrehîm Rehmî jî - ku yek ji nivîskarên rojname ye - vê helbestê li ser wî dinivîse. Lê di dû re derdikeve ku Hemzeyê Muksî nemirîye. Ji xwe Hemzeyê Muksî heta salên 1930'yî jî jiyaye.

Li jêrê digel vê helbestê em kilîşeya rojnama Jîn'ê jî çap dikin .



ŞEHÎDÊ KURDISTAN

Hemze...!
Rabe ji xewa xwe **Hemze** rabe
Xûna te neçû heba tu şa be
Riya vî welatî da şehîd î
Lewra tu mucahidek se'îd î
Rabe here pêş liqayê Yezdan
Bi xûna diçitin ji wan birinan
Sor ke kefenê bi rengê alal
Mezlumî bike tu 'erz-î ehwal
Bêje; tu 'elîm î bê mîsal î
Bêje; tu semî'î layezal î
Zilma li me hatî tu dizanî
Lewra tu qedîr û "kun fekan" ¹ î
Bajêr û kelat û xan-man çûn
Sotin li me kepire, hem neman gund²
Nine me ji xeyr te xudanek
Bê şikirî te naçitin medanek
Haşa tu ne zalim î ne kukar(?)
Em cahil û bê xeber û gunehkar
Derdê vê cehaletê dikêşin
Dostê di me wek şerîr, dijmin
Sadiq me nedî birayê mumîn
Dijmin wehe ye bikit muhebbet

Heta neçitin ji me cehalet
Em mu'terifi betalî ne
Ma xeyrê te em 'ebîd kî ne?
Elbet ligel î'tiraf nuqsan
Disa ji te dê bixwazin îhsan
Madem xuliqandin em te millet
Lazim ji me jî hebit hukümet
Daxwaz dikin ji te tebayî
Lewra tu "tu'iz û men teşa"³ yî
Tu hez bike dê bebit se'adet
Dê hilbitin şimalê millet⁴
Xûn dê bikelit bibit hemiyet
Heta ku nemînitin cehalet
Giliye te belê, xudayê mutleq
Dê bête cih ey şehîd-î naheq
Tu berze kirin bi cebrê tehfir
Me'sûmî di te nemaye teqsîr
Îro min dixwazit bigihime Jîn'ê
Taqet min nema ji ber girînê
Mewla te bi rehmeta xwe şa kit
Xûnxar û sedeyan ji me cuda kit.

17 Gulan 1337/1920
Ji Mala Hekkarîyan
'Ebdurrehîm Rehmî

¹ "kun fekan" bi 'erebî ye, me'na wê: " bibe bû" ye

² di 'eslê helbestê de ji bo li hev hatina weznê "gun" hatibû nivîsîn, me kir "gund".

³ Di me'na "ger tu bixwazî tu rutbê bilind dik, tu însanan bilind dikî, mezin dikî" de ye.

⁴ şimalê millet: çepê millet, me'na wê ya di vê derê de ew e ku di mêzina xêr û gunehan de gava ku aliyê çepê bilind be, tê wê me'nê ku gunehê mirovan hindik e, xêr zedetir e.



MUSABAQA FOLKLORÊ YA 1988'AN

Di 10.12.1988'an de bi serpereştiya Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, musabaqa folklorê ya 1988'an wê li dar bikeve. Wekî tê zanîn cara pêşîn ev musabaqa folklorê par (1987) pêk hatibû ku heşt komên folklorê beşdarî wê bûbûn.

Îsal jî komên ku dixwazin beşdarî musabeqê bibin, divê bi kêmanî heya 01.12.1988'an navên xwe li Federasyonê bidin nivîsandin. Her komeke folklorê ku dixwaze tevî musabeqê bibe, divê van malûmatên li jêr di muracaeta xwe de binivîse:

- 1-Navê komê
- 2-Hejmara endamên komê (çend law û çend keç)
- 3-Kom, dîlanên kîjan deverê dilîze
- 4-Navên dîlanên ku kom pêşkêş dike
- 5-Navê berpîrsê/berpîrsa komê, adres û reqema telefona wî/wê.

Musabaqa îsal jî bi xelat e:

Xelata yekemîn: 5.000 Kronên swêdî
Xelata duwemîn: 3.000 Kronên swêdî
Xelata sêyemîn: 1.000 Kronên swêdî

DEM: 10.12.1988

CÎH: FOLKETHUS-Stockholm



شایي شه هيد

مانگی سووره و
 له ناو به فری شیعره کافما
 ورد هلدی ا
 مه پرسن چنن ؟ نه ... مه پرسن
 شاعیر وه کوو پوره سینلکه ی کزچهر وایه
 هدرچند وهرزی بز «شهم» ی یار نه جریونی و
 تیر نه ویش ناوازیکه و چاو لیک نه نی ا
 مه پرسن چنن ؟
 داستانی پینشمه رگه نه نی
 ری ی سیامند بز لای خدیجی
 به ناو گه روی زور نه ههنگ دا تی نه پیری
 وهرزی عاشق سواری وه کوو
 «فدرخ» و «مهم» م «مامه ریشه» و «ندجو» ی نه وی ا
 رهنگه بالی زور هونراوه
 زور گزوانی ی
 له م زستانه دا هلد وهرین
 رهنگه قوی زور نه رخه وان
 زور شوپه بی
 وه کوو پرچی کچی شارم
 به م کپوه یه دارنرین ...
 رهنگه زور چناری عیشقی هلدچووی
 به رده م وه ک حوجره که ی «نالی»
 هدر به پپوه هلدپروکین ا
 رهنگه مهمکی زور «حده بیه» م
 به م دیواری شه وگاره دا دابکوترین
 رهنگه زور گه ره کی دلم
 مالی چاوم
 ژووری دهر وون و هه ناوم
 کاو لاش ... کاو لاش، تهخت کرین ا
 رهنگه ... رهنگه ... رهنگه
 به دلام نیگای «گله زرده»

مه پرسن چنن ؟
 که دل نه بی به سونسکه و «سلیمانی» به هیلاته ی
 تیر شیعریش ناسمانیکه و پزل پزل وشدی
 سهوز و سووری تیندا نه فری ا
 مه پرسن چنن ؟ که نه م سهره گهرگرتویش
 نه بی به پله هورنکی نزم و نه ویی سدر «نهم» و
 به ده م گینگلی ژانده، گرمه گرم
 بز به ره و خوار دانه باری
 تیر شیعریش سه چاره یکه و قولپه قولپ
 له م بناری چاوانده هلد نه قولی ا
 مه پرسن چنن ؟ گهر خه م نه بی به بروسکه
 گهر نه وینی و نه وشه بیی چاوی نیوه
 نه بی به رنگا و تروسکه
 چرزی نه م زامی شیعرا نه م
 له م به سته له کی سنگه دا
 چنن نه پیشکوی ؟
 دهنگ چنن نه بی به ره شه باو
 شه پزل چنن له گیانما نه نوی ؟
 مه پرسن چنن ؟
 نه ... مه پرسن ا
 نیسته لای من
 هه موو روژی
 له نیوان چاوانی «گژی» و
 گهر دنی «پیره مه گرون» دا
 خوشه ویستیم: کزتره شینکه ی پینشمه رگه یه و
 نامه ی دوا شه هیدی پی یه و
 شه قزینی و دیت و نه چی ...
 مه پرسن چنن ؟
 نیسته لای من
 هه موو شه وی
 خوشه ویستی «سلیمانی»

بیون و هندیکی تریش خرۆکه سپیه‌کانی خوئنیان کم ببو.
بدم پییه ده‌توانین بلینین که هدمویان که‌وتونده‌ته بدر
مدترسی گازی خدرده‌ل.

۶- دوانه‌نجام

۵۴- له‌سهرجهمی لیکۆلینه‌وه‌کافاندا گه‌یشتینه نهم
نه‌نجامانه‌ی لای خواره‌وه:

أ: به‌پینی فه‌حسی پزیشکی و کلینیکی که خۆم له
کۆماری ئیسلامی ئیزان نه‌نجام‌دا، باوه‌رپم هینا که
نه‌خۆشه‌کان که‌وتونده‌ته ژنر کاریه‌گریتی چه‌کی
کیمیایی. زۆریه‌ی نه‌وانه‌ش مده‌نی بوون.

ب: گازی خدرده‌ل ماده‌ی سه‌ره‌کی بوو، به‌لام ماده‌یه‌کی
ژه‌هراوی کیمیایی تریش که تینکه‌لی هه‌وا ده‌بیت،
به‌کارهینرابوو.

ج: به‌پینی نه‌و فه‌حسانه‌ی که له عیراق نه‌نجام دان،
گه‌یشتینه نه‌و باوه‌ره‌ی که هدمویان سه‌ریاز بوون و
که‌وتونده‌ته ژنر کاریه‌گریتی چه‌کی کیمیایی.

د: ماده‌ی کیمیایی به‌کارهینراو گازی خدرده‌ل بوو،
هه‌ندیک نیشانه هه‌بوو بۆ به‌کارهینانی ماده‌یه‌کی
ژه‌هراوی کیمیایی تر که تینکه‌ل به هه‌وا ده‌بیت و له‌گه‌ل
هه‌ناسه‌دا هه‌لده‌مۆری. به‌لام به‌لگه‌ی ته‌واوم له‌م
باره‌یه‌وه چنگ نه‌که‌وت.


ه: له هه‌ردوو لا راده‌ی به‌کارهینانی ماده‌ی کیمیایی و
چۆنیه‌تی به‌کارهینانیان بۆ ده‌رنه‌که‌وت.

و: ئیفا‌ده‌ی نه‌خۆشه‌کان سه‌باره‌ت به فه‌خسکردن له
هه‌ردوو ولات و سه‌باره‌ت به میژووی هه‌رشه‌کان به
شینوه‌یه‌کی گشتی له‌گه‌ل زانیاری و لیکۆلینه‌وه
پزیشکه‌کانی وه‌فده‌که گونجیاو بوون.

«ته‌واو»

* به‌شی یه‌که‌می نهم راپۆرته له ژماره‌ی پینشووی
«به‌ریانگ» دا بلازوکراوه‌ته‌وه.

* نهم راپۆرته له رۆژنامه‌ی «ایران تایمز» ی ژماره
۹. ۸. ۱۹۸۸/ چاپ کراوه.



ده‌ست پینکردنی هه‌رشه‌که نه‌و سه‌ریازانه له‌ناو سه‌نگه‌ره
شاخاوییه‌کاندا له زوړووی هه‌له‌بچه‌دا دامه‌زرا‌بوون.
کاربه‌ده‌سته عه‌یراقیه‌کان گوتیان که نه‌و سه‌نگه‌رانه
که‌وتونده‌ته بدر نامانجی بیست گولله تۆپی کیمیایی که سئ
فرۆکه له به‌یانی رۆژی ۳۱/مارت به‌سه‌ریاندا رۆژاندوویه‌تی.
زۆریه‌ی نه‌خۆشه‌کان گوێزرا‌بوونه‌وه بۆ نه‌خۆشخانه‌ی سه‌ریازی
سلیمانی و له‌ویشه‌وه بۆ نه‌خۆشخانه‌ی سه‌ریازی نه‌له‌رشید.

۵- به‌پینی هه‌مان سه‌رچاوه گازی خدرده‌ل ته‌نیا ماده‌ی
کیمیایی بوو که به‌کارهینراوه. ناوچه‌یه‌کی دوو کیلۆمه‌تر
چوارگۆشه‌ی ئالوده کردبوو. زانیمان که که‌سانیکی شه‌ره‌زا
به‌هۆی سیسته‌می (دراگر) ناگادار بوون له بوونی گازی
خدرده‌ل و ته‌حلیلیان کردبوو.

۵۱- ده‌ولته‌ی عیراق له کاتی خۆی به نه‌ندازه‌ی ته‌واو
چاودیزیان له وه‌فده‌که کرد، که له‌بهر هۆی نه‌منی نه‌یتوانی
به‌روات بۆ ناوچه‌ی هه‌له‌بچه که گوتیان رۆژانی ۳ و
۳۱/مارت/ ۱۹۸۸ له‌وی چه‌کی کیمیایی به‌کارهینراوه.

۵۲- له‌سه‌ر خواستی سه‌کرته‌ری گشتی (ر.ن.ی) له
۸-۱۱/نه‌پریل سه‌رم دا له عیراق، بۆ لیکۆلینه‌وه له
به‌کارهینانی چه‌کی کیمیایی له شه‌ری ئیزان و عه‌یراقد.ا.
لیکۆلینه‌وه‌کان له نه‌خۆشخانه‌ی سه‌ریازی الرشید نه‌نجام
دران. نه‌چووم بۆ نه‌و ناوچانه‌ی که گوایه که‌وتونده‌ته بدر
هه‌رشه‌ی کیمیایی.

۵۳- کورته‌ی بۆچونه‌کانم به‌پینی لیکۆلینه‌وه‌کانی ئیستا
پینشه‌که‌شتان ده‌که‌م، بۆ ناگاداریتان.

ئه‌لف: فه‌حسی ۳۹ نه‌خۆش له نه‌خۆشخانه‌ی سه‌ریازی
نه‌له‌رشیدی به‌غدا، که له ژنر چاودیزه‌ی پزیشکدا بوون،
پیشاندرا که نه‌وان له سووتان و برینداری پله‌ی جیا‌وازدا
بوون، له‌گه‌ل ناره‌حده‌ت بوون به‌ده‌سه‌ت چاوتیشه‌وه و نه‌خۆشی
پینست. هه‌ندیک له نه‌خۆشه‌کان دووچاره‌ی ته‌نگه‌نه‌فه‌سی

نخوش، ۲۷ سرباز و ۱۲ نفره‌گری ده‌گرت‌بهر. له دواى
نه‌وهى ناشکرا بوو که کهوتوبونه بهر ماده‌ی کیمیایی
زیان‌بخش له نخوشخانه‌ی سربازی (الرشید) خه‌وین‌رابوون.
۳۴- فده‌سینکی سهرینی نه‌نجام درا له‌گه‌ل ۷۲ سربازی
بریندار، نه‌مانه له نخوشخانه‌ی الرشید له‌ژیر تیمارکردندا
بوون، ۷ نخوشیان دواى چاوپینکه‌وتنی پسرپوری پزشکی
وه‌فده‌که له نخوشخانه‌که مده‌خه‌س کران.

۳۵- ته‌واوی نه‌وه نخوشانه‌ی که فده‌س کران سربازی پی‌او
بوون. ته‌مه‌نیان نیوان ۲۹-۴۹ سال بوو (ناوه‌ندیتی
ته‌مه‌نیان ۲۸ سال بوو).

۳۶- نه‌وه نخوشانه‌ی که فده‌س کران یان بینان به‌گشتی
۱۱۴ نخوش بوون که راپورت درابوو کهوتوبونه‌ته بهر
هیرشی چه‌کی کیمیایی له رۇژانی ۳- ۳۱/مارت. له‌م
ژماریه نه‌فسه‌رنیک و دوو سرباز پینش گه‌یشتنی وه‌فده‌که
مده‌خه‌س کرابوون. تا رۇژی ۹ و ۱۰ نیسان، تا نه‌وه
کاته‌ی که فده‌س کردنه‌که‌مان نه‌نجام دا له ژماره‌ی ۱۱۴
نخوش که‌سینک نه‌مرد.

۳۷- فده‌س پزشکی که له‌وه راپورته‌دا هاتوه، که به‌هزی
خودی پسرپوری وه‌فده‌که نه‌نجام دراوه، رابووردووی پزشکی
نخوشه‌کان، ناویان و ته‌مه‌نیان و هه‌روه‌ها شوین و کاتی
هیرش و یه‌که‌مین هؤ که بۆته هزی نه‌وه‌ی که نه‌وان باوهر
بکه‌ن کهوتوبونه‌ته بهر هیرشی کیمیایی ... له رینگای
پرسیارکردن له نخوشه‌کان به‌هاوکاری وه‌رگیزنیک وه‌ده‌ست
هینرا.

۳۸- له رابووردووی پزشکی و فده‌سه نه‌نجام دراوه‌کان
چه‌ندین دیارده‌ی تایه‌تی له‌برینداره‌کان کۆکرانه‌وه.

۳۹- فده‌سینکی پزشکی به‌هزی پسرپوری پزشکی
پیشانی‌دا که نزیکه‌ی یان ته‌واوی نخوشه‌کان به‌پله
جۆریه‌جۆره‌کان کهوتوبونه‌ته بهر هیرشی مه‌وادى ژه‌هراوی
کیمیایى و ناره‌حه‌تیبی چاو له هه‌ندیکیاندا زۆر به‌هیز بوو.

۴۰- له ته‌واوی له‌شدا، به‌تایه‌ت ده‌موچاو و بن بال و
ناوران لیری گه‌وه‌ی تاریک و ره‌ش ده‌بینان، له تووندترین
حاله‌تیشدا برینه‌کان وه‌ک سووتوای دووه‌م پله‌بوون. ژیر
پینستی زۆریان کاری تینه‌کرا بوو، هه‌رچه‌ند یه‌کینک له
نخوشه‌کان تووشی تلۆق ده‌رکردن بوو بوو.

۴۱- هه‌ندیک له نخوشه‌کان به‌ده‌ست (برونشیت و
لارانتیت) وه‌ ناره‌حه‌ت بوون. له چه‌ند نخوشیکیشدا
که‌مه‌بونى خۆکه سپیه‌کانی خوین ناشکرا بوو.

۴۲- له شه‌ش باه‌ت پسرپوری پزشکی بۆ دیاریکردنی
رووی نه‌نزیم کالینی پلازمای خوین ده‌ستی کرد به‌فده‌س و
ته‌حلیل کردن، سه‌باره‌ت به‌سی نخوش راده‌ی نه‌نزیم که‌م
بوو، له دوو حاله‌تیشدا فده‌س و ته‌حلیل کرا بۆ زانینی
ریژه‌ی سه‌دی نه‌سیدسیاتیک که نه‌نجامه‌که‌ی نینگه‌تیف بوو.

۴۳- بارو‌دۆخی نخوشه‌کان به‌گشتی له ساده‌وه تا زۆر
خراب بوون.

۴۴- فده‌سی پزشکی که به‌هزی پسرپوری پزشکی
نه‌نجام درا له‌گه‌ل زانیاری زیاتر که دکتوری نخوشخانه‌کان
پنشه‌کشیان کرد، ته‌واوکران. له‌وه زانیارانه و نه‌نجامی
فده‌س و ته‌حلیله‌کان که‌لک وه‌رگیران و پسرپوره‌که‌مان
به‌تایه‌ت زانیاریه‌کانی دکتور (إحسان الشما‌ء) ی به‌که‌لک
زانی.

۴۵- نه‌وه نخوشانه‌ی له ژیر فده‌س و لیکۆلینه‌وه‌دا بوون
گوتیان که نه‌وان له رۇژانی ۳ و ۳۱/مارت به‌ماده‌ی
کیمیایی بریندار کراون. رایانگه‌یاند که کاتیک به‌م شته‌یان
زانیوه که چاویان تووشی خوران و دوا‌ییش له‌شیان تووشی
تلۆق کردن بووه و هه‌ندیکشیان هیزی ناسین و دیتنیان
له‌ده‌ست دابوو. نخوشیک به‌ده‌ست سک چون و
زۆرمیزکردنه‌وه ناره‌حه‌ت بوو بوو.

۴۶- له‌وه لیکۆلینه‌وانه‌ی که نه‌نجام دران ده‌توانین به
شینویه‌کی گشتی بلین که گازی خه‌رده‌ل کاری کردبووه سهر
۱۱۱ نخوش.

۴۷- له‌ده‌ست دانى هؤش و شت له‌بیرچونه‌وه ره‌نگه به‌هزی
کارتیکردنی فیزیکی گه‌لینک ماده‌وه روویدات، به‌لام
نخوشیه‌گرانه‌کانی ژه‌هری کیمیایی له رینگای هه‌ناسه
هه‌لکیشانه‌وه ده‌ینت. زۆری ناو‌له‌چاو هاتن و ناو
هاتنه‌خواره‌وه به لووتدا ده‌توانی له خانه‌ی نیشانه
تایه‌تیبه‌کانی کاریگه‌ریتی گازی خه‌رده‌لدا دابنرین. ته‌واوی
نه‌مانه وا دیارده‌که‌ن که له‌وانه‌یه هه‌ندیک له نخوشه‌کان
ته‌نها کهوتوبونه‌ته ژیر کاریگه‌ریتی گازی خه‌رده‌ل، به‌لکۆ
ماده‌ی کیمیایی به‌راده‌یه‌کی که‌م کاری کردۆته سهر
کۆنه‌ندامی هه‌ناسه هه‌لکیشانیان.

له‌گه‌ل نه‌وه‌شدا ناتوانین بناغه‌ی فده‌س و زانیاریه‌کان له
راپورته‌که‌ماندا بسه‌لینین.

ب- زانیاریه‌گشتییه‌کان

۴۸- نه‌وه نخوشانه‌ی که من فده‌س کردن شایه‌تیان دا که
له رۇژانی ۳ و ۳۱/مارت له ناوچه‌ی هه‌له‌بچه به‌هزی
هیرشی کیمیایی بریندار بوون. به‌پینی قسه‌ی خویان، یان له
رینگای فۆکه‌وه یان به‌نیحتمالینکی که‌متر به‌هزی گولله
تۆپه‌وه که له دووری دوو تا ۵۰ متر ته‌قیوه‌ته‌وه بریندار
بوون. به‌شینویه‌کی گشتی نه‌مانه نه‌یان‌توانیوه ده‌موچاویان
بپاریزن یان ماسکی دۆی گاز به‌کاره‌ینن. له زۆریه‌ی
باره‌کاندا دواى ته‌قینه‌وه که‌لکیان له ماسک وه‌رگرتوه،
به‌لام له هه‌ندیک باری تردا هیچ کام له قوریانییه‌کان به‌رگی
خۆپاراستنیان به‌کارنه‌هیناوه.


۴۹- به‌پینی نه‌وه زانیارانه‌ی که له شاری سلیمانی، به‌هزی
کاربه‌ده‌ستانی عیراق وه‌رگیرا و به‌پینی فده‌س کردن و
قسه‌کردن له‌گه‌ل سربازه‌کان له به‌غدا دیاربوو که کاتی

رؤژانی ۲۸ و ۳۱/مارت سەردانی کۆماری ئیسلامی ئیترانم کردتا سەبارەت بە بەکارهینانی چهکی کیمیایی له جەنگی ئیتران و عێراق بکۆلمەوه.

لینکۆلینەوهکان له بناغەوه له بنکەکانی پزشکی ناوچە ی تاران و باختران (کرماشانی جاران) ئەنجام دران. من سەرم دا له زۆری ئەو ناوچانە کە نەخۆشەکان دەیانگوت تیایدا کەوتوونەتە بەر گازی کیمیایی.

۳۲- کورتە یۆچوونەکانم سەبارەت بەو لینکۆلینەوهیدی کە کراوه بەم شیوەیدی لای خوارەوهیدە.

۱- له ۶۶ بابەت کە له راپۆرتە کەدا هاتوو ۶۲ نەخۆش له ناوسانی بن پیلووی چاو بە پلە ی جۆراوجۆر، له برینداربوونی پیست وەک پلە ی دوو می سووتان، برینەکانی میزەلدان نارهەت بوون و له هەندیک باریشدا نەخۆشەکان تووشی تەنگەنەفەس و کەمبوونی خڕۆکە سپیەکانی خوین بوون.



لەگەڵ بێنیی ئەم جۆرە نەخۆشیانە دەتوانین بە دنیاییەوه بلین نەخۆشەکان کەوتوونەتە بەر گازی خەردەل.

ب- چوار نەخۆشیش کەوتوونەتە بەر جۆرە مادەیدی دژی ئەعصاب.

ج- له ژمارە ی نەخۆشەکان کە چاومان پێیان کەوت و ئەو زانیاریانە ی ئەو پزشکیانە ی کە نەخۆشەکانیان تیمار کردبوو ئەتوانین بگەینە ئەو ئەنجامە ی کە بەکارهینانی گازی کیمیایی له سەلەکانی پێشووتر بەکارهینراوه و ژمارە ی کوژراو و برنارەکان زۆرتر بووه. وادیار بوو کە ئەم چارە ژمارەیدی زۆر له مەدەنی کەوتبوونە بەر هێرشێ گازی کیمیایی.

۵- لینکۆلینەوه له عێراق:

لایەنەکانی پزشکی

۳۳- لینکۆلینەوهکانی پزشکی کە بەهۆی پسپۆری پزشکی ئەنجام درا لەگەڵ فەحسە کلینیکیەکان بە گشتی ۳۹

بەتەوه. من له لینکۆلینەوهکانی خۆم نەمتوانی زانیاری دروست سەبارەت بە بەکارهینانی هیدروسیانیک، وەک مادەیدی کوشندە، بەدەست بەینم.

۲۳- لەوانە یە بتوانین بە شیوەیدی گشتی بگەینە ئەو لینکەنەوهیدی کە له رووی بۆچوونی کلینیکی کە بە هۆی پسپۆری پزشکی فەحس کراون کەوتوونەتە ژێر کارتێکردنی دوو جۆر مادە ی کیمیایی (گازی خەردەل و مادەیدی دژی ئەعصاب).

۲۴- ئەو نەخۆشانە ی کە خۆم فەحسم کردن شایەتیان دا کە له ئەنجامی هێرشێ مەوادێ کیمیایی له هەلەبجە نیوان رؤژانی ۱۶-۱۸/مارت یان له ناوچە جۆریەجۆرەکانی مەریوان، نۆدۆش و سنە له نیوان رؤژانی ۱۷-۲۷/مارت بریندار کراون.

۲۵- هەر ئەو شایەتەنە دەلێن کە ژمارە ی کوژراو و بریندارەکان له نیوان مەدەنیدا زیاتر بوو وەک له سەریازەکان.

۲۶- لەگەڵ ئەو گوندیانە گفتوگۆ کرا کە لەو ناوچانەدا دەژیان کە کەوتبوونە بەر هێرشێ گازی کیمیایی، گوتیان بە فرۆکە گازی کیمیایی دراوه بەسەر ناوچەکانیاندا. بەپێی گوتنی هەندیک له گوندییەکان فرۆکەکان له جۆری میراج بوون و رەنگیان سپی بوو.

۲۷- له گوندەکانی نۆدووش و نەجمال ئەندامانی وەفدە کە ناچاربوون زۆریە ی کاتەکان ماسکی دژی گاز بەکاربهینن.

۲۸- له ناوچە ی نودوش رەوانە ی ناوچەیدی کراين کە لەوی رؤژی ۲۹/مارت چوار بۆمبا تەقیبۆنەوه و زیانیان بە خانووەکان گەیاندبوو، بەلآن کەس بەرنەکەوتبوو، پارچەکانی بۆمباکانیان نیشان داین کە هەندیک نیشانەیان بە زمانی رووسی لەسەر بوو.

۲۹- له ماوه ی راوەستانی کورتدا له کۆماری ئیسلامی ئیتران توورە یی و نیگەرانی خەلک و بەریوەبەرانی کۆماری ئیسلامی سەبارەت بە بەکارهینانی گازی کیمیایی دژی شارەکانیان بۆمان دەرکەوت و نیشانەکانی ئەم توورە یی و نیگەرانییەش له فەرمانەکانی رێبەرەکانی کۆماری ئیسلامی ئیتراندا خۆی دەتواند کە له رؤژنامەکاندا چاپ دەکران سەبارەت بە باشترین رێگا بۆ خۆپاراستن بەرامبەر ئەم جۆرە هێرشانە.

۳۰- وەفدە کە له ماوه ی مانەوهیدا له ئیتران لەلایەن رێبەرانی ئیترانەوه بەتەواوی هاوکاری لەگەڵ دەکرا و پێوستیەکانی دابین دەکرا و له کاتی پێوستدا پارێزگاری لێ دەکرا.

ب- کورتە ی زانیاریە بەدەست هێنراوەکان.

۳۱- بەپێی داوای تاییەتی سکرێتیری (ر.ن.ی) له نیوان

سه‌بار هت به به‌کاره‌ینانی چه‌کی کیمیایی

به‌شی دوهم

وه‌رگیزانی له فارسیه‌وه: جه‌نگر

له‌بیرچوونه‌وه ناره‌ه‌تی کردبوون. ئەم نه‌خۆشانه له‌دوای تیمارکردنیان به‌ئیسپهرین چاک بوونه‌وه، به‌لام دیار بوو که نه‌خۆشه‌کان تووشی لاوازی ماسولکه ببوون. نه‌خۆشینی تریش که کهوتبووه به‌ر گازی خه‌رده‌ل ئەم نه‌خۆشیانه‌ی سه‌روه‌ی لی دیاری دا.

۱۸- پ‌سپۆری پزیشکی، له‌رنگای کادری نه‌خۆشخانه‌کانه‌وه ناگاردارکرا که زۆر نه‌خۆشی تری وه‌ک ئەم نه‌خۆشانه هه‌بوون.

۱۹- له‌م نمونه‌ی که له‌پیشه‌وه خستمانه به‌رچاو، ده‌توانین ب‌لین که ئەم که‌سانه کهوتبوونه به‌ر ماده‌یه‌کی ژه‌هراوی دژی (ئه‌عصاب) ئەندازه‌ی ئەنزیمه‌که دیاری نه‌کرا، چونکه چه‌ندین رۆژ تینپه‌ریبوو به‌سه‌ر برینداربوونیاندا. هه‌رچه‌ند ئەنازه‌ی تینکه‌لکردنی ماده‌ کیمیاییه ژه‌هراویه‌کان له‌ توانادا نه‌بوو، به‌لام ده‌توانین ب‌لین که ره‌نگه له‌ تینکه‌ل کردنی فسفۆری که‌لک وه‌رگیراینت. پ‌نویسته بزاین که نه‌خۆشه‌کانی تینکه‌لی فسفۆری زۆر نزیکن له‌وه نه‌خۆشیانه‌ی که له‌ سه‌روه‌ه باسمان کردن. ئەم جۆره ماده‌یه له‌ جه‌نگی ئیزان و عیراقدا به‌کاره‌ینراوه. وه‌فده‌کانی رینکخراوی نه‌ته‌وه‌یه‌که‌گرتوه‌کان (ر.ن.ی)، به‌تایبه‌ت لیکۆلینه‌وه‌کان که له‌ سالانی ۱۹۸۴ و ۱۹۸۶دا ئەنجام درابوون ئەم جۆره رووداوانه‌ی سه‌لماندبوو.

۲۰- له‌ ساردخانه (مه‌دیخانه) ی نه‌خۆشخانه‌ی له‌ باقی نژاد تهرمی ئافره‌تینک فه‌حس کرا که کهوتبووه به‌ر گازی خه‌رده‌ل.

۲۱- بۆ فه‌حسی پزیشکی که پ‌سپۆری پزیشکی وه‌فده‌که‌مان ئەنجامی دا‌بوو، سوود وه‌رگیرابوو له‌ زانیاری تر له‌ پزیشکه‌کان و نه‌خۆشخانه‌کان و پ‌سپۆره‌کانی نه‌خۆشخانه‌کانی به‌تایبه‌ت پ‌نویسته ئەو زانیاریانه‌ی که له‌ لایه‌ن دکتۆر «فروته‌ن» ی به‌ریه‌به‌ری ئەنجومه‌نی پزیشکی قوربانیه‌یه‌کانی چه‌کی کیمیایی پ‌نشه‌که‌ش کرا ناویریت. که به‌ بوونی نیشانه‌کانی ته‌نگه‌نه‌فه‌سی و سووره‌له‌گه‌رانی پ‌نست له‌ هه‌ندیک له‌ نه‌خۆشه‌کانی هه‌له‌بجه دیاری کردبوو. به‌ تیمارکردن به‌ ئۆکسجین، سویدیومی نیتیرین و نیوسولفات وه‌زعی ئەم نه‌خۆشانه به‌خیزایی چاره‌سه‌رکرا.

۲۲- له‌ کاتی سه‌ردان له‌ نه‌جمال، که‌سینک که به‌ پله‌ی به‌ریه‌به‌ری شاره‌که هاته‌ ناساندن وتی: له‌و به‌روایه‌دام که شاره‌که کهوتۆته به‌ر گازی هیدروسیانیک، پرسپاری لیکرا چۆن وا بیرده‌کاته‌وه، نه‌یتوانی وه‌لامینکی باوه‌رینکراو

۱۵- پ‌سپۆری پزیشکی، به‌پنی ئەو فه‌حسانه‌ی که خۆی کردبووی، به‌گشتی گه‌یشتبووه ئەم ئەنجامانه و کارتینکردنی چه‌کی کیمیایی به‌م شینویه‌ی لای خواره‌وه دیاری کرا.

دوای ماوه‌یه‌ک، به‌پنی گرانی برینه‌کان، کاریگه‌ریتیه‌که له‌ نه‌خۆشینکه‌وه بۆ یه‌کینکی تر جیوازی هه‌بوو. نه‌خۆشی له‌ش خوران، رشانه‌وه، چاوخوران و ئاوهاتن له‌چاو، ناره‌ه‌ت بوون له‌ رووناکی، که نه‌خۆش له‌ تاوا نه‌یده‌توانی هه‌لی ب‌ینی و له‌ ئەنجامدا له‌ ب‌ینین ب‌ی به‌ش ده‌ب‌یت. ئەم شتانه به‌له‌گه‌ بوون. دوایش په‌یدا‌بوونی لیری سوور له‌سه‌ر ئەو جینگایانه‌ی که کهوتبوونه به‌ر چه‌کی کیمیایی و په‌یدا‌بوونی تلۆق که زۆریه‌یان گه‌وره و پر له‌ کیم بوون، دوای چه‌ند رۆژینک برینه‌کان ده‌ته‌قین و برینیک په‌یدا ده‌بوو که له‌ برینی سووتانی پله‌ی دوهم ده‌چوو. له‌ شینکه‌کانی تری پ‌نست وه‌ک ب‌ن‌بال و ناوگه‌ل و له‌سه‌ر کۆنه‌ندامی زاوژی خالی پرره‌نگتر به‌رچاو ده‌که‌وتن. کارتینکردنی ماده‌ی کیمیایی له‌ کۆنه‌ندامی زاوژی ئافره‌تدا له‌هی پیاوان که‌متر بوو. ناوله‌پ و به‌ری پ‌ی و ته‌وه‌سه‌ر کاریان تی نه‌کرا‌بوو، هه‌روه‌ک خۆیان ما‌بوونه‌وه. ئەو که‌سانه‌ش که ماسکی دژی گازیان به‌کاره‌ینابوو، گازه‌ کیمیاییه‌که کاری نه‌کردبووه سه‌ر چاو و بۆری هه‌ناسه‌دانیان، به‌لام ته‌نانه‌ت نه‌وانیش له‌ چاوخورین و ئاوهاتنه‌پیاخواره‌وه‌ی چاو رزگاریان نه‌بووبوو که ره‌نگه هه‌لمی گازی خه‌رده‌ل کاری تی کردین.

ئەو نه‌خۆشانه‌ی که ماسکی دژی گازیان به‌کاره‌ینابوو تووشی ته‌نگه‌ نه‌فه‌سی ببوون و ئەم نه‌خۆشیه‌یه له‌ هه‌موو نه‌خۆشه‌کاندا به‌یه‌ک ئەندازه نه‌بوو. له‌م حاله‌ته‌دا پ‌نویست بوو که ده‌زگای گازی ئۆکسجین به‌کاره‌ینری بۆ چاره‌سه‌رکردنیان.

۱۶- هه‌ندیک له‌ نه‌خۆشه‌کان تووشی نه‌خۆشی که‌مبوونی خه‌زۆکه‌ی سه‌ی خوین ببوون و هه‌ندیکیشیان کارکرا‌بووه سه‌ر ئینسانانی که‌لله‌سه‌ریان.

۱۷- دووه‌مین گروپی نه‌خۆشه‌کان بریتی بوون له‌ چوارکه‌س، دووه‌سه‌یان رۆژی ۱۴/مارت له‌ هه‌له‌بجه و دووه‌سه‌ی تر له‌ رۆژی ۱۸/مارت له‌ مه‌ریوان کهوتبوونه به‌ر گازی کیمیایی، ئەوان تووشی ئاوهاتنه‌ خواره‌وه به‌ لووتدا و لیک کردن و چاوتواکردن بوون.

نه‌خۆشیه‌کان به‌ره‌و توندی ده‌چوون. سک چوون و زۆرمیزکردن و ته‌نگه‌نه‌فه‌سی و له‌ هۆش چوون و شت

بیرنيس پروت رابنس، بریتانیا. سینتیزو ساردوی، کوویا. توم ستاپارد، بریتانیا. رنئی تافیرنیر، جینگری سدرۆکی نیونه توهوی یانهی قهلم. هیلین تورنیر، فرانسه. کاترین واترسن، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. لیندا وولف، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. سعیدی یوسف، عیراق.

مامۆستایانی زانکۆکان:

ساموئل سابینۆ ناکوایفا، زانستگهی پادوفا، ئیتالیا. ریچارد ناداس، زانکۆی تینکساس، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. جلال سادیق ئەلعهزم، زانکۆی دیمهشق، سووریا. هادی ئەلعهلهوی، میژوونووس، عیراق. میشیل بەنکس، خویندگهی ئابوری لهندهن. حهنا باتاتوو، زانکۆی جوزج تاون، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. سیریل بیلشای، زانکۆی بریتانیایی کۆلومبیا، کانادا. م. بەنی شیخ، زانکۆی جهزایر. تیری کاتن، پۆلیتیکینیکی تهمیس، بریتانیا گوستاف شوکی، ئەندامی ئاکادیمی زانستی فەرانسە. کۆلد کۆهین تانوجی، کالیجی فەرانسە. هارثی کاکس، زانکۆی هارفارد، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. فینسنت کراپانزانز، زانکۆی کۆلومبیا، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. ستانلی دیامۆند، خویندگهی نوێی لیکۆلینهوهی کۆمهلهیهتی نیویۆرک، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. لیۆن ئایزنبیرگ، خویندگهی بۆشکی زانکۆی هارفارد، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. دیدار فهووزی، میژوونووس، میسر. رۆدیۆک فلۆد، کالیجی بیرییک، بریتانیا. رنئی گالیسو، زانکۆی پاریس، فەرانسە. بورهان شالیون، سۆسیۆلۆگ، سووریا. میریام کۆهین، هارفارد، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. مههدی حافز، ئیکۆنومیست، سووریا. فرید هالیدهی، خویندگهی ئابوری لهندهن، بریتانیا. دیشید هاملین، کۆلیجی بیرییک، بریتانیا. موحهمد ههری، میژوونووس، جهزایر. هانس-جورج هایتریش، ئەمسا گئی هیزۆد، زانکۆی پاریس، فەرانسە. پاول هیزست، کۆلیجی بیرییک، بریتانیا. مارک هۆفمان، خویندگهی ئابوری لهندهن، بریتانیا. فرانسوا هۆفار، زانکۆی کاتۆلیکی لۆفهن، بیلژیک. دیل هایینس، زانکۆی فیرجینیا، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. ئیدمۆند ژوڤی، زانکۆی سۆربۆن، فەرانسە. ئیدگار لیدیریز، ئەندامی ئەنستیتوی زانکۆی فەرانسە. لیندا مایز، زانکۆی کهمبرج، بریتانیا. پییر مینتیژ، لیکۆلهروه، فەرانسە. ئالیکساندر مینکۆفسکی، پروفیسۆری فهخری له زانکۆی رنیه دیکات، فەرانسە. ماکسیم مۆلینۆ، زانکۆی ئیکستیز، بریتانیا. تیشۆدۆر مۆنۆد، ئەندامی ئەنستیتوی فەرانسە. لووسیا مۆرا، زانکۆی کاستیلا لامانچا، ئیسپانیا. کیشیرۆ ناکاهارا، زانکۆی تۆکیۆ، ژاپۆن، پروفیسۆر ئەفدردی نیکۆلا، پروفیسۆر میشیل ئۆریۆل. فەرەتسا، پروفیسۆر. راجر ئوون، پروفیسۆر، بریتانیا. ناسر پاکدامه، زانکۆی سۆربۆن پاریس، فەرانسە. ئانتۆنیۆ پاپیسکا، زانکۆی پادوفا، ئیتالیا. ژرار پییر شارل، سۆسیۆلۆگ، هاییتی. ماکسیم رۆدۆن، خویندگهی پراتیکی خویندنی بەرز، فەرانسە. خوولیز رۆدریگیز پیرتولاس، زانکۆی ئوتۆنۆمی مادرید، ئیسپانیا. لۆران شوارتز، مەتیماتیک زان، فەرانسە. لێنۆن شوارتزنیبیرگ، پپۆری نهخۆشی شیر پهنجه له زانکۆی پزیشکی پاریس، فەرانسە. ویلیام. ئا. شاک، زانکۆی کالیفۆرنیا، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. مایکل. م. جی. سیشر، زانکۆی هۆستن، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. ن. سمیث، خویندگهی حوقوقی هارفارد، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. پاول پاتریک ستیریت، بەرپهوه بهری ئەنستیتوی پشوه چوونی جیهانی، ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا. ئۆژینۆ سوارین گالبۆن، زانکۆی مهدرید، ئیسپانیا. ل. ق. تۆماس، زانکۆی سۆربۆن، فەرانسە. ژیرمین تیلیز، سۆسیۆلۆگ. ئاله ن تۆرین، سۆسیۆلۆگ، فەرانسە. ئارماندۆ ئووری، پروفیسۆر، شیلی. پیتر ئووریتینگ، زانکۆی ئیسینکس، بریتانیا. کارمین فیرگار، زانکۆی مهدرید، ئیسپانیا. پییر فیدال ناک، میژوونووس، فەرانسە. پۆل فیهی، سۆسیۆلۆگ، ئەندامی نیوهندی نه توهایهتی لیکۆلینهوهی زانستی، فەرانسە. ریچارد فوکس، زانکۆی کینت، بریتانیا. کازوو یاماوچی، زانکۆی تۆکیۆ، ژاپۆن. سامی زویهیده، کۆلیجی بیرییک، بریتانیا.

هه ندی گه سی تر:

ژان فرانکۆ بهرتولینی، سدرۆکی حکومهتی ناوچهی تۆسکان، ئیتالیا. بارۆنیس تینسا پلاکستۆن. ئالیزۆتو پراسکا، سدرۆکی شاری فلۆرانس، ئیتالیا. بیزنارد دۆرین، سهفیری فەرانسە. ژاک گابۆ، ههشی ئیقنیزۆ، فەرانسە. لووسیانۆ گیزۆنی، سدرۆکی ناوچهی ئییلیا-رۆمانا، ئیتالیا. دوکتور سیلفیۆس ماناگۆ، سدرۆکی ناوچهی خواری تیرۆل، سدرۆکی SVP، ئیتالیا. ئینس. پاتین، پاریزگاری لاهه، هۆلەند. ئالفۆنسینا رینالدى، شاردارى مۆدینا، ئیتالیا. ئانتوان سانگینیتی، ئەمیرال، فەرانسە. فیلیپ تینکسیر، حاکم، فەرانسە. دوکتور لووی زینگیرلی، سدرۆکی ناوچهی ترینتین، خواری تیرۆل، ئیتالیا.

* سەناتۆره کانی ولاته یه کگرتوه کانی ئەمریکا: له کاتێکدا داوا له خوکوومهتی تورکیا دهکەین بۆ پاراستن و ئازادی کولتور و زمانی کوردی هەر بۆ هه مان مه بهست داوا له عیراق و ئیران و سووریاش دهکەین.

تیبینی

دێری ٤٧ له شیعره که بهم جۆره یه:

شه مالکا شهقی د رنکا مه دا

له دێری دووهمی نووسینه کهی سه بارهت به ژبانی شاعیر وشه (ئیرا) هه له یه و راسته کهی (ئیرۆ) به. له لاپه ره ١٢٩ دا دێری یه کهم بهم جۆره ی لئ دیت:

... مرۆف دکارینت چه ندين سالال هوزانه کا کوردا
راوه ستینت. ههروه ها وشه نقیستن له دێری ١٦
ستوونی دووهمی لاپه ره ١٢٩ ده بیت به بنقیسیان.

له ژماره ی پینشووی بهربانگدا له کاتی چاپکردنی شیعری (حه تاف دی هه لیت) ی فه روخ فه روخاد که له وه رگیزانی کاک صادق بوو، چه ند هه له یه ک هه یه که لیزه دا راستیان ده که یه وه و داوای لیبوردن له خوینه ران و کاک صادق ده که یه ن.

بهربانگ

سۆيىد: لاھيا ئىنكسشېر، ھانس يوزان فرانك، ئولوف يوهانسون، سەرۋكى پارتى سىنتىر. ئۆسكار لىندكفيست، بەرت سقىنسۇن، يوزان سقىنسۇن، ئىرك تامنوكسا، لارش ڧەرنر، سەرۋكى پارتى چەپى كۆمۇنىستەكان، بىنگت ڧىستىرەرى، سەرۋكى پارتى گەل.

ولائتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا- سەناتۆرەكان*

براك ئادامس، كىنت كۆنراد، وىندل ڧورد، ئالبىرت گۆر، باب گراھام، دانىيىل.ك. ئىنىۋى، كارل لىڧىن، جان مىلچەر، كلېرېن پىنل، سەرۋكى كۆمىتە ئىنجومەنى دەرەۋى سەناتۆر. وىليام پراكسماير، دونالد.و. رېگل.

ولائتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا- نوئىنەرانى كۆنگرە «پەرلەمان»

جان كۆنېرس، جورج كراكىت، جەمىس.جى.ى. جىڧردس، تۆم لانتۆس. سەرۋكى كۆمىتە مافى مرۆڧ لە قەڧقاس» جۇ مۆكلى، كۆنستاس.ئا. مۇرىلا، جەمىس ئۆپرستار، نانسى ڧىلۆس، تىد وايس.

پىنكخراۋەكان

نوورى غەبدولپەرھاق، سەرۋكى پىنكخراۋە دۆستايەتى ئەڧرۇ-ئاسىيەۋى. عامىر بىنتوۋى، سىرتىرى گىشتى كۆمەلەى ئىنتەرناسىۋنالى ۋولى دىمۆكرات، پىز بىرسى. سەرۋكى پىنكخراۋە مافى نوۋى مرۆڧ- ڧەرانسە. مىشىل بلووم، پارىزەر، سەرۋكى كۆمىتە تايبەتى. O.N.G. لە كۆپى نەتەۋە يەكگرتوۋەكان. پىبىر برانا سىرتىرى ناسىۋنالى كۆمەلەى مافى مرۆڧ لە ناو پارتى سۆسىالىست، ڧەرانسە. جاسن. دەپلىو. كلەى. بىنگەى ھەرمانى ڧەرھەنگى، ھارڧارد، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ھارلىم دىسىر، سەرۋكى S.O.S. راسىزم، ڧەرانسە. ڧاڧائىل دۆب، سىرتىرى گىشتى بىنگەى ڧەرانسەى نازاد. خولىز ئانگىتا گۆنزالىس، سىرتىرى گىشتى پارتى كۆمىتەى ئىسپانىا. دوكتور ڧروونو ھۆسپ، سىرتىرى گىشتى SVP، تىرۆلى خوارو، ئىتالىا. ڧى جۇڧا، سەرۋكى كۆمەلەى مافى مرۆڧى ڧەرانسە، ۋى. لۇ نوانىك، سىرتىرى گىشتى FEN، ڧەرانسە، لىنۇ مائاراسۆ، ماف ناس، سەرۋكى كۆمەلەى جىھانى ماف و نازادى گەلان، ڧەرانسە. يانىك سىمېرون، سىرتىرى گىشتى FEN، ڧەرانسە.

ۋەرگرتوۋى خەلئى نوپىل:

كرىستىان. بى. ئانڧىنسن، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. كىنت. جى.ى. ئارو، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا، ھىزىرت. سى. ڧراون، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ھىزىرت. ئا. ھارپتمەن، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ڧرانسوا ۋاكۆب، ڧەرانسە. سىر جان كىندروو، برىتانىا. ۋان-مارى لىن، ڧەرانسە. سالفادۆر. ئى. لۇزىا، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ئاندرى. ئىل. ووف، ڧەرانسە. مەرىد گۆرىگان ماگىير، ئىرلەند. لوويس نىل، ڧەرانسە. ئادۆلفو پىر ئىسكىڧىل، ئارۋانتىن. جى.ى. سى. پۆلانى، كانادا. ئىلىيا پرىگۆۋىن، بىلژىك. كارلو ڧروپىيا، ئىتالىا. كلۆد سىمۇن، ڧەرانسە. دىزمۇند توو توو، ئەڧرىكاي خوارو. ئىس ڧان دىر مىر، ھۆلەند. جۇرچ والد، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. نىلى وىسل، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا.

ھونەر مەندەكان

نىستور ئالمىندروس، ئارۋانتىن. باربارا، ڧەرانسە. مورىس پىۋار، ڧەرانسە. ئىنگمار بىرمان، سۆند. جەين ڧرىك، برىتانىا. خوان سىدرۆن، ئارۋانتىن. ۋىزار دىپاردىز، ڧەرانسە مىگول ئانجىل ئىستولا، ئارۋانتىن. فرانس گال، ڧەرانسە. فرانسىس گىرۆد، ڧەرانسە. پۆۋى ھانىن، ڧەرانسە. ھىۋلىن، ڧەرانسە. مەلەك جىھان خەزايى، ئىران. پەروىز كىمىياۋى، ئىران. كاترىن لارا، ڧەرانسە. ئارىان منۇچكىن، ڧەرانسە. ڧى مۇنتان، ڧەرانسە. ھوگو سانتاگۆ، ئارۋانتىن. ئىتۆرى سىكولا، ئىتالىا. مرىنال سىن، ھىندوستان. ڧىرناندۆ سۆلانس، ئارۋانتىن. پىتراند تاڧىرنىر، ڧەرانسە. فرىزى تاڧىبانى، ئىتالىا. جان ماریا ڧولۆتتى، ئىتالىا.

نوسەران و ڧرۇنامە نوسان

ڧۆدى ئاتچىتى، برىتانىا. ھانى ئەلفىكاي، عىراق. كازم ئەلسەماۋى، عىراق. ڧاڧائىل ئالبىرتى، ئىسپانىا. جۇرچ نامادۆ، بەرازىل. ۋان كارلو ئانجىلۆنى، ئىتالىا. پىار ئىرنىستۆ بالدوچى، ئىتالىا. سەلىم بەرەكات، سورىا. ڧۆبىن ڧارىرۆ ساگىير، پاراگوا. كارۆلېن بىر، برىتانىا. مارشال بىرمان، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ۋان پىرتۆلىنۆ، ڧەرانسە. كلۆد بۆردى، ڧەرانسە. ڧۆبىر ڧرۆشۆن، سىرتىرى يانەى قەلەمى ڧەرانسە. ۋىزار شالىان، ڧەرانسە. دىدىۋى دىكۆن، ڧەرانسە. ڧۆبىنى دىسڧۆرۆۋى، ڧەرانسە. مارگىت درابل، برىتانىا. ئۆمبىرتۆ ئىكۆ، ئىتالىا. سەلىم ڧەخرى، عىراق. ۋان بىير ڧاىۋى، ڧەرانسە. مىشىل ڧلۆرى، ڧەرانسە. لىدى ئانتۆنیا ڧرەپۆر، سەرۋكى يانەى قەلەمى برىتانىا. ماریسا جىۋڧ، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ڧىكۆرىا گلېندىنىنك، برىتانىا. ئاندرى گلووكسمان، ڧەرانسە. ئالان جىنسىبىرگ، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. نۇرا گوتەن، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ھاجى سەد جەۋادى، ئىران. مارىنك ھالتىر، ڧەرانسە. مايكل ھەلۆۋى، برىتانىا. بىرنارد لانگلوۋى، ڧەرانسە. كلۆد لازمان، ڧەرانسە. پىننلۆپ لاڧىلى، برىتانىا. جۇس لووسۆ، ئىتالىا. م. مەججوى، ئىران. ئىدواردۆ مانىت، كويبا. كلۆد مۆرىاك، ڧەرانسە. ئىمىلى ئارنۆلد مەكالى، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ئارسەر مىللەر، ئەمىرىكا. ۋولبىت مىنسى، ڧەرانسە. ئالبىرتۆ مۇراقىيا، ئىتالىا. غەبدولپەرھمان موفىڧ، غەبەستانى سعوودى. يان مىردال، سۆند. ئىسماعىل نوورى غەلا، ئىران. مانوۋىل زاباتا ئۇلىڧىلا، كۆلۇمبىيا. خوان كارلۇس ئۆنىتى، ئۆرۇگوا. گرەيس پەدىلى، ولاءتە يەكگرتوۋەكانى ئەمىرىكا. ئۆكتاڧىۋ پاز، مەكسىك. گىل پىرۆل، ڧەرانسە. ھارۆلد پىنتىر، برىتانىا. ئاگوستۆ ڧوو وا باستۆس، پاراگوا.

له كولتورى كوردى له توركيا

فالتەر گوگینه‌رگەر، فریز هوشمايه‌ر، فریدا ميسانير - بلاو، سه‌رؤكى گروپى سه‌وز له په‌رله‌مان. د. لؤسه‌ر مؤلنير، پيتر بيلز، كاريل سيموريل، مانگرید سرب، ئەندرياس وابل.

به‌لجىكا: ماگدا ئيلفؤ، فيك تانسيز، فرانس بايرت، دوكتور م. كؤيتيزس، جؤ سيفريس، و. دوى فليگير، ئيزيك گريپ، گيدؤ يانزىگرئس، و. لؤيتن، نيللى مائس، گاستؤن پاك، تؤ تووسان، هؤگؤ فؤن دايدهرين، پ. فؤن گرئمه‌رگين.

ئيسپانيا: لويس ريكوردير سه‌رؤكى JNC

فه‌رانسه: كلؤد ئئست، ماكسيم گرئمئت، گئ مالاندين، ژورؤ مينسمين، ژان پروؤفؤ.

بريتانيا: ديانا ئەهؤت، پيتر ئارويئر، لؤرد ئافئيبؤرى، تونى بانكى، هارى بارتئس، جان باتلر، تونى بين، كيت برادلى، سيئر بيئرئارد به‌رين- جئنگرى سه‌رؤكى گروپى به‌رگري له مافى مرؤقى پارله‌مان، ران به‌رون، دئنيئس كه‌نه‌فان، بؤب كلای، ئان كلويد، هارى كؤهين، فرانك كووك، جئزئمى كؤريين، جان كامينگس، تيزى فيلدز، جؤرج گالؤهوى، لؤرد گيفرد، ميلدرئد گؤردن، بيئرئى گرائت، پيتر هاردى، جئزى هه‌يز، ئيزيك هئفر، ستواتر هؤله‌ند، داگ هؤيل، جئئى هئوز، لؤرد كيبلراكن، ئانتؤنى لؤيد، ئئدى لؤيدن، جئئى مه‌كاليؤن، ماكس مادين، بيل ميچى، كريس مولين، بؤب پئرى، مارتين رئمؤند، جئئى راد داك، به‌راين سيئدگئمؤر، كلارا شؤرت، دئنيئس سكيند، كريس سيئث، دافيد ئئلس تؤماس، پات وال، جئمى وهى، دافيد ويگلى.

ئيتاليا: ميشيل ئاشيلى- سه‌رؤكى كؤمئته‌ى ئەنجومه‌نى ده‌ره‌وى سه‌ناتؤ، گياشى ئالذؤ، سيلفانو ئەندريانى، جؤرجيؤ كارلؤ ئارگان- شاردارى پئشوو رؤم، ئاربيؤ بالدرينى، ئوگؤ بينام، جئزفانى بيئرلئنگوير، لؤنيلؤ بيئرئولدى، رؤمانانا بيئانشى، جؤسه‌فى بؤفا، ئارؤلدؤ كاسيا، جؤسه‌نى شارائتى، گئزاردؤ يه‌رؤمؤنتى- سه‌رؤكى رؤنامه‌ى رؤنئتا، جؤرجيؤ چئسبانى، فئنجى كلادويؤ، فئتؤ كؤنسؤلى، ئارماندؤ كؤسووتا، سالفاتؤرى كؤزجئتا، ئانجئيلؤ ديؤنيئسى، ئيسا فيئراگوتى، ئانتؤنيؤ فرانكى، مينؤتى گالىئوتى، چارمئنى گامؤفالؤ، گيدؤ گئزؤسا، لؤرينؤ گئيانؤتى، فرانكؤ گئستئئئلى، ئانتؤنيؤ گرائترانى، فرانكؤ گرئكؤ، نئكؤلا ئئمبئراكؤ، رانبيرو لاقال، لوءجيانؤ لاما- جئنگرى سه‌رؤكى ئەنجومه‌نى سه‌ناتؤ، فرانكؤ لؤنگؤ، پاسكال لوئس، مۇريؤ لؤتى، ئاركئمئدى كاسادى لوءچى، فرانسئسكؤ ماچئس، ئئتؤرى ماسئنا، جئانى ماتئئئولى، لوءجى ميئرئجى، جؤرجيؤ ئاپؤليئانؤ، كارلا نئسپؤلؤ، ئادالئرتؤ مينوچى، ژان كارلؤ پايتا، ئوگؤ پئكئئولى، ئؤتؤفريؤ پئئترارا، پييرو پيرالى، ماريؤ پئنا، رئناتؤ پؤلئنى، جئفانى رانالى، مارگئريئتى ريكاردؤ، دوكتور هانس روءنيئر، ئئرسئلييا سالفانو، فرانكؤ سالفى- جئنگرى سه‌رؤكى كؤمئته‌ى ئەنجومه‌نى ده‌ره‌وى سه‌ناتؤ، ماسئمؤ سكاليا، ئؤمبيئرتؤ سكارداؤنى، جئفانا سئئئرى، رئنؤ سئرى، ستؤيان سئپئتيك- سيئكئريئى كؤمئته‌ى ئەنجومه‌نى ده‌ره‌وى سه‌ناتؤ، ئوگؤ سئؤسئنى، ئانتؤنيؤ تارامئلى- سه‌رؤكى پئشوو ناوچهى ميلان، جئگليا ئئديئسكؤ، جؤرجيؤ تؤرناتى، گرازئيلا تؤسى برووتى، تؤليؤ فئركئئئتى، ئوگؤ فئئئئرى، جؤسه‌نى فئگئؤلا، رؤبيئرتؤ فئسكؤنتى، جؤسه‌نى فئتالى، پاولؤ فؤليؤنى، بيئرئنگؤ زاگانئنى- سكرئئرى پئشوو پارتى دئمؤكراتى مه‌سيحى.

هؤله‌نده: ربابكريس - سه‌رؤكى پارتى رادئكال له په‌رله‌مان، ب. گايؤرئقان، ي. رئنسمان.

ئەلمانىاي رؤژئاوا: يورگن ماري، ريجئنا ميشالئيك، يوهان مولئر، يورگن رئتس، كرئستئانسن شمئد، رئنئا شمئد، ئئبهارد والدى.

په‌رله‌مانى ئەوروپا: لوءسيانا كاستئئليانا، جئانى سئزئئتى- ئيتاليا. ئئج دانكؤنا- هوله‌ند. دوكتور يوخايم دالساس- نؤنه‌رى تيئزلى خاورو- ئيتاليا. وينفريئ ئئوينگ. سه‌رؤكى پارتى ناسئؤنالىئسى سكاتله‌ند. برئتانيا ستانلى نيؤز، برئتانيا. ئئدى نيومەن، برئتانيا. جئزى پليكان، ئيتاليا. ماريسا رؤدانؤ، ئيتاليا. هئئرى سابى، جئنگرى سه‌رؤكى گروپى سؤسيالىست، فه‌رانسه. لالا تروپيا، ئيتاليا.

بانگه‌وازی جیهانی بو داکوکی

له یادی رۆژی ۳ ئاداری ۱۹۲۴ دا که رۆژی قه‌ده‌غه‌کردنی زمانی کوردی‌یه له تورکیا، که تا ئیستاش ده‌ولتی تورکیا بی‌په‌روا کارده‌کات بۆ له‌ناو‌بردن و نه‌ه‌یشتنی زمان و کولتوری کوردی و نکولی له‌ یه‌ونی گه‌لی کورد ده‌کات. نه‌ستیتیوی کورد پاش هه‌ول و ته‌قه‌لایه‌کی زۆر، توانی ئیمزای پشتگیری نازادی قه‌ره‌نگی کورد له‌ چه‌ندین که‌سایه‌تی جیهانی به‌نیو و ده‌نگ کۆیکاته‌وه هه‌ر له‌ خه‌لاتکراوانی نۆیله‌وه تا ده‌گاته سیاسه‌تمه‌داران و نه‌ندامانی پارله‌مانی ولاتانی ئه‌وروپایی جیاواز و هه‌نهرمه‌ندان و نووسه‌ران و رۆژنامه‌وان و نه‌کادیمیه‌کان و ریکخراوه‌کان.

نه‌ستیتیوی کورد له‌ ژێر سه‌رناوی «بانگه‌وازی جیهانی بو داکوکی له‌ کولتوری کوردی له‌ تورکیا» ته‌م ناوانه‌ی به‌ ئیمزاکانه‌وه له‌ رۆژانی ۲۹-۳۰/۷/۱۹۸۸ دا له‌ رۆژنامه‌کانی HERALD TRIBUNE و LEMOND بلاکۆرده‌وه و له‌ رۆژی ۱۲/۷/۱۹۸۸ له‌ رۆژنامه‌ی THE GUARDIAN دا بلاکۆراوه‌ته‌وه و له‌ تورکیاش گۆڤاری 2000 و رۆژنامه‌ی ته‌رجومان و میله‌ت باسیان کۆرد و گۆڤاری «الحریه» ی عه‌ره‌بیش هه‌ندی له‌ ناوه‌کانی بلاکۆردۆته‌وه.

ته‌م ناوانه له‌ لیسته‌که‌ی رۆژنامه‌ی لومۆند وه‌رگیراوه که له‌ ژماره‌ی پینشووی «به‌ریانگ» دا ده‌قه ته‌سلیه‌که‌ی بلاکۆراوه‌وه.

بانگه‌وازی جیهانی بو داکوکی له‌ کولتوری کوردی له‌ تورکیا

وه‌کو هه‌ر کۆمه‌لگه‌یه‌کی ئاده‌میزادی، گه‌لی کورد مافی هه‌یه که‌له‌پوره قه‌ره‌نگی‌یه‌که‌ی بپاریزی و سه‌ره‌ستانه ناسنامه‌که‌ی ده‌رپری. قه‌ره‌نگی که‌ونارای کورد به‌ شیکه له‌ میراتی کولتوری جیهانی. به‌ره‌می سه‌ده‌کانی میژوو و کاری چه‌ندین نه‌وه‌یه، هه‌ر وه‌کو قه‌ره‌نگه‌کانی دیکه شایانی ریز و پاراستنه.

هه‌ر بۆیه ئیمزاکه‌رانی ژێره‌وه، که رینوینی کراون به‌ پرانسیپه په‌خشکراوه‌کانی قانونی کۆمه‌له‌ی نه‌ته‌وه یه‌کگرتوه‌کان و روونکردنه‌وه‌ی گشتی مافی مرۆف و په‌یمان جیهانییه‌کانی له‌مه‌ر مافی مرۆف، به‌رپه‌رچن به‌ هه‌موو شینوه‌کانی چه‌ور و سته‌م و جیاوازی دانان و سوورن له‌سه‌ر دادگه‌ری و داخوازی ده‌که‌ن که چی زووتره ده‌سه‌لاتدارانی تورکیا هه‌موو چه‌شنه قه‌ده‌غه‌یه‌کی ده‌ستوری و قانونی له‌سه‌ر به‌کاره‌ینانی زمانی کوردی و به‌گشتی هه‌موو ده‌رپه‌نه کولتورییه‌کانی ملیۆنه‌ها کوردی هاو‌نیشتمانی تورکیا لابه‌رن.

* * *

فاروق ته‌به‌وعیسا وه‌زیری پینشو، سه‌رۆکی یه‌کینتی پارێزه‌رانی عه‌ره‌ب، سو‌دان. عه‌بدولکه‌ریم ته‌له‌ه‌زری، وه‌زیری پینشو، عیراق. ته‌دیب ته‌لجادر، وه‌زیری پینشو، جینگری سه‌رۆکی کۆمه‌له‌ی عه‌ره‌بی مافی مرۆف، عیراق. ته‌به‌ولخه‌سه‌ن به‌نی سه‌در، سه‌رۆک کۆماری پینشووی ئێران. ته‌حه‌مه‌د بین بێلا، سه‌رۆک کۆماری پینشووی چه‌زایر. ژان شار بۆنیل، وه‌زیری پینشو، فه‌رانسه. رامسه‌ی کلارک، پارێزه‌ر، وه‌زیری پینشووی داد، ولاته‌یه‌که‌گرتوه‌کانی ئەمریکا. میشل کربنۆ، وه‌زیری پینشو، فه‌رانسه. محه‌مه‌د فایق، وه‌زیری پینشو، سه‌رۆکی کۆمه‌له‌ی مافی مرۆف، میسر. لویگی گرانیلی، وه‌زیری پینشو، ئیتالیا. میشل ژوبییر، وه‌زیری پینشو، فه‌رانسه. ته‌دوارد م. کینیدی، سه‌ناتۆر، ولاته‌یه‌که‌گرتوه‌کانی ئەمریکا*. بێرنارد کۆشنیر، سه‌کرتیری ده‌وله‌ت، فه‌رانسه. ته‌دوارد لیمانس، وه‌زیری ده‌وله‌ت، سه‌رۆکی پینشووی سه‌ناتۆر، به‌لجیکا. وینی ماندیلا، ته‌فریقای خواروو. پیری ماوروی، سه‌رۆک وه‌زیری پینشو، سینکرتیری یه‌که‌می پارتی سۆسیالیست، فه‌رانسه. دانییل میتیران، خیزانی سه‌رۆک میتیران. فیژونیک نیبه‌رتس، سه‌کرتیری ده‌وله‌ت، فه‌رانسه. له‌یلا شه‌ره‌ف، وه‌زیری پینشو، نه‌رده‌ن. رۆژی ژێرارد شوارتزبیرک، وه‌زیری پینشو، فه‌رانسه. عومه‌ر سیاعی، وه‌زیری پینشو، سووریا. بێرنارد ستاسی، وه‌زیری پینشو، جینگری سه‌رۆکی سی دی ئیس، فه‌رانسه. دوکتور ژ. فالکنیر، وه‌زیر، به‌لجیکا.

پارله‌مانیه‌کان:

ته‌مسا: جۆزینف جاب، د. هانز فیشهر، سه‌رۆکی گروپی سۆسیالیسته‌کان له‌ په‌رله‌مان. هیریبرت فوش، فالته‌ر گیایر. تامۆلد گراهنه‌ر.

ئەى مرۇفە پىشكەوتنخواز و ئاشتىخوازە كان
ئەى رىنكخراوه دىموكراسى و مرۇفائىه تىبە كان

دەبى ئىنوه بى دەنگ نەبن بەرامبەر ئەو شەرە
خونناووبىه قەلاچۇكەرانبەى كە هىزە كۆلۇنئالىست و
زۆردارە كان لە دواچارەكى سەدەى بىستەمدا، لە
كوردستانى دابەشكراو بەسەر چوار ولأندا، بە لەشكرى
پرچەك و بە نوئىترىن چەك بە فرۇكە و تانك و تۆپ،
بە چەكى كىمىيائى پىادەبان كوردە دژى مىللەتىكى
گەرە كە دەخوازىت بە سەربەخوئى بژى.



تەشكەرى رزگارى كوردستان داوا لە رىنكخراوى
نەتەوہ يەكگرتوہ كان دەكات، داوا لە ولأتە دىموكراتى و
ئاشتىخوازە كان و لە پارتيبە دىموكراتىبە كان و
رىنكخراوہ كانى لاوان و ئافرەتان و ھەموو كەسانى كە
رىز لە ئاشتى و ئازادى كەسانى تر دەگرن. داوا لە
رووناكبىران و ھونەرمەندان دەكات كە پشتگىرى گەلى
كورد بەكەن.

ئەم بەياننامەى رۆژى ٢٢/ھوزەيرانى ١٩٨٨ لە
لايدەن ئەم رىنكخراوانەوہ بلاوكراوہ تەوہ.

ئالائى رزگارى

KUK-SE كوكسى (رزگاربخوازانى نەتەوہى كوردستان -

باسكى سۆسىالىست)

PARHE Z پارتى ھىزى ولأت پارىزى كوردستان

PDK- RN پارتى رىنكخراوى كوردستان - رىنكخراوى

نەتەوہى

PPKK پارتى پىنشەنگى كارگەرانى كوردستان

PSKT پارتى سوسىالىستى كوردستانى توركىا

SK شۆرپشگىزانى كوردستان

YSK يەكئىتى سۆسىالىستى كوردستان

كوردستان كە ئىمېرۇ لە نىوان چوار دەولەتدا پارچە پارچە
كراوہ خاوەنى خاكىكى ٥٠٠٠٠٠ كىلۇمەترى
چوارگۆشەى و ژمارەى كورد دەگاتە ٢٥ مىلۇن.

كورد كەمابەتى نىه وەك ھەندىك دەخوازن وائ پىشان
بەن، بەلكو مىللەتىكى گەرەىدە. گەلى ئىمە
دووسەدسالە كە خەبات دەكات بۇ ئازادى و لەم
رىنگاىدە سەدان ھەزا مرۇف خوزبان كوردتە قورىانى،
ئىمېرۇ لە تەواوى پارچە كاندا راپەرپىنى نەتەواىەتى
گەشتەر و فراوانترە ...

لەم دەمەدا، كە لە كۆتائى سەدەى بىستەم نرىك
دەبىنەوہ، ھىچ ھىزىك ناتوانى ئىرادە و داخوازى گەلى
ئىمەبشكىنى. ئاشكراىە كە سىياسەتى ئەو ھىزە
كۆلۇنئالىست و زۆردارانەى كە تا ئىمېرۇ گەر تەوانىوانە
بە زۆردارى و فرت و فىل گەلى كورد بە ژۇردەستى
بەئىلنەوہ و خوزبان لە كىشەى كورد رزگار بەكەن ئىمېرۇ
ئەو سىياسەتە لات و پووچەل بووہ.

نىشتمانپەرورەرانى كوردستان، مرۇف دۆستان، ئەى
ئەو ھەموو كەسانەى لەو پارچەىدەى بن دەستى توركىا
ئازادى ولأتتان دەوئت. تا ئىمېرۇ ئەو ھەنگاوانەى نراون
بۇ يەكخستنى ھىزە نىشتمانپەرورە كان سەرنەكەوتوون
يان تا دواقوناخ برىان نەكردووہ. بەلام ئەمە مانائى ئەوہ
نىه كە مرۇف بەكەوئتە داوى بى ھىواىى و سستى
بنوئنى لە خەباتكردندا بۇ يەكگرتن. بۇ سەركەوتن و
بەزىندووى ھىشتنەوہ و بۇ بەھىزكردن و گەىشتن بە
ئامانجە كان دەبى ئىمە گەلىك كارى گران بگرىنە
ئەستۆى خۇمان، چەند سەخت و گران دەبى، با بىى.
ئىمە ناچارىن لەم يەكبوونەماندا سەربەكەوئىن و سەرىش
دەكەوئىن ...

لەبەر بىروواوہرى جىاواز لەسەر ئەم مەسەلە و ئەو
مەسەلەىدە، لەبەر جىاوازى پرۇگرام راناوہستىن و دەبى
ئەمانە نەبئە بەرەسەت» ئەوہى كە ئىمە لەناو بەرەىەكدا
بگەىنە يەك. پىنكەوہ بۇ ئامانجە ھاوبەشەكانمان خەبات
بەكەىن. ئەم رىنكخراوانەى تەشكەرىان دروست كوردوہ
لە روانگەى ئەم بىرووبۇچوونەوہ ھەنگاواىان ناوہ ...
لە تىنكۆشاماندا، پىنوئىستمان بە ھارىكارى ھەر رىنكخراو
و ھەر كەسىكى نىشتمانپەرورە.

داوا لە گشت رىنكخراو و كەسانى نىشتمانپەرورە
دەكەىن كە ھەموومان پىنكەوہ لە تەشكەردا شوئىنى
خۇمان بگرىن ... وەرن با پىنكەوہ خەبات بەكەىن ...
با بۇ ئازادى كوردستان ھىزەكانى خۇمان بگەىنەىنە
يەك.

ته‌فگه‌ری رزگاری کوردستان

* ده‌مانه‌وی له کوردستان ده‌وله‌تیکی سهره‌خۆ و دیموکراتی دابه‌زرینین.
* وه‌رن با پینکه‌وه خه‌بات بکه‌ین بۆ ئازادی کورده‌ستان هیژده‌کانی خۆمان بگه‌یه‌نینه بکه‌.

ئه‌مه‌سالدا دامه‌زران، مژده‌ی به‌دیاره‌که‌وتنی ئاسۆیه‌کی روونه له ئاسمانی کوردایه‌تیدا ... مژده‌ی بنه‌بهرکردنی دووبه‌ره‌کی و زال نه‌کردنی ناکۆکییه‌ لاهه‌که‌کانی ناو هیژه‌ خه‌باتگیره‌کانه‌ به‌سه‌ر ناکۆکی سهره‌کی‌دا که له نیوان سهرانسهر گه‌لی کورد و دوژمنه‌ داگیرکه‌ره‌کاندایه‌. هه‌موو تاقیکردنه‌وه‌کان سه‌لماندوویانه‌ هیژ له یه‌کیته‌ی و یه‌کگرتن و کاری هاویه‌شدایه‌.

چهند بڕگه‌یه‌ک
له به‌یاننامه‌ی دامه‌زراندنی ته‌فگه‌ر

ئیمه‌ هه‌شت هیژی شوپشگیر و نیشتمانپه‌روه‌ری ئه‌و پارچه‌یه‌ی کوردستان که له ژێرده‌ستی تورکیادایه پینکه‌وه‌ کۆبوینه‌وه و ته‌فگه‌ری رزگاری کوردستانمان دامه‌زراند که «ته‌فگه‌ر» کورته‌ی ناوه‌که‌یه‌تی. ئامانجی ئیمه‌ ئه‌وه‌یه‌ که کۆتایی ببنین به‌ داگیرکردنی ولاته‌که‌مان له لایه‌ن بینگانه‌وه‌ که سه‌دان ساله‌ داگیریان کردووه‌. ده‌مانه‌وی له کوردستان کۆتایی به‌ ده‌سه‌لاتی بینگانه‌ و رژی می زۆرداری ببنین، له کوردستان ده‌وله‌تیکی سهره‌خۆ و دیموکراتی دابه‌زرینین. کارگه‌رینی پاشکه‌وتووی ئابووری و شارستانیته‌ی و کلتووری نه‌هیلین و ولات به‌خه‌ینه‌ سهرزنی به‌ره‌وه‌پیشه‌وه‌ چون.

ئیمه‌، له کوردستان که به‌سه‌ر چوار ولاتدا پارچه‌ پارچه‌ کراوه‌، هیژه‌ سه‌رده‌سته‌ و کۆلۆنیالیسته‌کان هیچ کاتێ ناتوانن ئاوات و ئه‌وینی گه‌له‌که‌مان بۆ ئازادی، خه‌فه‌ بکه‌ن. ئه‌وانه‌ شه‌ری قه‌لاچۆکردنی ئیمه‌یان به‌رپاکردووه‌ و هه‌ول ده‌ده‌ن که نکولی بکه‌ن له زمان و کلتور و میژووی ئیمه‌ و بیانخه‌نه‌ خا‌نه‌ی له‌بیرچوونه‌وه‌

دوای زنجیره‌یه‌ک کۆبوونه‌وه‌ و گفتوگۆی دوور و درێژ. هه‌شت رنکه‌خراوی خه‌باتگیرێ کوردستانی ژورو له رۆژی ۲۲/هه‌ساره‌ی ئه‌مه‌سالدا به‌یاننامه‌ی دامه‌زراندنی «ته‌فگه‌ری رزگاری کوردستان» یان بلا‌وکرده‌وه‌.

ساله‌های ساله‌ گه‌لی کورده‌مان له‌و به‌شه‌ مه‌زنه‌ داگیرکراوه‌ی کورده‌ستاندا دووچاری ناله‌بارترین باری چه‌وساندنه‌وه‌ی نه‌ته‌وايه‌تی و چه‌ینایه‌تی ده‌بیت. له سهره‌تای هاتنی که‌مالیه‌کان بۆ سه‌ر حوکم و دامه‌زراندنی کۆماری تورکیا له پاش هه‌ره‌س هینانی ئیمه‌په‌رتوویه‌تی عوسمانی، به‌ توند و تیژترین شیوه‌ هه‌ولی سه‌رکوته‌کردنی کورد ده‌دریت، که ئیستا ژماره‌یان له دوانه‌ ملیۆن که‌س زیاتره‌.

له به‌رامبه‌ر ئه‌و گشت زۆرداری چه‌وساندنه‌وه‌یه‌شدا، هیچ کاتێک ئازادیخوازانی گه‌له‌که‌مان ده‌ست به‌رداری خه‌بات نه‌بوون و هه‌میشه‌ له خه‌باتدا بوون بۆ به‌ده‌ست هینانی ئازادی و سهره‌ستی. شوپشه‌کانی ده‌رسیم و ناگری داخ و راپه‌ڕینه‌کانی تر نمونه‌ی ناشکران.

ئیستاش گه‌له‌که‌مان له‌و پارچه‌یه‌ی نیشتمانکه‌ماندا بی‌ وچان له خه‌باتدان... هه‌ر له پیناوی ئه‌و ئامانجه‌ سه‌ره‌کییه‌ پیرۆزه‌دا، هه‌شت پارتی و رنکه‌خراوی کوردستانی له چوارچه‌ینه‌ی «ته‌فگه‌ر» دا یه‌کیان گرتووه‌ و خه‌باتی خۆیان کردووه‌ به‌یه‌ک، که ئه‌وه‌ش مایه‌ی دلخۆشکردنی گشت نیشتمان په‌روه‌ره‌کانی هه‌موو پارچه‌کانی کوردستان و دۆستانی گه‌له‌ چه‌وساوه‌که‌مانه‌.

دامه‌زراندنی «به‌ره‌ی کوردستان» ی عیراق و «ته‌فگه‌ر» که‌یه‌ک به‌دوای یه‌کدا له ئایار و هه‌ساره‌ی

نمونه‌کافی تری وهک ئو هه‌لده‌گرئ و سه‌رئیشه بۆ ئیزان درووست ناکات. به‌پنجه‌وانه‌شه‌وه، ئه‌میش به‌پنجه‌وانه‌وه ره‌فتار ده‌کات.

۲- ئه‌گه‌ر له‌دوارژدا دوا‌ی رینکه‌وتن، ئیزان ویستی په‌یوه‌نی خزی له‌گه‌ل کورده‌ عیراقیه‌کان به‌یئلی و که‌ی ویستی ده‌ستی یارمه‌تیا‌ن بۆ دریز بکات و بیانکات به‌گژ عیراقد، ئو ئه‌میش له‌ به‌رامبه‌ردا ئه‌وانه‌ی به‌ده‌سته‌وه‌یه که‌ بیانجولئینی. به‌لام ئه‌گه‌ر به‌وردی سه‌رنجیکی مه‌سه‌له‌که‌ بدریت و باری میژوویی زووفی خزی و تایبه‌تی و خواست و ئامانجه‌کانی هه‌ردو جه‌نگ لیک جودا بکریته‌وه، ئاشکرایه که‌ مه‌سه‌له‌ی کورد پاشکۆ نیه له‌ جه‌نگی ئیزان و عیراقد، و به‌کوژاندنه‌وه‌ی ناگری ئو جه‌نگه‌ نا‌ه‌وا‌یه مه‌رج نیه که‌ گ‌ر و بلیسه‌ی شو‌رشی میله‌تیکیش دابمرکیت‌وه که‌ ده‌یان سا‌له‌ قوربانی ده‌دات له‌ پیناوی ئازادی و سه‌ربه‌خو‌بیدا.

ئو جه‌نگه‌ ویزانکاری و نا‌ه‌وا‌یه و به‌رده‌وام بوونی و هیئانی بۆ کوردستان و پینکه‌وه‌ لکاندن له‌گه‌ل بزووتنه‌وه‌ی کورده‌نا‌ه‌اق له‌به‌رچاوی جیهان شو‌رشی گه‌له‌که‌مانی کردبو به‌ پاشکۆیه‌کی لاواز بۆ پاسدارانی ئیزان و کوردسانیش له‌ سالانی دور و دریزی ئو جه‌نگه‌دا بووه‌ گ‌زه‌پانی جه‌نگی نیوان ئو دوو له‌شکره‌ و ج‌زه‌ها و نو‌یترین چه‌کی به‌ درنده‌ترین شیوه‌ تیدا به‌کاره‌ینا و رژیمی فاشی عیراقیش له‌ ژیز په‌رده‌ی جه‌نگ و به‌بیانویی به‌رگری کردن له‌ نیشتمان (که‌ ته‌نیا ته‌خت و کورسیه‌که‌ی خزی به‌ نیشتمان ده‌زانیت) هیچ دریزی نه‌کرد له‌ کاولکردنی کوردستان و به‌کاره‌ینانی گازی کیمیایی و کوشتی به‌ کۆمه‌ل و سوتاندنی سه‌دان گوند و راگ‌یزانه‌وه‌ی سه‌دان هه‌زار گوند نشینی کوردستان به‌روو بیابانه‌کانی سه‌ر سنووری سه‌عودیه و ئه‌ردن و سه‌رنگون کردنی هه‌زارانی تر... واته‌ به‌رده‌وامی جه‌نگ نه‌بوته‌ کۆسپ له‌به‌رده‌م دیکتاتوری عیراقد بۆ قه‌لاچوکردنی کورد، نا به‌لکو هه‌ندی جار بووه‌ به‌ به‌لگه‌ و بیانویی که‌ باش به‌ده‌سته‌وه‌ و رای گشتی عیراق و جیهان و ته‌نانه‌ت هه‌ندی لایه‌نی به‌ناو موعاره‌زه‌شی پی‌ چاویه‌ست کردوه.

ئه‌مانه‌ هه‌مووی له‌لایه‌ک، له‌لایه‌کی تریشه‌وه‌ چاوه‌روان ده‌کرا و باوه‌ر و ابوو که‌ ئیزان ده‌توانی به‌ جه‌نگ رژیمی عیراق بوخینی ... به‌لام ده‌میکه‌ بۆ گشت لایه‌ک ئاشکرا بووه‌ که‌ جه‌نگ سه‌ره‌رای هه‌له‌وه‌ چو‌تی سیاسه‌تی ده‌مارگیره‌ ئیزانیه‌کان چ له‌سه‌ر ئاستی نیو ده‌وله‌تان و چ له‌گه‌ل ره‌فتارکردنیا‌ن له‌گه‌ر موعاره‌زه‌ی عیراقی، بووه‌ ه‌زی به‌هیزکردن و زیاتر خو‌گرتنی سه‌دام، نه‌ک به‌ پینجه‌وانه‌وه‌، له‌پال ئو ئیحه‌تماله‌دا که‌ گوايه‌ جه‌نگ سه‌دام درووخینی، چه‌ند ئیحه‌تمالیکی تریش په‌یدا بوویون وه‌ک:

۱- به‌ کوده‌تای عه‌سکری له‌رینی ریکخسته‌کانی نیو سوپا که‌ سه‌ر به‌ هیزه‌کانی موعاره‌زه‌ی عیراقین .. که‌ تا ئیستا ئه‌گه‌ر چه‌ند هه‌ول و ته‌قه‌لایه‌کیش درابیت ، سه‌ری نه‌گرتوه‌.

۲- هه‌ندی جاریش چاوه‌پینی ئه‌وه‌ ده‌کرا که‌ به‌رده‌وامی جه‌نگ ئاسته‌نگ (آزمه‌) بۆ رژیم درووست بکا و ئا‌وا‌وه‌ له‌ناو سه‌رانی رژیم‌دا درووست بیئت و شیرازه‌ی حوکم تیک بچیت و خ‌به‌خ‌زی خو‌یان سه‌دام له‌ناو بیه‌ن.

۳- ولاته‌ ر‌ژ‌ئا‌وا‌ییه‌کان به‌هاوکاری له‌گه‌ل سه‌عودیه و هه‌ندی ولاتی تری عه‌ره‌بی هه‌ول بده‌ن تا ئیزان عیراقی نه‌گرتوه‌ و حکومه‌تی ئیسلامی دانه‌م‌زاندوه‌ به‌دیل بۆ سه‌دام په‌یدا بکه‌ن و یه‌کیکی تری سه‌ربه‌خو‌یان به‌یئنه‌ سه‌ر حوکم.

۴- هیزه‌کانی موعاره‌زه‌ی عیراق تیکرا له‌به‌ره‌یه‌کی فراواندا توانای خو‌یان بکه‌ن به‌یه‌ک و پینکه‌وه‌ له‌گه‌ل دیکتاتوریه‌ت بجه‌نگن تا ده‌بوخین... به‌لام دامه‌زاندنی ئو به‌ره‌ فراوان و پان و پ‌ژه‌ و یه‌کخه‌ستی تواناکان و به‌عیراقی کردنی شو‌رشی چه‌کداری هه‌ر هیوا و ئاوات و خو‌زگی ناو دلی هه‌ندی لایه‌ن و هه‌ر قسه‌ی رووت و بنیسته‌خ‌وشه‌ی ژیز زمانی هه‌ندیکی تریان بوو و له‌ چه‌ند سالی رابوردودا گه‌فتوگ‌کردن له‌سه‌ر دامه‌زاندنی ئو به‌ره‌یه‌ له‌و گه‌فتوگ‌و دریزه‌ ده‌چو که‌ ئایا هیله‌که‌ له‌ مریشک یا‌ن مریشک له‌ هیله‌که‌یه‌.

۵- جگه‌ له‌و خالانه‌ی سه‌روه‌وه، ئیحه‌تمال بۆ ئه‌وه‌ش داده‌نرا که‌ راپه‌رینی سه‌رتاسه‌ری و جه‌ماوه‌ریانه‌ی گه‌لانی عیراق وه‌ک لاسایی کردنه‌وه‌ی راپه‌رینه‌ میژوویییه‌که‌ی گه‌لانی ئیزان که‌ شایان ده‌ره‌په‌راند .. بۆ ئه‌م مه‌به‌سته‌ش هه‌ر کوردستان ده‌بووه‌ ده‌ست پینکه‌ر و قوربانی. راپه‌رین و خو‌بیشاندان و مانگرتنه‌کان هه‌ر له‌ شار و شاروچه‌ کورديه‌کاندا په‌نگی ده‌خواردوه‌ و له‌ چاکترین باردا هه‌روه‌ک راپه‌رین و خو‌بیشاندانی گه‌لی ولاتیکی تر ده‌گه‌یشه‌ شاره‌ عه‌ره‌بیه‌کان و به‌زوی له‌بیر ده‌کرا.

که‌ دوا‌ی هه‌شت سالی سه‌خت و خو‌یناوی جه‌نگ ئو بوچوونانه‌ هیچیان نه‌هاته‌ دی و کوردستان و گه‌لی کوردیش جگه‌ له‌ سووتان و ویزانکردن و کوشتن و برین به‌ولاوه‌ هیچی تری پی‌ نه‌ب‌را، زیاتر به‌رده‌وام بوونی ئو جه‌نگه‌ش له‌ دوارژدا نه‌ک هه‌ر هه‌مان نه‌جامی ده‌بوو، به‌لکو چاوه‌پوانی زور کاره‌ساتی وه‌ک کاره‌ساته‌که‌ی هه‌له‌بجی لی ده‌کرا و تا جه‌نگیش دریزه‌ی هه‌بوايه‌ زیاتر کوردستانی تیا ده‌بوو به‌ژیز پی‌وه‌ و ده‌سووتینرا و ده‌کرایه‌ ویزانه‌ خاک و زیاتر و زیاتریش شو‌رشی گه‌له‌که‌مان ده‌بووه‌ پاشکۆی ئو جه‌نگه‌ و بزووتنه‌وه‌که‌شمان ده‌کرایه‌ قوربانی به‌رژه‌وه‌نزی ر‌ژ‌انه‌ی داگیرکه‌ران...

ئاشکرایه‌ دوا‌ی ته‌واو‌بوونی جه‌نگی ئیزان و عیراق، رژیمی فاشی عیراق له‌ جه‌نگی ره‌گه‌زه‌رستانه‌ی خزی دژی گه‌له‌که‌ماندا به‌رده‌وام ده‌بی و به‌ ناگر و ئاسن ده‌یه‌ویت چاره‌سه‌ری کیشه‌ی کورد بکات، به‌لام لیزه‌دا گرنگ ئه‌وه‌یه که‌ ره‌نجی خه‌باتی کورد هه‌ر بۆ کورد بیئت و خو‌ینی ر‌ژ‌اوی پینمه‌رگه‌ له‌ پیناوی کوردستاندا بیئت.

کوردستان له نیوان بهرده وامی یان راگرتنی جهنگی ئیران و عیراقددا



داگیرکه رانی کوردستان بهرده وام له ههول و تهقه لادان بۆ سه رکوت کردن و قه لاچۆ کردنی گهلی کورد و بۆ هینانه دی ناواته کانیان گشت جۆره شیوازیکیان به کارهیناوه، هر له نکولی کردن له بوونی کورد وهک نه تهویهک تا دهگاته به کۆمهله کوشتن و له سیداره دان و راگواستنه وهی هه زاران گوند.

له بهرامبهر توند و تیژی داگیرکه رانییدا بی وچان گهلی کورد له راپه رین و شوپشدا بووه بۆ وه دهست هینانی نازادی و سه ربه خۆیی ... واته بهرده وام جهنگ له نیوان گهلی کورد و داگیرکه راندا هه بووه.

هه لگه رساندنی جهنگی ئیران و عیراق و کردنی کوردستان به یهکی له مهیدانه گه رمه کانی ئهم جهنگه و تیکه لاو بوونی له گه له ئو جهنگی تر که دژی گهلی کورد ده کریت کاریگه ریتی زۆری بووه بۆ سه ربزوتنه وهی نازادیخوازی گه له که مان و بیگومان راگرتنی ده بیته هزی هه لدان وهی په رده یهکی تری ئو شانۆگه ریه خویناوییهی کوردستان و بزوتنه وهی نازادیخوازی گه له که مان ده خاته قزناخیکی تری شوپش و خه باتگه ریان.

به رپاره که ی ئیران بۆ شه ر راگرتن، به لای هه موانه وه به تاییه تی کورد، به رپاریکی کۆتوپر و بی سه ره تا و بی نیشانه و چاوه پوان نه کراو بو، باوه ر واپوو که تا خومه یینی له ژیاندا بیت و رژیمی سه دام له سه ر حوکم بیت، جهنگ هه ر بهرده وام بیت.

هه ر بۆیه هاوکات له گه له راگه یاندنی ده نگه پاسی ئه وهی که ئیران به رپاری ۵۹۸ ی په سه ند کرد و بلاوی کرده وه که بی مه رچ ده یه وی کۆتایی به جهنگ بینیت... به کسه ر تارمایی ره ش و دزیوی هه ره سه که ی سالی ۱۹۷۵ و کۆتاییه تراژیدییه که ی شوپش و راپه رینه کانی کۆن و نوینی کوردستان هات به بیری هه مو کورده دا. گه ر جهنگ ته واو بیت کیشه ی کورد له نیوان ئو دوو به ردا شه دا چی لی دیت؟ ئایا کورد ده توانیت چی بکات؟ داگیرکه ران ئه مجاره ش له سه ر له ناو به ردنی کورد ریک ده که ون؟ هه ریه که له به ر به رژه وهندی تاییه تی خۆی ده ست له بزوتنه وهی لایه که ی تر هه لده گرن که خه ریکه کاریان پنیان نامینی؟ دوا ی ئه وه

هه ردوو رژیم ریک ده که ون و ئاگری ئو جهنگه ناره وایه خاموش» ده بیت رژیمی فاشی عیراق چ پیلانیک ده خاته کار بۆ تۆله سه ندنه وه له بزوتنه وهی کورد؟ ئایا رژیمی فاشی عیراق هه مو قورسای خۆی ده خاته سه ر کوردستان و له شکره که ی که هه شت ساله سه رقالی جهنگیکی تره به ته واوه تی ترخان ده کات بۆ جهنگیکی تر و ته ر و وشک پیکه وه ده سووتینی؟

گومانی تیدا نییه هه ر ریکه وتنیک له نیوانیاندا روو بدات یه کیک له خاله سه ره که کانی ریکه وتنه که (مه سه له ی کورده) وهک له ریکه وتنه که ی سالی ۱۹۷۵ ی جه زائیر که ده بی په یمان به دن سنوری خۆیان له سه ر کورد دابخه ن و هاریکاری کورده دیوه که ی تر نه که ن.

سه دام له م دوا ییه دا بایه خیکی زۆر ده دات به (مجاهیدی خلق) و به ته واوی پشتگه ریان ده کات و یارمه تیان ده دات و هانیان ده دات بۆ په لاماردانی ئیران که ئه وه ش به لایه نی که مه وه بۆ دوو مه به سه ت:

۱- بۆ به کارهینانیان وهک وه ره قه یه ک له سه ر میزی ریکه وتن له گه له ئیران، که ئه گه ر ئیران ده ست به ردار ی کورده ی عیراق بی ئه مپش ده ست له مه سه ودی ره جه وی

جگه له وانهش چهند سالنیکه، به پینی بۆچوونی هه ندی له لایه نه کانی موعاره زه ی عیراقی، ته و او بوونی جهنگ و گه رانه وه ی له شکر بۆ سه ربازگه کان، هه لی باش دینیتته کایه وه بۆ یه کگرتتی گه ل و له شکر و راپه پینی جه ماوه ری و رووخاندنی رژیم.

پرسیاریکی تر ئه وه یه که ئایا دوا ی ئه و جهنگه گه وه و گرانه و دوا ی ئه و هه موو دوژمنایه تی و خوین رشتنه هه روا ب ئاسانی رژیمی ئیران و عیراق ریککه و تن نامه ئیمزا ده که ن و وهک نه بایان دیبی و نه باران ده چنه وه قاره که ی جارانیان و هه ر که سه خه ریکی ریکخستنه وه و نو ی کردنه وه ی ناوما لی خزی ده بیت! که به هه ردوکیان خاوه نی بوو هه زار شار و شاروچکه و گوندی ویرانه ن له م دیو و له و دیوی سنووریکی هه زار کیلومه تری که به پینی راپوړتی پسپه زه رۆژئاوا ییه کان بۆ گه رانه وه بۆ دۆخی جارانی عیراق پیو بیستی ته نیا به ۱۴۸ ملیون دۆلار و ۲۷ ساله و ئیرانیش هه ر پیو بیستی به ۲۹۶ ملیون دۆلار و ۹۰ ساله. ئایا وهک دوو دراو سینی باش مافی دراو سینیته ی ده پاریزن و ده که ونه قوناخی خوشی و «ناشتی دوا ی شه ر»، که میژووی کۆن و نو یی هه ردوو ولات پیچه وانه ی ئه وه ده سه لینی؟. یان راوه ستاندنی شه ری چه کداری ده بیته پینشه کی بۆ شه ریکی قورستر؟ به شیوه یه کی تر که ئه وهش هه ر له سه ره تای قبول کردنی ئیرانه وه بۆ شه رراگرتن، به زه قی خزی ده نوینی و رژیمی عیراقیش هه سته به وه کردوه و رایگه یاندوه که مه ترسی هه یه که شه رراگرتنه که ته نها بۆ تاکتیک و پشوودان و خۆکۆکردنه بیت و له ترسی ئه وه داوا ی کۆبوونه وه و مفاوه زاتی دووقۆلی و راسته وخۆ ده کات.

خۆ ئه گه ر له پینی ریکخراوی نه ته وه یه کگرتوه کانی شه وه ریککه و تنیان مۆرکۆد زۆر ئاسان نییه که ده قی ریککه و تنه که له سه ر زه وی جینه جی بکری و ئه و گیروگرفته بنه رته یانه ی له نیوانیاندا هه یه بتوانی له سه ر کاغاز چاره سه ر بکری، به تاییه تی گیروگرتی سنوور، که زۆربه ی بۆچوونه کان به ره و ئه وه ده چیت که له م باره یه وه بگه رینه وه سه ر ریککه و تن نامه که ی ۱۹۷۵ ی جه زائیری نیوان سه دام و شای ئیران، که ئه وهش خزی له خۆیدا هۆیه کی سه ره کی بوو بۆ هه لگی رساندنی ئه م جهنگه و دوور نییه له پاشه رۆژیشدا جاریکی تریش بیته وه به بورکان و له نیوانیاندا بته قیته وه.

پرسیاریکی تریش که له م باره یه وه دیته پینشه وه، سه باره ت به چۆنیه تی تیروانیی ولاته گه وره کان بۆ رژیمی عیراق، به تاییه ی ولاتانی رۆژئاوا. ئایا له روانگه ی به رژه وه ندی خویانه وه، له بهر تیشکی هاوکی شه سیاسی ه نوییه کان، چۆن پارسه نگی په یوه ندی خویان له یه ک کاتدا له گه ل ئیران و عیراق راده گرن... دوا ی ئه وه ی هه شت سالی ره به ق، بۆ دامرکاندنه وه ی گروکفی شوپشی خومه یی و مالی کردنی رژیمه که ی، که له بهر کۆمه لی هۆکاری جیو سیاسی ئاشکرا به لایانه وه زۆر گرنگ بوو، بی په روا یارمه تی رژیمی عیراقیان ده دا. ئایا دوا ی ئه وه ی بگن به ئامانجه کانیان و به هۆی پردی جهنگه وه خویان گه یاندوه ئیران و ئیرانیان به ره و لای خویان راکیشایه وه ... ئیتر ده ست به رداری سه دام ده بن؟ ئایا بۆ زیاتر رازی کردنی ئیران و بۆ له ناو بردنی مه ترسی ئه وه ی که سه دام له به رامبه ردا لینیان یاخی بییت و به ره و سه ربازگه ی رۆژه لات پروات، ئه مان به ر له وه ده سته خویان ده وه شین و ده که ونه پیلان گیران بۆ له ناو بردنی رژیمی سه دام و هیئانی رژیمیکی تری باوه رپینکراوی خویان .. یان هه ر بۆ ترساندنی ئیران وهک وه ره قه یه ک یان دارده سته یکه به ده ستیانه وه ده به یلنه وه و له گه ل هه ر که له گه رمیه کی ئیرانیه کاندان ئه و داره ی لی هه لده برن و چاو ترستی ده که ن.

به لām له گه ل ئه م هه موانه شدا، سه ره رای هه موو حیساب و کیتابیکیش هیشتا رۆژه لاتنی ناوه راست یه کیکه له و ناوچه گه رمانه ی جیهان ناتوانی به ته وای به مه نتیقی هاوکی شه سیاسی ه کان مامه له ی له گه لندا بکری. به پیچه وانه ی زۆربه ی ولاتانی جیهانه وه که خاوه نی سیسته میکی پته یی حوکم کردن. له ولاتانی رۆژه لاتنی ناوه راستدا، که حوکمی دیکتاتوری تاکه که س تیایدا باوه و دیواریکی به رز چوه به ئاسماندا له نیوان گه ل و رژیمه کاندان ... ده بی هه میشه چاوه روانی رووداوی کتوپری وهک شوپشی ۱۴/ته موزی ۱۹۵۸ یان راپه رینی جه ماوه ری وهک راپه رینه که ی گه لانی ئیران بکریت که ده سه لاتنی ده یان ساله ی بنه ماله ی ره زا شای رامالی و هه موو هاوکی شه کان» ناوه ژوو کرده وه.

دوای راگرتنی جهنگ ناوچه که مان له بهر ره شه‌بای گوراندا

بریار

هه‌یه. که عیراق له شکره‌که‌ی له بهر هکانی جهنگی هه‌شت ساله بکشیته‌وه بۆ بهر هکانی جهنگی دژی کوردستان، که بهو ریگایه‌ش رژیم ده‌توانی به توندی تۆله له کورد بسینی که له سالانی دوور و دریز و سه‌خت و پرته‌نگ و چه‌له‌مه‌ی جهنگدا نه‌ک هه‌ر یارمه‌تیا نهدا و پشتیان نه‌گرت، به‌لکو بی‌لایه‌نیش نه‌وه‌ستان و بۆروخاندنی بوون به‌هاوپه‌یمانی دوژمنه‌که‌ی. نیستا وه‌ختی تۆله سه‌ندنه‌وه و ددان جیرکردنه‌وه هاتووه و وه‌ک سه‌دام گوته‌نی ده‌بی‌ی عه‌گال بخه‌نه سه‌ر سه‌ری کورد. خۆ نه‌گه‌ر نیازی تۆله سه‌ندنه‌وه‌شی نه‌بیت، که نه‌وه‌ش مه‌حاله، نه‌وا هه‌ر بۆ دوورخستنه‌وه‌ی نه‌وه‌شکره‌گه‌وره و پرچه‌که و سه‌رکرده‌کانی به‌غدا ره‌وانه‌یان ده‌کات بۆ کوردستان. چونکه له‌شکرکی وا که هه‌شت ساله بی‌هوده له‌ناگری جه‌نگیکی شیتانه و بی‌ئاماندا هه‌له‌ده‌قرچی گه‌ر بگه‌ریته‌وه بۆ سه‌ریازگه‌کان، دوور نییه هه‌ولی کوده‌تای عه‌سکری بده‌ن، که نه‌وه‌ش ئیحمالیکه و رژیم هه‌زار حسابی بۆ ده‌کن، به‌تاییه‌تی دوای نه‌وه‌س زنجیره روداوه دراماتیکیانه‌ی له‌م رۆژانه‌دا رووده‌ده‌ن له‌ بواری په‌یوه‌ندی و دۆستایه‌تی عیراق له‌گه‌ل ولاتانی ده‌روهه، یان رووتتر له‌گه‌ل ولاتانی رۆژئاوا، که هه‌موو چاوه‌پروانی نه‌وه‌بوون ئیزان ئاماده‌یی خۆی ده‌ریبهری بۆ دۆستایه‌تی کردنیان، ئاشکرایه که له‌هاوکیشه‌سیاسیه‌کانی جیهاندا به‌هیچ ترانزویه‌ک کیش و پارسه‌نگی ئیزان وه‌کوو عیراق نییه، گرنگ لیزه‌دا نه‌وه‌یه که ولاته‌هه‌ریه‌کانیش که سه‌رچاوه‌ی هیزی سیاسی و ئابوری عیراق بوون له‌م هه‌شت ساله‌دا، له‌م باره‌یه‌وه پشکۆی ولاته‌ رۆژئاواپه‌یوه‌کانن و هه‌ر نه‌وه‌نده‌ دۆست و برای رژیمی عیراقن تا مه‌ترسیی نه‌وه‌یان هه‌بی‌ی که پریشک و ئاگر و توورپه‌یی خومه‌ینی‌یان به‌ر بکه‌ویت، گه‌ر له‌وه‌ دنیا بن که سه‌ریان سه‌لامه‌ت ده‌بی‌ی، وه‌ک نه‌عامه‌ سه‌ری خۆیان ده‌کن به‌ژیر له‌وه، بۆ نه‌وان سه‌دام هه‌ر چه‌قز وه‌شین و که‌له‌ شه‌قه‌که‌ی حه‌فتاکانه که هه‌رپه‌شه‌ی له‌هه‌موویان ده‌کرد.

له‌سه‌ره‌تای هه‌لگیرساندنێ جه‌نگه‌ ویرانکارییه‌ شیتگیریه‌که‌ی نیوان ئیزان و عیراق، تا نه‌م چه‌ند مانگه‌ی پینشو، ده‌یان جار له‌لایه‌ن زۆر لایه‌نه‌وه، به‌ئاشکرا و له‌بن په‌رده‌وه، هه‌ول‌دراوه بۆ کۆتایی هینان به‌جه‌نگ... به‌لام هه‌یچ جاریکیان وه‌ک نه‌مجاره‌ له‌نه‌جام نزیک نه‌بوته‌وه ... چونکه له‌ میژوی پرخوین و کاره‌سات و مالمویرانی نه‌م جه‌نگه‌دا، بۆ یه‌که‌م جار و به‌ شیه‌یه‌کی کوتوپر ئیزان بریاری ۵۹۸ ی ریکخراوی نه‌ته‌وه‌یه‌گرتووه‌کانی به‌بی‌ی مه‌رج په‌سه‌ندکرد. که جارن مه‌رجه‌کانی ئیزان بۆ راگرتنی شه‌ر، که له‌هه‌موویان گرنگتر نه‌مانی رژیمی سه‌دام بوو، هه‌میشه‌ ده‌بووه کۆسپ له‌به‌رده‌م نه‌وه‌ول و ته‌قه‌لایانه‌ی ده‌دران بۆ شه‌ر راگرتن.

نه‌گه‌ر ئیزان و عیراق بتوانن چاره‌سه‌ریک بۆ خۆیان بدۆزنه‌وه و ریک بکه‌ون و کۆتایی به‌گیروگرفته‌کانیان به‌ین، که دیاره‌ نه‌وه‌ش هه‌روا سووک و ئاسان نابیت، نه‌وا بیگومان رۆژه‌لاتی ناوه‌رست ده‌که‌ویته‌ قۆناخیکی نوێ و راگرتنی شه‌ر و پیکهاتتی نه‌وه‌ دوو ولاته‌ کاریگه‌رییه‌کی گه‌وره‌ی ده‌بی‌ی بۆ سه‌ر داها‌تووی ته‌واوی ناوچه‌که.

هه‌ر له‌ نیستاهه‌ زۆر پرسیار چاوه‌پروانی رۆژان و سالانی داها‌توون بۆ وه‌لام دانه‌وه‌یان وه‌ک: ئایا دوای هه‌شت سالی ره‌به‌قی جه‌نگ باری ناوخۆی نه‌وه‌ دوو ولاته‌ چۆن ده‌بی‌ی و چ گۆرانیکیان به‌سه‌ردا دیت... ئایا هه‌ردوو رژیم ده‌ست به‌جی ده‌ست ده‌ده‌نه‌ ئاوه‌دان کردنه‌وه‌ی ولاته‌ کاول بووه‌که‌یان و بۆ بیده‌نگ کردنی گه‌له‌کانیان هه‌ول ده‌ده‌ن زیاترین په‌له‌ی ناشتی و هه‌یمنی ناوخۆ بپارێزن و له‌گه‌ل هه‌یه‌ به‌ره‌ه‌لستکاره‌کاندا، به‌تاییه‌تی چه‌کداره‌کان، گه‌ر بۆ ته‌کتیکیش ببت، ماوه‌یه‌ک له‌گه‌لیان ریک ده‌که‌ون؟ یان هه‌روه‌ک چاوه‌روان ده‌کریت، زیاتر له‌ عیراق، که دوای دامرکانده‌وه‌ی ئاگری دۆزه‌خی جه‌نگ، به‌رده‌وامی بدری به‌جه‌نگه‌که‌ی تر که له‌ نیوان رژیم و گه‌لی کورددا



ناپالمیشی به کار هیناوه و هزاران گوندی کوردی له گهل زهوی تهخت کردوه.

له لایهکی ترموه جاریکی تریش پارتی دیموکراتی کوردستان رایگه یاند که رژۆی ۲/۳ ناب ۳۴۰ خیزان که نزیکه ی ۲۴۰۰ کهس ده بوون به زیوه بوون به رهو سنووری تورکیا به لام سوپای عیزاق ری ئی لی گرتن و ئابلووقه ی دان ئهوانیش بۆ خۆ شاردهنوه په نایان برده بهر دۆلی بازی له چپای مه تین که ۱۵ کم له خواری کانی ماسی سه ر به ئامیدی یه. هه ر لهو رژۆدها شهش فروزهکی شه رکه ر دوچار به چهکی کیمیایی بۆردومانی ئه و دۆله یان کرد، زۆربه ی زۆریان شه هید بوون ژماره یهکی که م له پیاوان رزگار بوون و خۆیان گه یانده هیزه کانی پینشمه رگه. به م تاوانه ژماره ی شه هیدان به چهکی کیمیایی گه یشته ۴۳۰۰ چوار ههزار و سئ سهد هاوولاتی.

له راگه یاندنیک تریشدا هه ر هه مان پارتی راگه یاند که رژۆی ۱/۱ ئه یلول شه ریکی مه زن له نیوان هیزه کانی پینشمه رگه و هیزه کانی رژۆی عیزاق دا له ناوچه ی ئامیدی له نزیک سنووری تورکیا رووی داوه. لهو شه ره دا لیوایهکی دۆژمن به تاووی شکینراوه و لاشه ی ۱۴۰ سه ربازی له دوا به چی ماوه. هه موو کۆژراوه کانی دۆژمن به ماسک و جل و به رگی دژ به گازی کیمیایی به وه بوون. دهسته کۆتی پینشمه رگه له م شه ره دا ۱۶۰ ماسک و هه ندی چهک و شتی تر بووه. ئه م ماسکانه به لگه یهکی تره بۆ به کارهینانی چهکی کیمیایی له لایه ن سوپای عیزاقه وه.

شایانی باسه که له هه مان بلاوکراوه ی رژۆنامه گه ری دا پارتی دیموکراتی کوردستان رایگه یاندوه « بهر به ستیمان به رده وامه و رژۆی عیزاق به هه یج جۆری ناتوانی خه باتی پینشمه رگه ی کوردستان له ناو بیا، پینشمه رگه به شینوه یهکی ریک و پینک هیزه کانی ریکخستوه و چالاکانه تیده کۆشی».

گومان له وه دانیه که له به رامبه ر ئه م دهنگدانه وه مه زنه ی تاوانه کانی رژۆم و ریسوا بوونی له جیهاندا، ئه ویش هه موو توانای خۆی له سه ر هه موو ئاسته کان به کار ده هینی بۆ که مکردنه وه ی هیزی ئه و ناره زایی ده برینانه و بۆ چاوپه ست کردنی رای گشتی جیهان و چه واشه کردنی کیشه ره واکه مان و سووک کردنی بزۆتنه وه نازادیه خوازییه که مان..

به رز بوونه وه ی هه ندی دهنگی نا قۆلا له م لا و لا وهک دهنگی ولاته عه ره بیه کۆنه په رسته کان و هه ندی وتار که به په ره ی رژۆی فاشی عیزاق له هه ندی رژۆنامه و گۆفاری ئه م ولات و ئه و ولات دا ده نو سه رین نموون بۆ ئه م مه سه له یه.. هه ره وها به رژه وه ندی په رستی هه ندی حکومه ت و لایه نی تر به ئاشکرا دیاره که ئه و ناوازانه ی رژۆی عیزاق دووباره ده که نه وه که گوایه گومانیان هیه و هینشتا به لگه ی تاوویان به دهسته وه نیه که ئایا عیزاق چهکی کیمیایی به کارهیناوه یان نا.. ئه مه نوکته یهک ده هینیتته وه بییر «ده گیزنه وه رژۆ رژۆی عاشورا ده بیته، کابرایهکی یابانی بۆ یه که م جار له تاران ده بیته، ده بیته ی ئه و هه موو خه لکه کۆپونه ته وه و به ده م گریان و باوکه رژۆه له خۆیان ده دن.. زۆر سه ری سوپ ده مینی چونکه نازانی چی قه وامه.. ده که ویتته په رسیار کردن، وه لامی ده ده نه وه که شینی ئیمامی حوسه یین ده که ن که له که ره لا شه هید کراوه. ئه ویش ده پرسئ که ی؟ ده لیزن پیش هه زار و سئ سهد و ئه وه نده سال کابرای یابانی ده ست ده کات به گریان و له خۆدان. لی ئی ده پرسن تۆش بۆ شه هیدی که ره لا ده گریته. ده لیت نه ی بۆ پۆسته ی ئیوه ده گریه که ئه وه نده درهنگ ده گات».

له وه ش سه یه تر هه ندی ولات که وتونه ته تاوتوی کردنی بریاری قه دهغه کردنی به کارهینانی چهکی کیمیایی که سالی ۱۹۲۵ له چین ئیمزا کراوه.. ده لیزن له بریاره که دا

باسی ئه وه نه کراوه که ئه گه ر له ناو سنووری ولاته که خۆیشدا به کار به یترئ قه دهغه یه یان نه».

ئه وانه ش هه قی خۆیا نه. چونکه له جیهانیکدا که هه مووشتی له سه ر به رژه وه ندی مادی بنیات نراوه.. به رمیله نه وتیک چاویان له ئاستی ئه و هه موو به لگه یه کۆی ده کات.. خۆ ئاشکرایه میله ته ی کوردی کۆلیش نه به رمیله نه وتی هیه به هه رزان پی یان به فرۆشی و نه ده توانی فروزه و تانک و تۆپیان لی بکری. ده مینکه کورد وتویه تی: « سه رچۆپی بدیته سه گ بۆلای سه به ته ی نانه که ی ده بات».

دیاره گه ر سیاسه تیش به ده ست بازرگانه کانه وه بیت هه ر به لای بازاردا پای ده ده نه وه. له م جیهانه چه نجاله دا که هه موو ده زانین راگه یاندن چ رژۆیکی گرنک ده بیته بۆ گه یاندنی دهنگ به رای گشتی جیهان و بۆ بهر په رچ دانه وه ی درۆ و ده له سه کانی نوژمنان که ده یانه وی به بیژنگ به ری خۆر بگرن.. چیگای داخه که بزۆتنه وه ی نازادیه خوازی گه له که مان خاوه نی راگه یاندنیکه به هیز و یه کگرتوو نیه نهک رادیی که ئه وه له توانا دا نیه، به لکه رژۆنامه یان گۆفاریکی به هیزی نیه که به زمانیکه ئه وروپی به ریک و پینکی ده ربه جیت و بیته پالیشتیکی به هیز بۆ بزۆتنه وه که مان و له م بواره گرنکه دا هاو په شی خه باتی پینشمه رگه قاره مانه کانی کوردستان بیت و دهنگیان بگه یه نی به جیهان.

سکندنافی (سوید، نروژ، فنلندا، دانمارک، نسلاندا) و یابان و ئەلمانیای رۆژ ناوا و هۆلەندا و بەلجیکا.

«رن.ی» بریاری دا که لەم مەسەلە یە بکۆلێتەوه، بۆ ئەم مەبەستە پەسپێزانی نامادە کرد تا بڕۆن بۆ عێراق و تورکیا بەلام عێراق چەند جارێک نووبارە ی کردەوه که رینگا نادات هیچ لیکۆلێنەوه یەک لە عێراق بکریت بەو بیانونەوه ی که ئەو تاوانە ی خراوتە پال عێراق هەمووی درۆیە و بی بناغە یە و بوورن لە راستی یوه و کەس بۆی نیە دەست بخاتە کاروباری ناوخۆی عێراق. لەو لاهو حکومەتی تورکیاش (که دەمی لیک دەکات بۆ پتەوکردنی پەییوەندی بازرگانی و ناووری لەگەل عێراق، بە تاییەتی نوای هەشت سالی چەنگ که عێراق بۆتە بازاریکی یەكچار چەور بۆ تورکیا) رایگە یاند که دکتۆرەکانی تورکیا بە ناو کۆردە پەنا بەرەکاندا گەراون و هیچ شۆینەواریکی بەکارهینانی چەکی کیمیایی نەیینوه که دژیان بەکار هینزاینت. لەبەر ئەوه پینشواری ناکەن لە وهفدی «رن.ی» که بە مەبەستی لیکۆلێنەوه بین بۆ تورکیا.

خاڵۆزای دیکتاتور، وهزیری بەرگری رژی می عێراق لە کۆنگرە یەکی رۆژنامه گەری دا لە بەغدا نکولی کرد لە بەکارهینانی چەکی کیمیایی دژی کۆرد، بەلام روونی کرپوه که عێراق مافی بەکارهینانی ئەم جزره چەکی هە یە.

وهزیری نووتی عێراق عصام چەلەبی لە چارپێکەوتنێکدا لە گەل رۆژنامه ی «الوطن» کویتی رۆژی ۹/۱۵ وتبوی هەلوێستی ئەم نواییە ئەمریکا و هەرەشەکانی کۆنگریسی ئەمریکی سەبارەت بە پەییوەندی برین لەگەل عێراق لە بواری بازرگانی دا نە لە نزیک و

نە لە دور کار ناکەتە سەر عێراق.. ولاتەکه مان بازاری تر دەدۆزێتەوه بۆ فرۆشتنی نووتی عێراقی ئەگەر ئەم ولات و ئەو ولات نەوتمان لێ نەکرن گرنگ نیە و کار ناکەتە رادە ی نارنە دەرەوه ی نووتی عێراق. دیارە ئەم وهزیره درۆ ناکات و زۆر ولات هە یە بەرمیلیک نووتی هەرزان ناگۆرێنەوه بە هەموو یاساکانی مافی مرۆفایەتی و لەبەر چاوی کالی کۆرد ئەو بازارە هەرزانە لە خۆیان تیک نادەن.


رۆژ بە رۆژ دەنگی نارهزایی دەرەبیرین دژی ئەو دێردانە لە بەرز بوونەوادیە. پەرلەمانی ئەوروپی لە کۆنگرە ی خۆیاندا بە تیکرا حکومەتی عێراقیان تاوانبار کرد بە بەکارهینانی چەکی کیمیایی و بە هەولدان بۆ قەلاچۆکردنی گەلی کۆرد لە عێراق. دوایان لە هەموو ولاتانی ئەندام کرد که چەک و موادی کیمیایی نە فرۆشن بە رژی می عێراق.

بەلام جامە ی ولاتە عەرەبیەکان لە روانگە ی بیر و فەلسەفە ی کۆنەپەرستی و رەگەزپەرستی خۆیانەوه (لایەنی براکەت بگرە چ زالم بی و چ مەزالم) لایەنی براکەیان گرت و نارهزایی خۆیان دەربری بەرامبەر بەریتانیا و ولاتانی رۆژ ناوا که گوایە دەست دەخەنە ناو کاروباری ناوخۆی عێراق. بەلام جیفری هاو، وهزیری دەرەوه ی بەریتانیا، یەکسەر بەر پەرچی دانەوه و وتی نارهزایی دەربرینەکی جامە ی ولاتانی عەرەبی رەت دەکە ینەوه چونکه لە جی خۆیدا نیە مەسەلە که لوه دەرچوووه که کاروباری ناوخۆی ولاتیک بیت بە لکو ئەوه قەلاچۆکردنی میلیتیک.

لە هەوالدانێکی سەر نەکهوتووانه دا رژی می فاشی عێراق رۆژنامه نووسە بیانیەکانی برد بۆ شاری موسل و سلیمانی بۆ ئەوه ی که بە

چاوی خۆیان ببینن که چەکی کیمیایی بە کار نە هینزاوه و گەلی کۆرد بە تاواری لە رژی می رازی یە و هەر ئەو رژی می دەوێت. پەییامێزی رادیوی بی.بی.سی راپۆرتێکی نووسیو تیایدا وتبوی: حکومەتی عێراق ئی مە ی برد بۆ ناو شاری سلیمانی و موسل، لە گەل هەندی کۆرد قسە مان کرد که دیار بوو حکومەت ئەوانە ی هەلێژارد بوو که بین لە گەل ئەمان قسە بکەن، بەلام ئاشکرا بوو که هەولیان دەدا حکومەت چۆنی پێ خۆشه بەو شیوه یە وهلامی پرسیارەکانمان بدەنەوه. حکومەت زۆر پایەخی بە پاراستنی ئی مە دەدا، نەماندەتوانی لە گروپەکه مان دور بکەوینەوه و بڕینە ناو خەلک، هەر بۆ نموونە که من ویستم لە گروپەکه م دور بکەومەوه، نوای چەند دەقیقە یەک ئۆتۆمبیلیک لە تەنیشتمەوه رابوستا، سێ کوری گەنج دابەزین و بە ریزهوه پێیان راگە یاندم که دەبی بگە ریزهوه بۆ ناو گروپەکه مان.

رۆژی ۹/۱۵ رۆژنامه ی گاردیان، بە پینووسی خان کارلوس گۆمیکز وتاریکی گرنگی بلاکۆرێتەوه.. ئەم رۆژنامه نووسە لە گاردیان دا نووسیویەتی: دەبی رژی می صدام حسین بدینت بە دادگای نۆرمینزگ « دادگایەکی نیو دەولەتی یە بۆ مەحکە مەکردنی تاوانبارانی چەنگ » ، لەسەر بناغە ی یاسای قەدەغەکردنی چەکی کیمیایی که سالی ۱۹۲۵ ئی مزا کراوه مەحکە مە بکریت. هەموو جیهان دەزانیت که ئەو رژی می ئەم چەکی دژی کۆرد بەکارهیناوه و هەزارانی لێ کۆشتون و هەزارانی تریشی دەر یەدەر کرپوه.. نابێ هیچ جزره چارپۆشینیک هەبی چونکه ولاتانی تریشی چاو لە عێراق دەکەن و بە کاری دەهین. بە لگە هە یە که عێراق چگە لە چەکی کیمیایی بۆمبای فوسفوری و





تەنگاویان کردبوو.. بە ھەموو لایەکا درۆی ھەلدەپشت، لەسەر ئەو تیورە دەلیت درۆیکە.. درۆیکە تا خۆت و خەلکیش باوەر بە درۆکان دەکەن.. بە رۆژنامە نووسەکانی ووت کە بە جۆرج شۆلۆم و تووھ کە عێراق تاکە ولاتە مافی ئۆتۆنۆمی بەخشیووە بە کورد. وەزعی کوردەکانی عێراق لە کوردی ھەر ولاتیکی تر چاکترە.. کورد بەشداری لە حکومەتی مەrkزی دا، لە رووی ئابووری و رۆشنیارییەوە وەک ھەموو عێراقییەکی ترن.. ھەروەھا بۆم روونکردووە کە جەلال تالەبانی و ئەو تاقمە نوای کەوتوون بە ناشرکرا خیانەتیان کرد، کە راستەوخۆ ھاریکارییان کرد لەگەڵ ھیزەکانی ئێران لەکاتی داگیرکردنی ھەلەبجەدا لە ژێرووی عێراق.. ئەوێ ئەنجامی داوھ پەییوەندی نیە بە ناکۆکی نیوان کەمایەتی و حکومەتی مەrkەزییەو، بەلکو خیانەتە لە خاکی نیشتمان.. ئەو تاقمە تیزۆر فەرز دەکەن لەسەر ناوچەیی ژورو، دژی دانیشتوان تیزۆر بەکار دەھێنن. ئێمەش وەک حکومەتی مەrkەزی دەبێ ئەمن و ئاسایشی ناوچەیکە بپاریزین. ئەم کۆمەلە وەک ئابووری پێنجەم لە پشت ھیزەکانمانەوھ کار دەکەن.

نوا بە نوای ئەو چاوپێکەوتنە ئەنجووومەنی پێران و پەرلەمانی ولاتە یەگگرتووھەکانی ئەمریکا پێشینیاری ئەندامەکانی پەسەند کرد سەبارەت بە سزادانی حکومەتی عێراق لە رووی بازرگانی و ئابوورییەوە.

جاریکی تریش بەریتانیا بە توندی نیگەرانی خۆی پێشاندا سەبارەت بە ھیزی حکومەتی عێراق دژی کورد، ھاگەیان کە نازەزایی دەربرین لەلایەن ولاتانی جیھانەوھ کاریکی ڕەوایە و لە جێی خۆیدا ھەر چەندە کە عێراق شکایەتی لە دەست ئەوھ کردووە کە گواہی ئەمە دەست تێوھرانە لە کاروباری ناوخوا.. جاریکی تریش بالۆیزی عێراق لە ھەندەن بە وەزارەتی دەرھووی بەریتانیای ھاگەیان کە عێراق ناکۆکی دەکات لەو تاراوانەیی بە ناھەق دەخرینە پالی و بە ھیچ جۆریک چەکی کیمیایی بەکار نە ھیناوە و ھیچ کاتی پەلاماری کوردە مەدەنییەکانی نەداوە. وەزارەتی دەرھووی بەریتانیا ھاگەیان کە بالۆیزی عێراق پێی وتوون لەشکری عێراق دژی ئەو تیزۆریستانە شەر دەکات کە ھیزەبیانیەکان چەکیان دەدەن و پشتیان دەگرن.. بەلام دبلۆماسیەکانی

بەریتانیا دەلێن کە بەریتانیا باوەر بەم ناکۆکی کردنە عێراق ناکات و بە نھینی کار دەکات بۆ ئەوێ «رن.ی» لەم مەسەلە یە بکۆلیتووە.

کوردە ئاوارەکانی ھەندەران لە زۆربەیی شار و پایتەختەکانی ولاتانی ئەروپا و ئەمریکا دژی رۆژی عێراق خۆپیشاندانیان کرد و داوایان لە رای گشتی جیھانی و «رن.ی» کرد کە پشتگیری گەلی کورد بکەن کە لەسەر دەستی فاشیەکانی بەغدا دووچارە ھیش و پەلاماردانی قەلاچۆکەرانی بوو.

لە ستۆکھۆلم، لە یەکی ئەیلول دا، ریکخراوھ سیاسیەکانی ھەموو پارچەکانی کوردستان لە بەردەم دائۆرە «رن.ی» بۆ ماوھ پێنج رۆژ مانیان گرت لە خواردن نوای چاوپێکەوتن لەگەڵ وەزیری دەرھووی سوید و لئیسراوی «رن.ی» لە سوید مانگرتتە کۆتایی پێ ھینزا. ھەروەھا رۆژی ۱۰ / ئەیلول بە ھاوکاری ریکخراوھ سیاسیەکانی کوردستان و فیدراسیۆنی کۆمەلە کوردستانیەکان لە سوید دژی بالۆیزخانە عێراق لە ستۆکھۆلم خۆپیشاندانیکی گەورە سازکرا ۲۶۰۰ کەس بەشدارییان کرد بۆ نازەزایی دەربرین و بۆ ریسواکردنی رۆژی خۆپنزیی صدام. شایانی باسە کە لە دیمەشق و شارە کوردییەکانی تری سویریا خۆپیشاندانی زۆر گەورە سازکران دژی رۆژی فاشی عێراق. لە لایەکی تریشەوھ لە ژێر فشاری دەنگدانەوێ تاوانەکانی عەقلەقیەکان و ئەو نازەزایی دەربرینە بەرفراوانی جیھان کە

دیارە بە توندی تەنگیان بە رۆژی فاشی عێراق ھەلچنیووە. بە فەرمانی دیکتاتور لە ھەموو شارەکانی عێراق دژی ولاتە یەگگرتووھەکانی ئەمریکا خۆپیشاندان سازکرا.. تەنیا لە بەغدا ۲۵۰ ھەزار کەس بە زۆر براپوونە سەر شەقامەکان و دژی بالۆیزخانە ئەمریکا خۆپیشاندانیان پێ کردن.. دیارە ئەمجارەش صدام دەییەوێت خۆی بکات بە کاسترۆ!، وای لە قەلەم بدات کە ئەم کاربایە پیشکەوتن خواز و چەپرەو و دژ بە ئیمپریالیزمە.

بۆیە ولاتانی رۆژ ئاوا مەسەلەیی کورد بۆ مەبەستی خۆیان بەکار دەھێنن و بەناھەق دژایەتی ئەوی پێ دەکەن و دەست دەخەنە کاروباری ناوخوا عێراق.

بەلام رای گشتی جیھان و زۆربەیی ولاتان بە ئاسانی لە مەسەلە کە تێ دەگەن و بە باشی ئەو رۆژیمە دەناسن کە ھیچ ریزیکی نیە بۆ یاسا نیو دەولەتیەکان و مافی مرقایەتی.. ھەر بۆیە چواردە ولات بەرھەمی داوایان لە سکرتیری گشتی «رن.ی» کرد کە ھەول بدات تیییک لە پسیپۆران بنزیی بۆ عێراق و تورکیا بۆ لیکۆلیتووە سەبارەت بە بەکارھینانی چەکی کیمیایی دژی گەلی کورد لە لایەن حکومەتی عێراقوھ.. ئەو چواردە ولاتە بریتی بوون لە ھەر پێنج ولاتی ئەندام لە ئەنجووومەنی ئاسایشی دەولەتان (ولاتە یەگگرتووھەکانی ئەمریکا، یەکیٹی سوئیت، بەریتانیا، فەرەنسا، چین) و ولاتانی

۱/ نیلول جورج شولز وزیر و وزیر دهرهوی ولاته په کگرتووه کانی نه امریکا پیشوازی له سه عدون همادی کرد. زور به گرمی باسی نم مهسه له پهی له گه لدا کرد. نارهازی توندی ولاته کی راگیانند سه بارهت به هه لسوکه وتی رژیم عیراق. و به کارهینانی چه کی کیمیایی دژی کرده عیراقیه کان و پی وی ووت تاوانه کی کردبوو به لام شولز چندجار نارهازی ولاته کی دایهوه به گزی همادی دا و پی وی ووت گه عیراق بردهوام بیت له به کارهینانی نم چه که دا رهنه کار بکاته سر برهو پیشهوه چون و گه شه کردنی په یوهندی عیراق و نه امریکا. وهزیره کی صدام نکولی له تاوانه کان کرد. به لام شولز چند جار نارهازی ولاته کی دایهوه به گزی همادی دا و پی وی ووتوبه نهوه کاریکی سه خیف و ناپه سهند و بی ری و جریه. پی وی ووتوبه که نه امریکا دلنایه لهوهی عیراق چه کی کیمیایی به کارهیناوه و له م باریهوه به لگی ته وایان لایه.

هندی له نه اندامانی نه انجومه نی پیرانی نه امریکا پیشنیاریکیان برز کرده سه بارهت به پرژوی بریاریک بؤ سزادانی بازگانگی و نابوری رژیم عیراق، بؤ نهوهی به کارهینانی چه کی کیمیایی دژی کرد نووباره نه کاتوه. رژیم دوی چاپیکه و تنه که همادی له واشنتون کزنگره په کی رژیمه گری ساز کرد. رژیمه نووسان به پرسپاری زور سخت



دهرهوی به ریتانیا رایگه یاند که به ریتانیا زور نیگرانه سه بارهت به به کارهینانی چه کی کیمیایی دژی کرد له لایه ن حکومتی عیراقیه وه وتی پیویسته داوا له «رنی» بکرنیت که له م پوهه ههنگاوی پیویسته بنی.. له لایه کی تریشهوه سه روک کزماری فرانسه فرانسهو میتزان نارهازی ولاته کی دهریری به رامبر به به کارهینانی چه کی کیمیایی دژی کرد.

نهوه کوردانهی رایان کروه بؤ تورکیا هر کاتی بخوازن ده توانن بگه رینهوه بؤ ولاته کیان..

سه بارهت به به کارهینانی چه کی کیمیایی طارق عزیز نکولی کرد و وتی که به کار نه هینزروه و پیویسته به به کارهینان ناکات رادهی هیزشه کی له شکری عیراق بهو مهزنیه نیه که باس ده کرنیت چونکه مقاومهی کوردی نهونده نیه نهوه هیزه سه رازیبه گوره پهی برواته سر.

رژیمی عیراق «عفوی عام» دهر کرد که ده توانن له ماوهی سی رژیمه بگه پنهوه بؤ عیراق. دوی ههفته یک رایگه یاند که ۱۱ هزار کرد له تورکیا و نیرانهوه گهراونه تهره بؤ ناو عیراق به لام نه حکومتی تورکیا و نه نیران باسی گهراونهوهی که سیان نه کرد به لکو به پنچه وانهوه رژیم به رژیم ژماره ی په نابره کان برهو زیاتر ده چیت. هیزه سیاسی کانی کورد رایانگه یاند که بروایان به عفوی صدام نیه و نه مه تنیا بؤ چاو بهستی رای گشتی جیهانی په گه نیازی پاکه بؤ پیش نهوه هیزه گوره پهی عفوی دهرنه کرد.. بؤ تا نیستا ههشت هزار بارزانی چندین ساله بی سر و شوین. بریز مسعود بارزانی رژیم ۹/۷/۱۹۸۸ رایگه یاند که کورد تنیا له پیناوی لی بوردن خبات ناکن، به لکو خبات ده کن له پیناوی مافه نه تهوهی و دیموکراتیه کانیاندا که له چوار چپوهی نؤتونومی له عیراقدا دیاریکراوه خباتی نیمه رژیمه ده خاینیت تا گه یشتن به مافانه.

سه عدون همادی وزیر دهرهوی دولت بؤ کاروباری دهرهوی رژیم صدام به سزدانی رسمی چوو بؤ ولاته په کگرتووه کانی نه امریکا.. بهر له گه یشتنی نم وهزیره نه امریکا عیراقی تاوانبار کرد به به کارهینانی چه کی کیمیایی دژی کرد.. خافیز پیزیز دیکویلار سکرتری گشتی «رنی» رایگه یاند که نیگرانه سه بارهت به کورد و بردهوام له نزیکهوه ناگاداری دهنگویاس و روداوه کانه، نهوش دوی نهوه بوو که کزملی له په نابره کورده کان له هوله ندا چوو بوونه بردهم نؤتومبیله کی دیکویلار و داویان لی کردبوو پشتگیری کورد بکات دژی نم قه لچو کردنه... هر له و کاتانه دا جفری هاو وهزیره





کیمیایی یوه چوار منالی کوژراوه وهک نهکتر ته مسیلی نهوهی دهکرد که چوڼ به هزی نه جوزه چهکوه له هوش خزی چوو و توشی هیلنج و رشانهوه بوو. زور له کوردهکان باسی نه جوزه بهسههاتانه بیان دهگزیایوه... پینشمه رگه کانی پارتي دیمکراتی کوردستان باسی نهوهیان دهکرد که سورن لهسر گه رانهوه بۆ شهرکردن دژی صدام حسین.

وهزارهتی دهرهوهی ولاته په کگرتووه کان نارهزایی خزی دهریری بهرامبه به کارهینانی چهکی کیمیایی دژی گهلی کورد له عیزاق و قسهکهر به ناری حکومتی نهامریکاوه رایگه یاند که نهامریکا نه مهسه له بهی له گهلی عیزاق هیناوه ته گوری.

رؤژنامهی واشنتون پوښت سهبارته به مهسه له به پرسسیاری له طارق عهزیزی وهزیری دهرهوهی صدام کردبوو، نهویش وتبووی ههزاران کورد له گوند و لادی کانی نزیک سنوری نیران دهژین، نهوانه گویزراونه ته وه بۆ خانووی نوی که حکومتی عیزاقی له شوینی تر بوی مسؤگر کردون.. نهوه ته نتیا له بهر دوور خسته نهوهی گیروگرفته له سنور نهک بۆ دوورخسته نهوهی نههالی، به لکو بۆ ریکخستنی وهزعه له ناوچه په کی شاخاوی سهخت به پی پی روواده نوئی په کان.. نهوه هاوولایه کوردانهی گویزراونه ته وه «تعویض» بیان وه رگرتووه و کوردهکانی عیزاق مافیان زیاتره له کوردی هه ولاتیکی تر...

جیهانی بزواند و له زور لاره هندی جاریش زور به توندی دهنگی نارهزایی بهرامبه به هه لسوکهوتی رهگهز په رستانه ی رژیمی عیزاق بهرز بویه و تا نیستاش نه دهنگانه هه له بهرز بوونه وه دان به جوری که ده توانین بلین بۆ په کهم جاره له میژووی خهباتی دریژخایه نی گهلی کورد دا بهم شیوهیه له جیهاندا دهنگانه وهی هه بی.

وهزارهتی دهرهوهی بهریتانیا بالویزی عیزاقی بانگ کردو و نیگرانی حکومتی بهریتانیای پی راگه یاند سهبارته به به کارهینانی گازی کیمیایی دژی کورد. له چاوپیکهوتنی کدا له گهلی رادیوی بی بی سی محمد صادق المشاط بالویزی عیزاق له لهندهن له وه لاهی پرسیاری کدا سهبارته به کۆچکردنی دهیان ههزار کوردی عیزاق به رهو تورکیا له بهر به کارهینانی گازی کیمیایی له لایه ن حکومتی عیزاقوه له دژیان، وتبووی که نهوه ولاته راست نین و حکومتی عیزاقی نیازی قه لاچوکردنی کوردی نیه له نیوان کورد و عیزاقیه کانی تردا جیاوازی ناکات و کورد چیان ویستوه دهستیان کهوتوه و مافیان له عیزاقیه کانی تر زیاتره. په یامیزی هه مان رادیو که چوبوه سهردانی کورده په نابهره کان له تورکیا له په کی له راپزرته کانیدا ووتی ههزاران منال و ژن و پیایوم بینی که له عیزاقوه په نایان هیناوه ته بهر تورکیا... که پرسسیارم له نافرته تیک کرد دایه پرهمی گریان و باسی نهوهی بۆ کردم چوڼ له ریگا به هزی چهکی

نیستا نزیکه ی سهه و چل ههزار و به پی پی ههندیکی تریش نزیکه ی دووسه ههزارن که زیاتر له نیوهیان مندا و نافرته ن.

له ته له فزیونی تورکیا دا، تورکوت نوزالی سهروک وهزیرانی تورکیا وتی کاره ساتی ئیمرو ی کوردهکان له کاره ساتی جووله که کان دهچی که له دهست چهوساندنوه هه لاتن یان له کاره ساته دهچی که بهسهر نهفغانیه کاندا هات. جاریکی تر نوزال ووتی ۶۰ شهست ههزار کورد له عیزاقوه هه لاتون بۆ تورکیا له بهر هیزه کانی نهام دوایی بهی سوپای عیزاق بۆ ناوچه کانی ژدوی عیزاق. له سهردانیکدا بۆ چند شاریکی کوردی له کوردستانی تورکیا که به نیازی پرؤیا گنده کردنی هه لئزاردن چوو بوو نوزال سهبارته به کورده ناواره کانی عیزاق وتبووی نهوانه برای نیمه ن و هه همیشه باوه شمان کراویه بۆ برا کورده کانه مان که له عیزاقوه په نایان هیناوه ته بهر تورکیا. له لایه کی تریشه وه وتبووی که هه لویستی نیمه بهرامبه ریان هه لویستیکی مرؤفانه یه و ههچ هیزیک ناتوانی نهام هه لویسته مان پی بگزیته. هه له کاتانه دا کومه لی له نه اندامانی په رله مانی تورکیا بۆ نارهزایی دهریرین دژی به کارهینانی گازی کیمیایی له بهردم بالویزخانه ی عیزاق له تورکیا خویشاندانیکیان ساز کرد.

گهره یی کاره ساته که به توندی ویژدانی پای گشتی جیهانی و زردیه ی حکومته کانی

پانۆراما و دەنگدانەوی

درێندایه‌تی رژیمی فاشستی عێراق

ئاماده‌کردنی دارا ره‌شید

توندی به‌ره‌نگاری نوژمن راوه‌ستان و ئازایانه ده‌جنگن و زیانی گه‌وره ده‌گه‌یه‌نن به نوژمنی داگیر کەر. به‌بێ‌ی راگه‌یاندنیکی رۆژنامه‌گه‌ری پارته‌ی دیموکراتی کوردستان تا رۆژی ٥/ ئه‌یلول نزیکه‌ی ٨٤٥٠ سه‌ربازی نوژمن کوژاون و ١١٠٠ که‌سیان له‌ لایه‌ن هه‌یزه‌کانی پێشمه‌رگه‌وه به‌دیل گیراون و چوار هه‌لیکۆپته‌ر خراوته‌ خوارێ و خوراگرێ له‌ پێناوی مافی میلله‌ت دا درێژه‌ی هه‌یه و درێژه‌ ده‌کیشیت.

له‌به‌ر توند و تیژی هه‌یزه‌که ژماره‌یه‌کی زۆری دانیشه‌توانی ناوچه‌که و بۆ رزگارکردنی گیانی خزیان و له‌ده‌ست چه‌کی کیمیاوی و گازی ژه‌هراوی به‌ ناچارێ به‌ره‌و کوردستانی تورکیا که‌وتنه‌ بۆ و داوای په‌نا به‌رییان له‌ تورکیا کرد... سه‌ره‌تا که هه‌یشتا ژماره‌ی په‌نا به‌ران چه‌ند سه‌د که‌سیک ده‌بوون، رۆژی تورکیا ده‌یویست ئه‌و مه‌سه‌له‌یه له جیهان به‌شاره‌توه و به‌بێ‌ ده‌نگی چاره‌سه‌ریکی بۆ به‌دوخته‌وه به‌وه‌ی یان ریگیان به‌دات له شونینکی تره‌وه بگه‌ڕینه‌وه بۆ ناو کوردستانی عێراق یان ریگیان به‌دات بۆن بۆ ئێران و له‌وێ بینه په‌نا به‌ر یان نه‌گه‌ر بۆی بلوایه هه‌ر زوو ته‌سلیسی عێراقی بگه‌ردنایه‌توه. به‌لام به‌رده‌وامی و زیاتر توند بوونی هه‌یزه ره‌گه‌ز په‌رستانه‌که‌ی له‌شکری صدام و زیاتر به‌کاره‌ینانی گازی کیمیاوی و کوشتاری به‌ کۆمه‌ل بوونه هه‌زی ئه‌وه‌ی له‌ ماوه‌ی چه‌ند رۆژیک دا ژماره‌ی ئه‌وانه‌ی په‌نایان برده به‌ر تورکیا له‌ په‌نجا هه‌زار تی پهری و بوویه شه‌ست هه‌زار ورده ورده له‌سه‌د هه‌زار نزیک بۆوه و به‌بێ‌ی هه‌ندی سه‌رچاوه ژماره‌یان

کرایه سه‌ر ناوچه‌کانی ده‌وک، زاخو، شینخان، نامیدی و ئاکری و له‌لایه‌کی تریشه‌وه به‌ره‌و باليسان و خه‌تی و ره‌واندووز و قه‌ندیل. ته‌نیا له ده‌رووبه‌ری شاری نامیدی و زاخو ٦٥ گوند به‌ چه‌کی کیمیاوی بۆردمان کراون و ته‌نیا له رۆژی ٢٨/ ئاب دا له نزیک شاری ده‌وک ١٣٠٠ که‌س به‌ کۆمه‌ل شه‌هیدکراون. سه‌رجه‌م ٢٠٠٠ بێ‌تاوان شه‌هیدکراون و پتر له ٥٠٠٠ هه‌زار که‌سی دیکه‌ش به‌ چه‌کی کیمیاوی بریندار کراون.

له به‌رامبه‌ر هه‌یزه‌ی درنده‌ته‌ی نوژمن دا. بۆ به‌رگری له دانیشه‌توانی بێ‌تاوانی کوردستان و بۆ به‌رگری له شورشێ نازاندیخوازی گه‌له‌که‌مان پێشمه‌رگه‌کانی کوردستان زۆر به

هه‌روه‌ک چاوه‌پوان ده‌کرا، دوا به‌ دواي پراگرتنی چه‌نگه‌ ویزانکاریه‌که‌ی ئێران و عێراق، رۆژی فاشستی عێراق گه‌وره‌ترین هه‌یزه‌ی هه‌ینایه سه‌ر کوردستان و به درنده‌ترین شیه‌وه، به نیازی قه‌لاچۆکردن، په‌لاماری گه‌له‌که‌مانی دا.

رۆژی ١٩/٧/١٩٨٨ هه‌یزه‌که ده‌ستی پێ‌کرد بۆ سه‌ر هه‌یزه‌کی ٦٠ هه‌زار که‌س پر چه‌ک به یارمه‌تی تۆپی قورس و تانک و فرۆکه و به به‌کاره‌ینانی به‌رفروانی چه‌کی کیمیاوی هه‌یزه‌یان هه‌ینایه سه‌ر ناوچه نازادکراوه‌کانی کوردستان، به تابه‌ته‌ی له ناوچه‌کانی خواکۆرک و سیده‌کان و میزگه‌سور و شیروان و دوا به دواي ئه‌وه‌ش به توندی هه‌یزه‌ش



بەریانگ

تۆرگانى فدراسیۆنى كۆمەلە كوردستانىيە كانه له سوئد

بەرپرسيار

مەحمود لەوەندی

دەستەى نووسەران

دارا رەشىد

ياقى نازى

مۆئەيەد تەيب

س. ريفينگ

مەحمود لەوەندی

تاپونەى سالانە: ١٠٠ كرونى سوئيدىيە.

بۆ دەزگاکان: ٢٠٠ كرونى سوئيدىيە.

دەستەى نووسەران بەرپرسيار نيه له نووسين و وتارەكانى
فدراسیۆن و لەو نووسینانەى په نيمزای خاوەنەكانیان
بلاو دەکرێتەوه.

ناونیشان:

BERBANG
Box 45205,
104 30 STOCKHOLM

تەلەفون:

08 - 68 60 60

پۆستگيرۆ:

64 38 80-8

پيچيني نووسينگەى تارا.

Box 2068, 172 02 Sundbyberg

سال (٧)

ژماره (٥٢)

Författares Bokmaskin
Stockholm 1988

دۆستانى هيژا

میللهتى ئيمه كه گهوره ترين ميللهته له جيهاندا تا ئيمروز
مافى چاره نووس و دهولهتى سدره خوى خوى نيه و
نيشتمانەكەى پارچه پارچه كراوه و بە دەست داگیركەرەنەوه
دەنالیتى و له زۆر مافی سادە و ناسابى مرۆفایهتى بى
بەرى كراوه ... بوارى راگەياندن و چاپەمەنى كوردى وه ك
زۆریه لایەنەكانى تری ژيان له كوردستاندا له بارىكى
سخت و دژواردايه ... له دوو پارچهى ولاته كەماندا هەر
بەتەواوى بە كوردى نووسين و بلاو كردهوه قەدەخەيه و له
دوانەكەى تریشدا له ژیر فشار و زهبروزهنگى ره قابه دا به
هەناسه سواری و كوله مەرگی ده ژى.

له هەندەرانیش ئەوى مایهى دلخۆشكرده، ئەوهیه كه له
چەند ولاتىك هەلى له بار ره خساوه بۆ كورده ئاواره كان كه
بتوان به نازادى، چالاكى خۆيان بنوون و چەندین گۆفار و
رۆژنامه به زمانى كوردى يان به زمانه بيانیه كان
سەبارەت به كورد و كوردستان بلاو كەنەوه.

سود وەرگرتن لەو هەله ره خساوانه و بەفیرۆنەدانیان و
بەكارهینانیان بۆ بەرژه وەندى بزووتنەوى نازادىخوازى
گەلەكەمان و بۆ ریسواكردى داگیركەران و بەرەو پینشەوه
بردى زمان و ئەدەبى كوردى له ئەستۆى هەموو دلسۆزانە.
له پیناوى ئەو ناما نچەدا، گۆفارى «بەریانگ» شان به
شانى گۆفار و رۆژنامه و چاپەمەنیه كوردیه كانى تری
دەرەوى ولات كار دەكات.

بۆ ئەوى ئەم گۆفاره، مانگانە به رینكوپینكى و
بەناوه رۆكینكى دەوله مەندەوه بگاتە بەردەستى خۆنەران،
تكا له هەموو كوردینكى دلسۆزى خاوەن توانا دەكەین، كه
پینشكەوتنى راگەياندى كوردیان بەلاوه مەبەستە،
هاوکاریمان لەگەڵ بکەن، بابەتى هەمەچەشەنى نووسینی بۆ
رهوانه بکەن، به ره خەنى زانستى دلسۆزانە رینمایى بکەن.

لەگەڵ سلاوى دۆستانەى

دەستەى نووسەران

t har efter inre påtryckningar ändrat sin ställning och te
ar under längre per ttja kurder i Irak har
den nya utveckling
gen som är försva miska vapen oc
p ingenstans at ilket vi uppsk
kurdernas situa en regering i
le Iraks kemisk e bra möjlig
ka regeringen s reaktion n



به ریانیگی

گۆڤاری فەدراسیۆنی کۆمەڵە کوردستانییه‌کانە لە سوێد

